ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
BEŞA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

# PEYVSAZÎ DI KURMANCÎ DE: NÊRÎNEKE GIŞTÎ

Ömer DELİKAYA
121302109

Şêwirmendê Tezê
Alk. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Çewlîg – 2016

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

BEŞA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

# PEYVSAZÎ DI KURMANCÎ DE: NÊRÎNEKE GIŞTÎ

Ömer DELİKAYA

121302109

Şêwirmendê Tezê

Alk. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Çewlîg – 2016

**Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğüne**

Bu çalışma jürimiz tarafından Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak kabul edilmiştir.

Başkan :Yrd. Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Üye : Yrd. Doç. Dr. Hayrettin KIZIL

Üye : Yrd. Doç. Dr. Mehmet KURT

Y. Üye : Yrd. Doç. Dr. Cihat YAŞAROĞLU

Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

Enstitü Müdürü

Prof. Dr. Hasan ÇİFTCİ

**NAVEROK**

KURTE ....................................................................................................III

ÖZET ....................................................................................................... V

ABSTRACK ............................................................................................. VI

PÊŞGOTIN ............................................................................................. VII

LÎSTEYA TABLOYAN ................................................................................ IX

KURTEBÊJE ............................................................................................. X

DESTPÊK....................................................................................................1

**BEŞA YEKEM**

1. PÊNASE, PÊKHATE Û TEŞEYÊ PEYVÊ ..........................................................4

1.1. Wekî Perçeyekî Watedar yê Zimên: Peyv ..................................................4

1.1.1. Peyvên Binaverok û Peyvên Wezîfedar ..................................................13

1.1.2. Peyvên Xwerû (*Simple Words*).............................................................16

1.1.3. Peyvên Aloz/Nexwerû (*Complex Words*)................................................17

1.2. Morfem....................................................................................................20

1.2.1. Morfemên Serbest.....................................................................................25

1.2.2. Morfemên Watedar (Peyvî)……………………………………………...…34

1.2.3. Morfemên Wezîfedar (Rêzîmanî) ……………………………………….34

1.2.4. Morfemên Vebestî.....................................................................................26

1.2.4.1. Morfemên Çemandînê (*Inflectional Morphemes*)………..…………35

1.2.4.2. Morfemên Darîştînê (*Derivational Morphemes*)……………………...36

**BEŞA DUYEM**

2. PEYVSAZÎ Û QERTAFÊN PEYVSAZ ÊN KURMANCÎ .....................................29

2.1. Peyvsazî û Wergiriya wê ............................................................................29

2.2. Xebatên li ser Peyvsaziya Kurdî ...................................................................32

2.3. Dariştin (*Derivation*) ....................................................................37
2.3.1. Qertaf (*Affix*)....................................................................37
2.3.2. Pêşgîr (*Prefix*)....................................................................47
2.3.2. Paşgir (*Suffix*)....................................................................48
2.3.4. Navbend (*Interfix*)....................................................................49
2.3.5.Dorgîr(*Circumfix*)....................................................................50
2.4. Rayeksazî (*Coinage*)....................................................................44
2.5. Qusandin (*Clipping*) ....................................................................45
2.6. Guhastin (*Conversion*) ....................................................................48
2.7. Têkilkirin (*Blending*)....................................................................49
2.8. Kesnavî (*Eponym*)....................................................................53
2.9. Sernavî (*Acronym*) ....................................................................54
2.10. Wergirtin/Deynkirin (*Borrowing*) ....................................................................55
2.11. Wergerandina Yekser (*Calque / Loan Translation*) ....................................................................57
2.12. Wergirtina Wateyê (*Semantic Loan*) ....................................................................58
2.13. Paşvesazî (*Backformation*)....................................................................58
2.14. Pêkanîn / Hevedudanîn (*Compounding*)....................................................................59
LÎSTEYA HIN PAŞGIRÊN KURMANCÎ....................................................................61
ENCAM ....................................................................82
FERHENGOK....................................................................84
ÇAVKANÎ....................................................................88

**KURTE**

Armanca vê xebatê, vekolîna rêbazên çêbûna peyvan e di kurdiya kurmancî de, ev xebat lê dixebite ku di derbarê berhemdariya zimanê kurdî de bergehekê giştî berpêş bike. Ji ber vê çendê, têgeha peyvê û yekeyên wê yên biçûktir, peyvsazî û rola rêbazên cihêreng yên peyvsaziyê di morfolojiya (*teşenasî*) darîştinê de hatine vekolîn. Peyvsazî lê dipirse bê ka sazbûna peyvan di zimanekî de çawa pêk tê û peyv bi çi rengî tên lê kirin.

Di beşa yekem a tezê de, pênaseyên têvel ên peyv û morfemê ku yekeyên bingehîn ên teşenasiyê ne bi rengekî berfireh hatine berpêşkirin di çarçoveyeke gelemper ya ku tê de cureyên peyv û morfemê jî berdest in. Beşa duyem a tezê de, berê pêşîn qala xebatên li ser peyvsaziya kurdî û wergiriya peyvsaziyê bûye, pey re rêbazên cihê yên peyvsaziyê ên wekî pêkanîn (hevedudanîn), darîştin, guhastin, têkilkirin, sernavî, dubarekirin, rayeksazî û wd. heta ji dest hat, bi nimûneyan ve hatine ravekirin.

**Peyvên Sereke**:Kurmancî, Kurdî, Peyvsazî, Morfolojiya Darîştinê, Hevedudanîn, Darîştin, Paşgir

# ÖZET

Bu çalışmanın amacı Kurmancî'de kelime yapım metodlarını incelemek ve dilin üretkenliği hakkında genel bir bakış açısı sunmaktır. Bu amaçla sözcüğü ve onu oluşturan daha küçük yapıları, sözcüklerin yapım süreçlerini ve sözcük yapımında farklı yolların üretimsel biçimbilimdeki rollerini incelemektedir. Kelime yapım yolları bir dilde kelimelerin hangi aşamalardan geçerek oluştuklarını araştırır.

Tezin ilk bölümünde, biçimbilimin temel yapı taşları sayılan sözcük ve biçimbirimin tanımları, sözcük ve biçimbirim çeşitlerinin de yer aldığı bir genel çerçevede sunulmaktadır. Tezin ikinci bölümünde, Kürtçe'deki sözcük yapım süreçleriyle ilgili çalışmalara değinildikten ve sözcük yapım süreçinin kapsamı irdelendikten sonra birleşme, türetme, evrişim / fonksiyon değiştirme, kırpma, ödünçleme, karma, ikileme, uydurma ve benzeri metodlara değininilmiş ve mümkün oldukça her biri örneklendirilmiştir. Ayrıca bu çalışmada bir tablo şeklinde Kurmancî'deki ardıllar sıralanmış ve bazılarıfonksiyon ve kelimeye kattıkları anlam bakımından incelenmiştir.



**Anahtar kelimeler:** Kurmancî, Kürtçe, Kelime Yapımı, Üretimsel Biçimbilim, Birleştirme, Türetme, Ardıl.

# ABSTRACT

The aim of this study is to investigate word formation process in Kurmanji Kurdish and provide a general viewpoint related to productivity of the Kurdish language. The thesis is aimed at studying the notion of word and its smaller units, word formation process, role of different procedures of word-formation in derivational morphology. Word-formation is about how words of a language created.

In the first chapter, as basic units of morphology, word and morpheme definitions broadly presented within a general framework of types of morphemes and words. In the second chapter after mentioning studies regarding word-formation in Kurdish and scope of word formation, it deals with processes of word formation such as compounding, derivation, conversion, blending, acronyms, reduplication, coinage and etc. Moreover, a list of suffixes of Kurmanji and functions and meanings they gave to the words is presented in this work.

**Keywords:** Kurmanji, Kurdish, Word-formation, Derivational Morphology, Compounding, Derivation, Suffix

## PÊŞGOTIN

Ev xebata bi sernavê “Peyvsazî di Kurmancî de: Nêrîneke Giştî”, bi wê armancê rabûye ku di çarçoveyeke zanistî de, mijara peyvsaziyê li gorî rê û rêbazên qebûldar berawird ligel peyvsaziya çend zimanên din, teswîr bike. Peyvsaziya gelek zimanan heta radeyekê dişibin hevdu, ji ber vê yekê jî me hewl da ku em ji çavkaniyên derbarê peyvsaziya îngilîzî de jî sûd werbigirin û bi nimûneyan ve mijarê zelal bikin. Loma di vê xebatê de rêbazên ku bi gelemperî di binbeşa peyvsaziyê de tên lêkolînkirin, hatine destnîşankirin û rêbazên wekî *darijtin, kurtkirin, guhastin, dubarekirin, wergirtin (qerzkirin), paşvesazî, qusandin, sernavî, kesnavî* û hwd bi nimûneyan ve hatine şîrovekirin. Herwiha beşeke berfireh bo paşgirên kurmancî hatiye terxankirin û qertafên peyvsaz ên kurmancî di tabloyekê de bi seredorî hatine ravekirin û wezifeya pêşgiran wekî *navdêrsaz, rengdêrsaz, hokersaz*, *lêkersaz* li rex hatine sinifandin. Helbet ev xebata jî wê bo destnîşankirineke birêkûpêk ya paşgirên kurdî kêmber be. Mebest ji beşa paşgiran, diyarkirina erk û wezifeyên cuda yên hin paşgirên kurmancî bû.

Qedexe û tehdeyên zimanî yên ku bi salan li Tirkiyeyê hatine sepandin, bi awayekî pirhêlî bask li şêwezarên kurdî (kurmancî/zazakî) rûçikand û werara wê ya asayî li gorî zimanên cihanê zaf derengî xist. Rêgiriya li zimanê kurdî bû sedem ku ziman tenê ji aliyê komeke biçûk ya nivîskar û ronakbîran ve bête nivîsîn û bi perwerdeya li dibistanan ve nebe zimanê serdest ê civaka kurd. Dema ku zimanek ji bo hemû pêkhateyên jiyanê nehat bikaranîn û di qadeke berteng de ma wê demê pirraniya beşên wê lawaz dibin û peyv û têgeh pêwendên xwe yên tabiî bi domana demê re winda dikin, zimanekî heta dereceyekê mekanîk derdikeve holê. Herwiha, nebûna perwerdehiya bi zimanê kurdî li Tirkiyeyê, bi vê yekê re têkildar, kêmasiya saziyên xurt ên di derbarê zimên de, di warê zimannasî û rêzimannasiyê de neyeksaniya termînolojîk, xeletiyên ji ber kêmasiya nêrînên teorîk û ilmî derdixe holê. Nirxandinên neilmî û çêkirina hejmarek zêde peyvan bo her cure têgehên zimannasî û rêzimannasiyê li binbeşa morfolojiyê ya bi navê *peyvsazi*yê jî geriyaye. Di vê xebatê de ji bo ku bêserûberiya termînolojîk ya vê qadê zêdetir nebe heta ji dest hat me têgehên ku beriya vê xebatê hatine emilandin, tercîh kirin.

Di çarçoveya vê xebatê de em lê xebitîn ku bergeheke giştî ya rêbazên peyvsaziyê berpêş bikin û awayên dariştina peyvan yên ku di hemû zimanên cihanê de kêm-zêde berdest in bo destnîşankirina sînorên peyvsaziya kurmancî bi kar bînin. Herwiha xebatên di derbarê peyvsaziyê de ku di rêzimannameyên kurmancî

de, di bin sernavên cihêreng de bi rêjeyî cih digirin bo xebata me bûne serçavkanî û bingeh. Me di vê xebatê de pirranî xwe spast gotar û pirtûkên peyvsaziyê yên bi îngilîzî ku ji aliyê metodolojî û teorîk ve xurttir bûn. Lê herwisa rêzimannameyên kurdî yên sereke bo beşa paşgiran bo min bûn çavkaniyên sereke. Di vê babetê de ez dixwazim qala gotarekê bikim ku berê xebata min ber bi başiyê ve guhert. Ev xebat dema ku hate weşandin, me demeke dirêj bû dest bi xebata xwe kiribû û heta radeyekê anîbû, lê di afirandina têgehên nû de em dilnerihet bûn. Di kovara elektronîk Kanîzarê de, rêzegotareke dirêj û bikêr ya zimannasê kurd Husein Muhammed a bi navê “Peyvsazî di zimanê kurdî de” weşiya. Ev gotar bo wergerandina hin têgehên îngilîzî ji xebata min re bû çavkaniyeke sereke. Ji ber vê xebata wî û hemû xebatên wî yên derbarê zimannasiya kurdî de, ez spasiyên xwe pêşkêşî mamoste Husein Muhammed dikim ku bi xebatên xwe ve bo me bû rênîşander.

Di amadekarî û xelaskirina vê xebatê de şêwr û şîretên mamoste û şêwirmendê min ê hêja Dr. M. Zahir Ertekin nebûna xebata min nedigihişt serî, wî di vê xebatê de rêya min ronî kir. Loma ez spasiyên jidil pêşkêşî mamosteyê xwe yê hêja dikim, bila mala wî ava be. Herwiha ez bi dilgermî sipasiya hevrêyê xwe yê hêja Mesud Serfiraz dikim ku ji aliyê teknîk û rastnivisê ve li hin beşên xebata min miqate bû, çendîn kêmasiyên wê berteref kir. Herwiha bo xwendin û nirxandinên wan, ez spasiya hevalên xwe yên delal Hasan Akboğa, Zafer Atlı, dikim. Şayanî qalkirinê ye ku Zafer Açar bi bêhnfirehî teza min xwend û bi nîşeyên xwe ve alîkariyeke mezin da min.

Ji serê berîn heta dawiyê, bi sebr û bênfirehiya xwe ve xanima min Nagîhan nebûya min ê ev xebat nebira serî.

## LÎSTEYA TABLOYAN


| | | |
|---|---|---|
| **Tablo 1** | Peyvên Binaverok | 14 |
| **Tablo 2** | Peyvên Wezîfedar | 15 |
| **Tablo 3** | Peyvên Xwerû û Peyvên Aloz | 19 |
| **Tablo 4** | Nimûneyên Morfemên Pir-kîteyî | 21 |
| **Tablo 5** | Têkiliya Deng, Morfem û Wateyê | 24 |
| **Tablo 6** | Cureyên Morfeman | 28 |
| **Tablo 7** | Wergiriya Qadên Morfolojî û Peyvsaziyê | 30 |
| **Tablo 8** | Lêkolîna beşên Peyvsaziyê | 32 |
| **Tablo 9** | Di Kurmancî de Navên Cihêreng bo Pêşgir û Paşgiran | 40 |
| **Tablo 10** | Qertaf û Cureyên Wan | 41 |
| **Tablo 11** | Çend Nimûneyên Pêşgiran | 42 |
| **Tablo 12** | Çend Nimûneyên Paşgiran | 42 |
| **Tablo 13** | Çend Nimûneyên Navbendan | 43 |
| **Tablo 14** | Ji Çend Zimanên Beyanî Peyvên Wergirtî/Deynkirî | 56 |

## KURTEBÊJE

**amd.** **:** amadekar

**b.n.** **:** berhema navborî

**bnr.** **:** binêrin

**brn** **:** berawird bikin

**ç.** **:** çap

**g.n.** **:** gotara navborî

**h.b.** **:**heman berhem

**h.g.** **:** heman gotar

**j.** **:** jimar

**r.** **:** rûpel

**wd.** **:** wekî din

**wer.** **:** wergêr

**vgz.** **:** veguhêzer

# DESTPÊK

Di jiyana mirovan de ragihandin xwedî rol û risteke girîng e. Her dem û li her derê mirov ji bo hewcedariyên xwe bi rêya zimên ragihandinê pêk tînin. Ev yeka jî bivê-nevê hewcedarîyeke daîmî bi zimên re çêdike. Ziman jî ji perçeyên wek morfem, peyv, hevok û wd. pêk tê. Ji van her perçeyek xwedî rol û rista xwe ye. Di vê xebata li ser kurmancî de em ê li ser rol û fonksîyona peyvê, awayên darîştina wê, rê û rêbazên ku ji bo peyvsaziyê tên emilandin û wd., rawestin. Peyv bi rola xwe ya girîng ve pêkanîna zimanekî re dibe bingeheke qehîm. Mirov bi awayekî berdewam wan dixebitînin lê haya wan jê nîne bê ka bi hezaran peyvên ku her roj di devê wan de ne ji ku derê hatine û ji çi pêvajoyan re derbas bûne. Heta nika bi hezaran peyv çêbûne û ev pêvajo her berdewam jî dike. Di vê xebatê de em dê bala xwe bidin ser mekanîzma an jî pêvajoya çêbûna peyvan ku bi îngilîzî wekî *word-formation process* tê zanîn.

Di vê serdema teknolojiyê de, ji ber ku em di bin dorpêçkirina amraz û eşyayên nû de ne, hewcedariyeke ku hertim bi awayekî zêde dibe, ferhenga me muhtacê peyv û têgehên nû dike. Ji ber vê çendê her sal bi dehan peyvên nû di nav piyaseya zimanên cihanê de ji xwe re wergirên nû dibînin û seranserê dinyayê belav dibin. Darîştina peyv û têgehên nû yên di zimanekê de ne bi keyfî ye, lêbelê di guherîn û werara civakî, ekonomîk, siyasî û çandî de ziman pêdivî bi wê yekê dibîne ku pêkhatin û pêkhateyên nû yên ku her roj dikevin nav jiyana me ya rojane bi nav bike. Helbet hemû peyvên berbelavbûyî xwediyê heman temenê nînin, çunku hin peyv bi demê re di zimên de diedilin, berevajî vê hin peyv jî piştî demekê ji ferhenga zimên tên derkirin. Carna jî peyv û têgehên ku di zimanekî de ne dirûvê xwe diguherînin û bi pêvajoya demê re wateyên nû li xwe bar dikin. Di heman demê de form û teşeyên peyvan û wateyên wan bi sedan salan di nav çanda gel de teşe digirin û ji şer, erf û edet, keresteyên zimên û çanda neteweyî bandor digirin.

Di sedsala bîstan de, pirraniya zimanên cihanê digelek dîsîplînan de ketin nav geşedaneke mezin û berçav. Pêşveçûnên teknolojîk, bi taybetî jî teknolojiya zanyariyê ku her diçe berbelav dibe, qada peyvsaziyê çalaktir kir û bi rêya medya û perwerdehiyê werara zimên di nava gel de şewq veda, ziman bi pêş de ketin. Çaxa ku ew hemû qewimîn û pêşketinên zimanî li seranserê dinyayê pêk dihat, li ser zimanê(n) kurdan ku ji mêj ve di bin nîrê dewletên cihê de bû, texrîbateke mezin pêk hat, zarokên kurdan di pêvajoyeke bêzimankirinê re derbas bûn. Zimanê kurdî dema

pêrgî van zehmetiyan hat û bi salan ji perwerdehiyê bêpar ma, vê yekê encamên xerab derxistin holê. Ji ber vê çendê ji layê edebî ve zimanê kurdî lawaz ma, cureyên modern yên wekî roman û kurteçîrokan dereng ketin nav zimên. Zimanê kurdî bi sedan zor û zehmetiyan re serederî kir, bi salan li ber xwe da, îroro edebiyata kurdî wekî "edebiyata berxwedanê" tê binavkirin û nirxandin. Qedexe û neyîniyên ku kurdî heta niha lê rast hatiye, paşdemayîna derbarê edebiyat, perwerdehiyê de heta radeyeke bilind zimannasiya kurdî jî xiste bin bandora xwe. Bi vî rengî peyvsaziya kurdî ya ku bi rêya bikaranîn û werara zimên ve bi pêş dikeve lawaz ma.

Çêkirina peyvan jî wekî pirraniya mijarên din, ji pêwenda civakî, siyasî û dîrokî tesîr digire. Eger îroro peyvsaziyeke bikewn ya zimanê kurdî tune be, ev yek nîşan dide ku texrîbata ku pêk hatiye çendî rûxîner û wêranker bûye. Dîsa jî eger mirov bi xweşbînî lê bimeyzîne, mirov ê bibîne ku vî zimanî bergirî li ewqas zehmetiyan kir û xweragiriya xwe winda nekir. Îroro ne di asteke daxwazkirî de be jî gihaye azadiyeke qismî û bi rêya ragihandin û perwerdehiyeke kêmber werara xwe lezandiye. Sebaret bi van salên dawî, hejmarek zêde weşanên curbicur ketin fealîyetê û bi vebûna beşên kurdî li zanîngehan bazara zimên xweştir kir. Hêvî heye ku ev geşedana vî zimanî perşkestî her roj ber bi xweşiyê ve bidome.

Ji bo zimanê kurdî jî pêvajoya çêbûna peyvan ji zimanên din ne cihêtir e lêbelê hin taybetmendiyên zimanê(n) kurdî yên ku ziman pê heta roja me ya îroyîn hatiye bi çend qaîdeyan ve ku bi heman demê de taybetmendiyên ziman-malbata kurdî ye, xwe ji hin zimanên din cihê dike û rêya bidestxistina peyvên nû bi awayên xwe yên xwemalî destnîşan dike. Zimanê kurdî, ji ber ku xwediyê hejmarek gellek zêde qertafên peyvsaz e û ji ber ku dikare hem li pêş û li paş û hem jî hundir ve qertafan bigire xwediyê şiyana berhemdariyeke mezin e.

Xebata me li ser du pişkên cuda dabeş dibe ku a yekem "pênase, pêkhate û teşeyê peyvê", a duyem jî "peyvsazî û qertafên peyvsaz ên kurmancî" ye. Bingeh û binetara peyvsaziyê peyv bi xwe ye. Loma, hewcedarî bi teswîrkirin û zelalkirina peyvê û teşe û pêkhateyê wê hebû. Ji ber vê divêtiyê, berê pêşîn babeta ku di vê xebatê de tê ravekirin peyv e. Pênaseyên cihêreng ên peyvê ku bi qadên cihêreng ve têkildar in, peyvên binaverok û peyvên wezîfedar, peyvên basît û kompleks, morfem, morfemên serbest û yên vebestî bi nimûneyan ve di beşa berîn a tezê de hatine ravekirin. Beşa duyem di "peyvsazî û qertafên peyvsaz ên kurmancî"yê de

xebatên sereke ên li ser peyvsaziya kurdî bi seredorî hatine destnîşankirin. Kitab û gotarên kurdî yên ku di heman demê de ji bo vê xebatê bûne çavkanî hatine rêzkirin. Pey re qertafên peyvsaz hatine ravekirin û rê û rêbazên sereke yên ku di zimanên din yên cihanê de jî berdest in hatine berpêşkirin. Beşa dawî a tezê de lîsteyeke nimûne ya paşgirên kurdî di tabloyekê de hatine rêzkirin. Hin paşgirên berdest ên kurmancî li gorî peyva ku çêdikin wekî navdêrsaz, rengdêrsaz, lêkersaz û hokersaz hatine sinifandin. Paşgirên ku di tabloyê de hatine derpêşkirin, ji aliyê wateyê ve hatine ravekirin. Di vê tabloyê de çavkaniyên sereke ên ku qertaf tê de hatiye behs kirin, li kêleka rastê ya tabloyê de hatiye nivîsîn. Bi vê tabloyê ve me armanc kir ku qertafên peyvsaz ên ji çavkaniyên cihêreng bêne berhevkirin, bo sinifandina qertafên kurdî wekî pêşnûmayeke xebatên dahatûyê bê dîtin. Armanca vê tezê di pêwenda zimanê kurdî de destnîşankirina dabaşên li ser peyvsaziyê û nirxandin û zelalkirina rêbazên çêkirina peyvên kurmancî ye. Ev tez, wê li ser pêvajoyên morfolojîk (pêşgir, paşgir û formên pevgirtî) yên kurmancî hûr be û di heman demê de wê berhemdariya morfolojiya kurdî, bi nêrîneke gelemperî ve rave bike. Ev xebat, ji bo qada peyvsaziya kurdî destpêkeke biçûk e.

# BEŞA YEKEM

## 1. PÊNASE, PÊKHATE Û TEŞEYÊ PEYVÊ

### 1.1. Wekî Perçeyekî Watedar yê Zimên: Peyv

Herçend ku ji aliyê herkesî ve di jiyana rojane de bi sixletî têgeha *peyv*ê bê şixulandin jî pênasekirina peyvê zaf zehmet e, ji ber ku mirov dikare pirr aliyan ve li peyvê binêre. *Peyv*, *bêje*, *çeku*, *wûşe*, *wite* an jî *kelîme* yek ji wan perçeyên herî girîng e di zimannasiyê de. Lewma, pêdivî bi pênasekirina peyvê heye. Lêbelê, herçiqas wekî axêver/qisekerên zimên em di derheqê peyvê de xwedî bîr û rayekî bin jî herkes dikare li ser babeta pênasekirinê, li gorî fêhm û feraseta xwe çend tiştan bibêje çunku pênasekirineke navneteweyî û çarçoveyeke wê ya diyar ne berdest e. Ne ji ber ku pênasekirina peyvê tune ye lêbelê herçiqas perçeyekî biçûk ê bêqîmet xuya bike jî pêwendidariyeke wê ya xurt ligel hevbirrî, dengnasî, watenasî, teşenasî, hevoksazî û wd., heye û hevterîb bi van têgehan gişan re di bergehê qada têkildar û pêwendê de, pênasekirinên wê yên taybet hene. Lêbelê ya muhim ew e ku ji pirr layenan (*aspects*) ve taybetmendiyên peyvê yên herî sereke bi nêrînên pêwendîdar ve bêne şîrovekirin û teswîrkirin.

Armanca me di vê beşê de ew e ku em bi pênasekirinê ve nezelaliya di derbarê terma 'peyv'ê de hinekî ji holê rakin û li gorî bîr û baweriya zimannasan wê ji çend rehendên cihê ve lêbikolin û teswîr bikin. Di ferhenga *Webster's Unabridged Dictionary* de bi neqilkirina Donna Lardiere, peyv wekî biçûktirîn perçeya serbixwe ya zimên tê hesibandin an jî ev perçeya ku di derrbirînê (*utterance*) de ji yekeyên din dikare bête veqetandin.[1] Hebûna peyvê xwe naspêre peyveke din anku peyv dikare ji perçeyên din veqete û herwisa dikare di nava hevokê de pozîsyona xwe biguherîne. Di diyaloga biçûk a li jêrê de (1b) serxwebûna peyvê tê destnîşankirin;

**(1)**

**a.** Tu herî zêde ji kîjanê hez dikî – *sêv* an hurmî?

**b.***Sêv*.

[1] Ralph Fasold & Jeff Connor-Linton, "Words and Their Parts", *An Introduction to Language and Linguistic,* Cambridge University Press, New York, 2010, r.56.

Peyv dikarin tevlî avakirina rêzimanî jî bibin wekî biwêj û hevokan. Sermeselê, peyva *sêvê* li gorî rola xwe ya rêzimanî dikare di hevokê de li pozisyonên cuda rabe:

**(2)**

**a.** *Sêv* ji bo te baş e.

**b.** Ew *sêvê* naxwe.

**c.** Di *sêvê* de antîoksîdantên bimifa hene.

Dema ku ji aliyê hêmanên hevokê ve lê bê nihêrîn *sêv* di hevoka (2a) de kirde ye, di hevoka (2b) de bireser e, di hevoka (2c) de jî hoker e.[2] Wekî ku di mînakan de jî tê dîtin, li gorî rewş û pozisyona xwe peyv dikare rolên cihêreng bide ser milê xwe.

Li gorî ferhenga navborî peyv "bi gelemperî ji aliyê valahiyan ve ji hevdu tên veqetandin û ji aliyê fonolojiyê ve tên ferqkirin, wekî kirpandinê." Ev tespîta bi awayekî qismî rast e. Herçiqas di formên nivîskî yên pirraniya zimanan de valahî/navbir bikevin navbera peyvan jî, *orthography* (forma nivîskî ya zimanekî) pêkhateyeke muhim ya peyvbûnê (*wordhood*) nîne. Çunku zimanên wekî çînî hene ku di nivîsê de tu valahiyê naxin navbera peyvan, lêbelê axiverên van zimanan dizanin di zimanê wan de peyv çi ye.[3] Jixwe ev babeta ortografiyê wê li jêr bête ravekirin.

Li gorî Laurel J. Brinton peyv/kelîme dikare ji çend hêlan ve bête pênasekirin. Ew van pênasekirinên curbicur wiha rêz dike:

1. **Rastnivîsî / Hevbirrî (*Orthographic*):** peyv ew tişte ku di navbera valahiyên nivîsê de pêk tê.
2. **Watenasî (*Semantic*):** peyv xwediyê wateyeke hevgir e; ew pêwendiya wateyî ya yekgirtî rave dike.
3. **Dengnasî (*Phonological*):**
   a) Rawestîna potansiyel: peyv di navbera rawestînên potansiyel yên di axaftinê de rû dide. Herçiqas di axaftina rojane de em bi gelemperî

[2] Ralph Fasold & Jeff Connor-Linton, *h.b.*, r. 56.

[3] Ralph Fasold & Jeff Connor-Linton, *h.b.*, r. 55-56.

ranewestin jî, mimkin e ku em di navbera peyvan de rawestin, lê ne di nîvê peyvan de.

b) Kirpandin: dema ku peyvek bi tena serê xwe bête axaftin tenê kirpandineke sereke heye.

4. **Teşenasî (*Morphological*):** peyv xwediyê hevgiriyeke navxweyî ye û nikare ji aliyê yekeyên din ve bê perçekirin; peyv dikare tenê bi zêdebûna pêşgir û paşgiran ve bi rêyeke derveyî bê guhertin.
5. **Rêzimanî (*Grammatical*):** peyv dikare li ser çend desteyên diyar bê parkirin.
6. **Hevoksazî *(Syntactic):*** peyv xwediyê berbelavî û livîneke derveyî ye; wekî yekeyekê tevdigere, ne wekî perçeyan.[4]

Wekî ku mînakên li jorê jî tê famkirin, li gorî bergeh û qada ku mirov peyvê lêdikole, pênasekirin diguhere. Çunku peyv perçeyê sereke ye lewma ji bo qadên curbicur hebûna pênasekirinên wê jî tiştekî pêwîst e. Dema ku mirov rewşa nivîskî ya peyvê an jî forma peyvê dimeyzîne, jihevbirîna her peyvekê ji peyveke din bo forma peyvê ya xweser û bo kesên xwende naskirina peyvê dikeve mijara ortografîk (*orthographic)*ê. Li gorî Trask "peyva ortografîk rêzeke nivîskî ye ku di navbera her yekî de valahiyeke spî heye lêbelê tu valahiyên spî di navîk/orteya wan de tune".[5] Çunku peyv bi qorên herfan ên bênavber/domdar pêk tên û di alfabeya latînî de piştî her peyvekî valahiyek an jî xalek tê dayîn. Grainer û M. Jacobs di xebata xwe ya derbarê pêvajoya ortografîkê de wiha dibêje;

> Dema ku kesên xwende ji bo ku ji rêzên herfan û valahiyan tiştekî beşer bikin çavên xwe li ser deqeke çapkirî digerînin, îhtimaleke mezin ji bo her peyvekî desteyek operasyon di mejî de tê dubarekirin. Ev operasyon formeke nimandina sînyala fîzîkî hesab dike, wan bi nimandinên razber rehevrû dike ku di bîra demdirêj de tên sitirandin û berbijara (herî baş) ji bo naskirinê hildibijêre. Ev pêvajoya sereke wekî pênasekirina peyvê tê qebûlkirin (…).[6]

---

[4] L. J. Brinton, *The Structure of Modern English: A linguistic introduction*, John Benjamins, Amsterdam/Philadelphia 2000, r.96-97.

[5] R.L. Trask, 'What is a Word?' *Working Papers* 11, Department of Linguistics and English Language, University of Sussex, 2004, r.1-12.

[6] Jonathan Grainger & Arthur M. Jacobs, "Orthographic Processing in Visual Word Recognition: A Multiple Read-Out Model", *Psychological Review*, 1996, Vol. 103, No.3, r.518-565.

Li gorî Zêrevan, “valahiyên ( ) di nêvbera du bêjeyan de resmê bêjeyan jêk vavêr dike. Heger valahiya nêvbera du bêjeyan gelek teng be, bêje pêk ve dimînin û resmê bêjeyan xerab dibe. Heger valahiya nêvbera du bêjeyan fireh be hingê çavên mirovî li valahiyê asê dibe û mirov naxwaze xwendinê bidomîne. Mebest ji “resmê bêjeyê” ew e ko li gor lêkolînên zanyarî mirov ne tîpan yek bi yek, lê bêjeyan wekî resm nas dike û dixwîne.[7] Herçiqas ev pênasekirina teşeyî ya peyvê zelal xuya bike jî rewşên awarte hene. Eger mirov li ser hevokekê mînak bide dê baştir be:

— Zimannasî xebateke sîstematîk e.

Di hevoka jorîn de, wekî ku tê dîtin çar peyvên ortografîk hene. Herwisa çar qorên tîpan yên bênavber hene, ji wan sê heb ji aliyê valahiyê ve ji hevdu hatine veqetandin, yek jî ji aliyê niqteyê ve hatiye qedandin. Wekî ku tê dîtin navbir û niqteyên ku em bi kar tînin, di navbera peyvan de rewşa ortografîk diyar dikin.

— Di vê lîstikê de vexwarina avemastê bivê-nevê ye.

Di mînaka li fêzê de, hejmara peyvan dibe ku li gorî pîvanên cihêreng bê guhertin. Eger mirov bendikê (-) wekî niqteşaniyê hesab bike wê demê *bivê-nevê* dibe du bêjeyên jev cuda. Lêbelê eger wisa neyê hesab kirin hingê dibe peyveke ortografîk.

**(3)**

| | |
|---|---|
| avemast | çav-ber-bi-paşerojê |
| mal li kerê kirin[8] | li-ser-lingan-mayîn |
| ava şîrîn | bernameya rojane |

Ev ciyawazî dê zêdetir diyar be dema ku em *avemast*ê bidin ber *ava mast* an jî *ava şîrîn.* Li gorî pîvanên ortografiyê *avemast* bi tena serê xwe peyvek e, berovajî vê *ava mast* û *bernameya rojane* herçiqas yekîtiya wateyî pêk bînin jî ji du birên bêjeyan pêk hatine. Rast e di avemastê de jî yekîtiya watenasiyê heye lêbelê yekîtî û yekparebûna resmê peyvê *ava şîrîn* û *bernameya rojane* de tune ye. Herwisa *bernameya rojane* û *mal li kerê barkirin* peyvên têkil û biwêj in. Li ser komên peyvan

[7] Arif Zêrevan, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)*, Nefel, Stockholm, 1997, r.101.

[8] Biwêjeke kurmancî ye ku tê wateya tevlihevkirin û serobinkirina malê. Wek mînak; “Dema ku ez ketim hindir, min dît ku zarokan mal li kerê kirine.”

û bikaranîna bibendikkirinê (*hyphnation*) lihevkirineke giştî nîne û ev yeka bi gelemperî di îngilîzî de jî keyfî ye. Komên bêjeyan yên ku bi bendikan ve, bi hev re hatine girêdan, wekî mînak *çav-ber-bi-paşerojê*, *li-ser-lingan-mayîn* wekî kiteke yekeyekê tevdigerin û yekîtiya wateyî jî bi xwe re tînin pê. Eger mirov kurteya meselê bîne ziman, mirov dikare bibêje ku krîterên ortografîyê bi sedî sed pêbawer nînin. Dawiya dawî, pênasekirina têgeha ortografiyê dikare rê li ber hin şaştêgehiştinan jî veke, çunku kesên nexwenda (*bêsewad*) ji ber sedemên tabiî nikarin peyvan ji hevdu vavêr bikin û ev jî tê wê wateyê ku ew kes derheqê peyvê de xwediyê tu agahiyê nînin. Hingê, eger pênasekirina ortografiyê nekêm nebe, peyv/bêje dikarin bi awayên din jî bêne pênase kirin.

Peyv xwediyê têgeheke wateyê ya yekgirtî ye çunku peyv dikare wateyekê temsîl bike. Hilgiriya peyvê ya wateyê bo destnîşankirina qeyd û bendên peyvbûn (*wordhood*) û nepeyvbûnê têrê nake. Çunku koma peyvan jî carinan dikare wateyeke yekgirtî bide lêbelê ji aliyê ortografiyê ve krîterên peyvbûnê bi cih neyne. Lewma, *mal li kerê kirin* û *çav-ber-bi-paşerojê* herçiqas ji aliyê watenasiyê (*semantic*) ve wateyeke yekgirtî hildabin jî, bi pîvanên peyvê re li hev nakin. Dema ku mirov ji vê bergehê ve lê dinêre mirov dikare amaje pê bike ku herçiqas peyv bi gelemperî wateyeke yekgirtî bînin pê jî, hemû têgehên yekgirtî bi tenê peyvekê ve nikarin bêne nimandin.

Peyv ji aliyê dengnasiyê ve jî xwediyê roleke sereke ye. Lewma pêdivî bi pênasekirina peyva fonolojîk heye. Trask dema ku peyva fonolojîk rave dike, dibêje "perçeyeke axivînê ye ku wekî perçeyeke bilêvkirinê (*pronunciation*) tevdigere û ev yeka jî di her zimanî de ne wek hev e."[9] Wekî ku li jorê jî gotin hate ser, rawestînên potansiyel di navbera axaftinê de hene. Axaftina rojane zêde rê nade rawestînên potansiyel, lêbelê dîsa jî eger rawestînek çêbe ev rawestîn di wexta axaftinê de di nêv peyvê de çênabe. Di heman demê de, dengnasî (*phonology*) di diyarkirina tixûbê navbera peyvan de roleke muhim dilîze.[10] Çunku, kirpandina fonolojîk wateya derbirrînê (*utterance*) zêdetir berçav dike û bi vî rengî jî sînorê peyvê eşkere dike. Wekî mînak, derbirrîna /sɜrsɜrɪ/[11] bi saya serê kirpandinê (derplêdan/hêz), di (3a)yê de diyar dike ku peyveke pêkhatî ye, lêbelê di (3b)yê de du peyvên cuda ne:

---

[9] R.L. Trask, *gn*., r.1-12.

[10] Ralph Fasold & Jeff Connor-Linton, bn., r.57.

[11] Sembolên di navbera xêzika xwar /../ de, bilêvkirina peyvê nîşan dide, bi tîpên alfabeya fonetîk a navneteweyî ve.

**(4)**

(4a) Tê gotin ku kujer kesekî *serserî* ye.

(4b) Tê gotin ku kujer bi *ser serî* ketiye.

Wekî ku ji mînakên li jorê jî tê dîtin, di navbera peyvan de, ji aliyê dengnasiyê ve jî tebitînek heye. Ev tebitîn, bi rêya kirpandinê sînorên peyvê destnîşan dike. Dema ji axaftinê tê îzolekirin, her peyvek encax dikare xwediyê kirpandineke sereke be. Di derheqê kirpandinê de Tan dibêje, di kurmancî de kirpandin her tim ne li heman cihî ye. Dema ku peyv xwerû bin kirpandin li ser kîteya dawîn e, lê hin caran kirpandin dikeve ser kîteya berî wê jî. Çi kurt çi dirêj hemû dengdêr dikarin kirpandinê bigirin ser xwe.[12] Ji bo cihê kirpandinê di peyvên kurmancî de, em dikarin çend mînakan rêz bikin (5):

**(5)**

| | | | |
|---|---|---|---|
| k**u**rd | b**e**rx | d**î**k | z**i**k |
| hes**i**n | tuz**i**k | rib**ê**s | hevalt**î** |
| rab**û**n | hevkar**î** | nîhêr**î**n | darist**a**n |

Ji aliyê teşenasiyê ve jî hevgiriyeke navxweyî ya peyvê heye û ev hevgiriya peyvê di hevokê de feramoş nabe. Di derheqê hevgiriya navxweyî (*internal cohesion*) ya peyvê de zimannas John Lyons du têgehan nîqaş dike: livdariya potansiyel (*positional mobility*) û dabeşnebarî (*uninterruptability*).[13] Ji van a yekemîn anku livdariya potansiyel dikare di hevoka (6)an de, wiha bête ravekirin:

**(6)**

*zarok – hêdî – ka – ser – e – jêr – î – di – meş – e.*

Ev hevoka li jorê dikare li ser deh rêzên morfeman bê dabeşkirin ku bi rêzeke diyar ve diqewime û pêwendidariya her rêzê bi yeke din re heye. Lêbelê çend qalibên din (6) yên ku di kurmancî de dikarin bêne qebûlkirin jî mimkin in:

**(7)**

*hêdî – ka – ser – e – jêr – î – di – meş – e – zarok.*

[12] Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî (çapa berfirehkirî),* Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2015, r.81.

[13]John Lyons, *Introduction to Theoretical Linguistics*. Cambridge University Press, 1968, r. 202.

*hêdî – ka – zarok– ser – e – jêr – î – di – meş – e.*

*di – meş – e – hêdî – ka – zarok– ser – e – jêr – î.*

Alternatîfên hevoka borî dikare zêdetir be jî. Lêbelê bi rihetî tê dîtin ku di hemû alternatîfan de, hemû cot an jî komên morfeman wekî 'blokan' tevdigerin – pêkvehiyek di tevgerên wan de heye û bi rêzên hev re pêwendîdar in. Ji ber vê çendê qalibeke bi vî rengî ne gengaz e (8):

***(8)***

** zarok – ser – e – meş – jêr – î – di – e – ka – hêdî*

Taybetmendiyeke mezin ya peyvê jî ew e ku peyv meyldar e ku aliyê rewşa navxweyî ve westar be (ji aliyê rêza pêkhateyên morfeman ve), lêbelê ji aliyê pozisyona xwe ve livok/livdar e (di heman hevokê de dikare cihê xwe bi peyveke din re biguherîne).[14] Sabitbûna navxweyî tê wê wateyê ku peyv ji aliyê yekeyên din ve nikare bête perçekirin. Lêbelê peyv bi rêyeke derveyî ve dikare tenê bi zêdebûna pêşgir û paşgiran ve bê guhertin. Lewma peyvek bêyî ku tekûziya hevokê xerab bike dikare bi bitûniya xwe ve cihê xwe yê di nav hevokê de biguherîne (*livdariya potansiyel*). Ji aliyê rêzbûna morfeman ve bi rêyeke navxweyî guherîna cihê morfemê di nav peyvê de pêkan nîne. Wekî mînak, peyva *heval-o* yaku qertafa gazîkirinê hildaye di kurmancî de dirist e lêbelê dema ku cihê qertafê bê guhertin, bo nimûne **hev-o-al* an jî **h-o-eval*[15] li gorî qeyd û bendên rêzimanî yên kurmancî bi temamî xelet in. Di heman mijarê de mirov dikare nimûneyeke din jî li ser peyva *xwîndarî*yê bide. Peyva *xwîndarî*[16] ji sê morfemên cuda pêk hatiye *xwîn, -dar, -î.* Her yek ji wan morfeman (di mînaka me de paşpirtikan) bêyî ku ji cihê xwe bileqin bi awayekî sabit cihê xwe girtine û bi hev ve zeliqîne. Lewma bo nimûne qalibên wekî **îxwîndar, *darxwînî, *xwînîdar* ji aliyê kurmancî ve nayê pejirandin. Mînanî hin rêbazên din, awarteyên qeyd û bendên *livdariya potansiyel* û *dabeşnebariyê* jî hene. Bo nimûne di zimanê holendî û almanî de koka hin lêkeran ji hev tên veqetîn û cihê xwe diguherînin ev yeka jî herdu têgehan dike zorê. Eger bi nimûneyan ve bête berpêşkirin babeta me yê zelaltir be:

[14] Lyons, *h.b.* r. 203.

[15] Di vir de asterîsk (*) wekî nîşandeka peyv an jî hevoka ne pêkan û xelet e. Di derên din de jî bi heman armancê hatiye bikaranîn.

[16] *Xwîndarî* tê wateya dijminahiya navbera du kesan û tolhildana wan ya ji hev.

Nimûneya li jêr ji lêkera cudabar/parvebar ya *ankommen* ya almanî hatiye dayîn:

**(9)**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Sie | ***kommt*** | sofort | ***an*** | |
| Ev | digihîje zûzûka | li | - 'Ew zûka digihîje' | |
| | | | | |
| Sie | *ist* | sofort | ***angekommen*** | |
| Ev | – | zûzûkali- gihîşt | | - 'Ew zûka gihîşt' |

Nimûneya li jêr ji lêkera cudabar ya *aangekomen* ya holendî hatiye dayîn:

**(10)**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Ik | ***kom*** | morgen | ***aan.*** | |
| Ez | gihîştim | sibê | li. | - 'Ez sibê digihîjim' |
| | | | | |
| Hij | is | ***aangekomen***. | | |
| Ez | – | li-gihîşt | | - 'Ez gihîştim' |

Wekî ku ji mînakên li jorê jî tê dîtin, di hin zimanan de (almanî, holendî, mecarî, afrîkansî, latînî û çendên din) de ji koka lêkerê perçeyek diqete û di hin rewş û deman de dîsa pê ve dizeliqe. Di almanî de lêkera *ankommen* (gihîştin, hatin) ji hev vediqete. Livdariya potansiyel ya ku tê de peyv bi forma xwe ya parastî ve xwediyê tevgerekî bû di nav hevokê de, di vê babetê de nikare bersivekî bide vê rewşa awarte. Di kurmancî de, lêker pêrgî rewşeke bi vî rengî nayên. Lêbelê di zazakî de di çend lêkeran de heman jihevqetîna lêkerê (*verbteilung*/*tmesis*) çêdibe. Lewra ev hedîseya balkêş di kurdî de jî heye. Bo nimûne;

Nimûneyên li jêr ji lêkera cudabar ya *akerdiş/akerdene* û *rakewtiş* yên kirmanckî/ zazakî hatiye dayîn:

**(11)**

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Ez | berê | banî | **akena.** | | |
| Ez | derê | xanî | vedikim. | | - ‘Ez derê xanî vedikim.’ |
| | | | | | |
| Mi | berê | banî | **kerd** | **a.** | |
| Min | derê | xanî | kir | ve. | - ‘Min derê xanî vekir.’ |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Ehmed | newe | **rakewto.** | | |
| Ehmed | nû | raket. | - ‘Ehmed nû raket.’ | |
| | | | | |
| Ehmed | nika | **keweno** | **ra.** | |
| Ehmed | nika | dikeve | ra | -‘Ehmed nika radikeve.’ |

Di babeta hevoksaziyê (*syntax*) de, dema ku axiverên zimanekî peyvan hîn dibin, di heman demê de bikaranîna wê ya di nav teşeya hevokê de jî pê re hîn dibin. Her peyveke di hevokê de digel çend alternatîfan xwediyê cihekî ye. Ji ber erk û qaîdeyên zimên, bi hin hêmanên hevokê re têkildar e. Husein Muhammed derbarê peyvrêziyê de dibêje ku mirov dikare hema-hema bi dûvdilî (keyfî, ixtiyarî, *arbitrarily*) peyvan li hevokê zêde bike yan jî jê kêm bike. Lê mirov nikare peyvekê li her cihê hevokê zêde bike Bo nimûne, ev hevokên li jêr (12) li gor kurmanciya giştî xelet in:

**(12)**

* Malê were!    * Te dît kî?

* Dît kî te?    * Dît te kî?

* Bajarî sibê bila ew jî bi te re bên.[17]

Peyva xwarinê bo nimûne dikare wiha bê bikaranîn: *Cindî ribêsê dixwe* û herwisa peyva *xwerbar* dikare li vê hevokê zêde be û wiha bê bikaranîn: *Ribês xwerbar e.* Bêyî ku bizanibin *dixwe* lêker e û *xwerbar* jî rengdêr e, axiverên

[17] Husein Muhamed, Peyvrêzî, *kulturname.com*: http://www.kulturname.com/?p=8857 (29.06.2015)

kurmanciyê bi awayekî tabiî dizanin bê ka kîjan peyv wê di hevokê de di kîjan rêzê de bê bikaranîn. Wekî ku tê dîtin livîneke derveyî ya peyvê di hevokê de heye û bi gelemperî axiverên zimanekî çend qalibên vê livînê dizanin û wan li gorî qaîdeyên ziman dişixulînin. Muhamed amaje pê dike ku kurdî bi piranî zimanekê KBL e (bi navneteweyî SOV anku *subject-object-verb*). Hevoka "min sêvek xwar" qeyda giştî ya peyvrêziya kurdî diyar dike: kirde (K) li destpêkê ye, paşî berkar (B) tê û taliyê jî lêker (L).[18]

Bi qewlê xulasayekê, me ji hevbirriyê heta watenasiyê, ji dengnasiyê heta teşenasî û hevoksaziyê rewşên ku peyv tê de tên pênasekirin û şîrovekirin di vê beşê de bi berfirehî teswîr kir. Di vê pêngavê de em lê xebitîn ku taybetmendiyên sereke yên wekî hevgiriya hindirîn, rêzbûna morfeman, peywira kirpandinê, valahiyên di navbera peyvan de, pîvanên peyvbûn û nepeyvbûnê, komên peyvan û wateya hevgir û wd., bê zelalkirin û di çarçoveyeke li gorî zimannasiyê de bê şîrovekirin. Eger wekî encam di pênasekirinê de xulaseyek were pêşkêşkirin mirov dikare serî li Plag bide. *Plag* di xebata xwe ya bi navê *Word-formation in English* (Peyvsazî di Îngilîzî de) taybetmendiyên peyvê wiha rêz dike:

1) peyv pêkhate ne ku beşeke amajekirina peyivînê [speech specification] pêk tînin

2) peyv atomên peyvrêziyê ne

3) peyv (bi gelemperî) xwediyê kirpandineke sereke ne

4) peyv (bi gelemperî) yekeyên nedabeşbar in [indivisible] [19]

### 1.1.1. Peyvên Binaverok û Peyvên Wezîfedar

Di hemû zimanan de peyv ji aliyê erk û karê xwe ve dibin du cure. Di kurdî de jî peyv ji vê hêlê ve jev tên veqetandin. Ziman ferqeke girîng dixe navbera herdu cure peyvan - peyvên binaverok (*content words*) û peyvên wezîfedar (*function words*).[20] Navdêr, rengdêr, hoker û lêker ji ber ku di hişê me de tiştekî, resmekî,

[18] Muhamed, *g.n.*

[19] Ingo, Plag, *Word-formation in English*. Siegen, DE: Cambridge University Press, 2002, r.9.

[20] Victoria Fromkin û yên din, *An Introduction to Language*,9th (ed.) InternationalEdition, *New York:* Wadsworth,Cengage Learning, 2011, r.38.

tevgerekê, meselekê an jî fikrekê derdixin holê wekî peyvên binaverok tên sinifandin. Xwediyê wateyekî ne û di bikaranîna wan de tişta ku tê famkirin di hişê kesê xwîner û bihîzer de jî watedar e. Bo nimûne, dema peyvên wekî *berx*, *kew*, *delal* û *zelal* bên xebitandin mirov bi rehetî dikare derbarê wan de bifikire. Ji ber ku navên bi vî rengî zêde ne û bi hêsanî dikarin bêne darîştin (li gorî qaîdeyên zimên) wekî koma bervekirî (*open class*) tên binavkirin.

| **Peyvên Binaverok (*Content Words)*** | | |
|---|---|---|
| **Cure** | **Şayesandin** | **Nimûne** |
| **nav** | peyvên ku hemû hebûnên zindî-mirî, diyar-nediyar, bûyer û mefhûman, kes yan jî heywanan diyar dikin[21] | Nûpelda, jiyan, hêvî, peywend |
| **lêker** | kirin, tevger, rewş | xwendin, rûniştin, rabûn |
| **rengdêr** | reng û dirûvê navdêran salix dide | zelal, spehî, mezin |
| **hoker** | navdêrên ku salixê lêkerê didin | zûka, hêdîka, demildest |
| **cînavkên pirsê** | navdêrên ku nîşana pirsyariyê ne | kîjan, kê, çend, çito, çima |
| **neyînî** | navdêrên ku neyîniyê didin | na, qet, hîç |

**Tablo1:** Peyvên Binaverok

Koma peyvên wezîfedar an jî bênaverok mîna peyvên binaverok xwediyê wateyeke zelal û têgehên diyar nînin. Peyvên wezîfedar peyvên alîkar in ku bo

[21] Seîd Veroj, *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî / Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî, Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî*, Weşanên Ava, 2014, Stenbol, r.125.

bikaranîna hevokan ji aliyê rêzimanê ve dirist be, tên xebitandin. Li gorî xebata Fromkin, Rodman û Hyams peyvên wezîfedar (*function words*) têkiliyên rêzimanî diyar dikin û ew xwediyê wateyeke biçûk in an jî tu wateyeke wan nîne.[22] Ew agahiyên sereke nadin hevokê lêbelê peyvên di hevokê de bi hev ve girê didin û lewma jî di avahisaziya hevokan de roleke girîng dilîzin. Lêkerên alîkar, daçek, gihanek û cînavk mînakên van peyvan in. Wekî mînak, lêkera alîkar di gotina pêşiyan ya *şêr şêr e, çi jin e, çi mêr e* de xwediyê erkeke muhim e, herçiqas xwediyê wateye diyar nebe jî bêyî lêkera alîkar ya *bûn*ê ku di hevokê de wekî *e* pêşberî me ye wateya gotina pêşiyan ji dest diçe. Herwisa, peyvên wezîfedar aidê koma bergirtî (*closed class*) ne anku nabe ku peyveke nû li vê komê zêde be. Nûpeyv di vê komê de nînin lêbelê koma bervekirî (navdêr, rengdêr, lêker) ne wisa ye, ew dikarin zêde bibin û ji wan peyvên nû dişên derkevin holê.

| **Peyvên Wezîfedar (*Function Words)*** | | |
|---|---|---|
| **Cure** | **Şayesandin** | **Nimûne** |
| **lêkerên alîkar** | bûn, hebûn û rewşa kirdar diyar dikin[23] | in, (y)î, im, e, şîyan, divêtî |
| **daçek** | peyvên ku cih, tevger û demê destnîşan dikin. | li, di, ji, bi |
| **gihanek** | peyvên ku bêjeyan, komek û hevokan bi hev ve girê didin[24] | û, lêbelê, jî, yan |
| **cînavk** | peyvên ku li dewsa navdêran tên şuxilandin | ez, hûn, em, me, ew, wî, wê |

**Tablo 2:** Peyvên Wezîfedar

Belgeyên zimannasiyê amaje pê dikin ku peyvên wezîfedar û peyvên binaverok rolên cuda dilizîn di zimên de. Peyvên binaverok barê wateyê didin ser

[22] Victoria, Fromkin û yên din, *b.n.*, r.39.

[23] Veroj, *h.b.*,r.211.

[24] Tan, *b.n*, r.195.

milên xwe lêbelê peyvên wezîfedar jî tînin peyvên binaverok bi peywenda rêzimanî ya berfirehtir ve girê didin.[25]

### 1.1.2. Peyvên Xwerû (*Simple Words*)

Peyvên sade, kêm-zêde take-morfemekê dinimîne ku ji aliyê wate û rêzimanê ve serbixwe ye. Anku peyv di ferhenga mêjî (*mental lexicon*) de bi awayekî serbixwe cih digire.

Peyvên sade ji bo çêkirina peyvên kompleks/aloz û şêwazên peyvan wekî binetara ferhengî tê bikaranîn. Bi gotineke din dema ku peyva kompleks û bo nimûne biwêj tê çêkirin ji koka peyva sade tê îstifadekirin. Desteya peyvên sade, peyvên wezîfedar yên rêzimanî (*grammatical function words*), bo nimûne a, ên, yên, ya, ku, di..de, ji, ji..re, li û wd., yên ku bi elementên din re watedar dibin, di nav xwe de dihewîne. Çend nimûne ji peyvên sade yên kurmancî;

**(13)**

| | | |
|---|---|---|
| dar | çem | ziman |
| çav | lan | pez |
| pag | hej | rût |
| zer | tîr | pot |
| mêjî | bîr | diran |
| bêr | zêr | têr |

Peyvên sade ji ber ku pêşgir û paşgiran nikarin bidine ser xwe, zêde dirêj nabin herçiqas qasî peyvên hevedudanî nebin jî yên dirêj jî hene. Tu qertafan, çi pêşgir, çi jî paşgir- hilnadin. Tan amaje pê dike ku peyvên xwerû yên kurdî bi giranî yek-kîteyî û dukîteyî ne û kêm caran dibin sêkîteyî û çarkîteyî. Peyvên pirkîteyî bi piranî peyvên pêkhatî[26] û hevedudanî ne.[27] Herwiha Tan derbarê peyva nexwerû de amaje pê dike ku peyva nexwerû ji hêmanekê pêk tê û dema ku ji hev bê xistin, wateya xwe ji dest dide.[28]

[25] Victoria Fromkin û yên din, *b.n.*, r.40.

[26] Tan peyva *pêkhatî* bo peyvên *darîştî* bi kar tîne.

[27] Tan, *b.n.*, r.81.

[28] *H.b.*,r.63

### 1.1.3. Peyvên Aloz/Nexwerû (*Complex Words*)

Sachiko û Stephen di xebata xwe de amaje pê dikin ku ji aliyê wateyê ve peyvên aloz yên eşkere ew peyv in ku ji elementên morfemîk pêkhatî ne (*stems, bound stems, affixes*), bi vî rengî wateya peyva aloz dikare ji wateyên pêkhateyên wê bête derxistin (w.m., wateya peyva *seydvan* dikare ji wateya *seyd* + *van* ê bête derxistin). Bi heman qaîdeyê, eger wate nikaribe ji pêkhateyên ku peyvê pêk tînin bête derxistin, wê demê peyvên aloz ji aliyê wateyê ve zenûn in (w.m., meriv nikare wateya *dîrok*ê ji *dîr* + *ok* ê derxe);[29] peyvên wiha nikarin bi awayekî dabeşkirî bêne hêvişandin (*stored*).[30] Bi saya van elementên morfemîk yên ku bi rêbazdariya xwe ve vê yekê pêkan dikin, mirov dikare wateya peyvê bi veçirandina peyvê ve derxe holê.

Di dariştina peyvê de rola yekeyên morfolojîk babeteke sereke ye di modelên pênasekirina peyvê de.[31] Derbarê meseleyên têkildarî pênasekirin û rola peyvên aloz de ji sala 1975î[32] û vir ve zaf xebat hatine kirin. Delîlên ceribandî yên ku ji zimanên li rûqalê dinyayê hatine berhevkirin sîstemeke pênasekirina peyvê ya dîtbar şanî me didin ku tê de rêzên tîpan ji hêla perçeyên morfeman ve hatiye analîz kirin. Di xebatên curbicur de, sermeselê, hatiye bidestxistin ku guraniya rayekê (w.m.,*tarî*) karîgeriyê li wê maweyê dike ku em tê de dariştina peyva aloz/kompleks ya ji heman rayekê hatiye bidestxistin, pênase bikin (w.m., *tarîtî*). Herwiha di hin xebatên din de jî hatiye nîşankirin ku pênasekirina rayekekê (w.m.,*paqij*) bi rêya xuyabûna berê ya ji hêla teşenasiyê ve hişyarkereke têkildar e (w.m., paqijker) tê lezandin û ev asankirin nikare ji aliyê karîgeriyên semantîk û *orthographic priming*[33] ve bête rave kirin.[34] Wate eger bikaranîneke gurr ya *tarî*yê hebe, wexta ku mirov pêrgî *tarîtî*yê

---

[29] Mînakên ku nivîskarên navborî ji bo îngilîzî dane ji bo kurmancî hatine guncandin.

[30] Sachiko Kinoshita, & Stephen J. Lupker (Eds.), *Masked Priming The State of the Art.* New York, Psychology Press, 2003, r.282.

[31] R. Frost, A. Deutsch & K.I. Forster, "Decomposing Morphologically Complex Words in a Nonlinear Morphology*". Journal of Experimental Psychology Learning Memory & Cognition*,2000, 26, 751-765.

[32] Bnr. Xebata Taft & Forster ya ku di vê qadê ye cihekî muhim û pêşîkêş digire: Taft, M.,& Forster, K. I. (1975). *Lexical storage and retrieval for prefixed words*. Journal of Verbal Learning & Verbal Behavior, 14, 638-647.

[33] Binbeşeke zimannasiyê ye ku bi awayekî zanistî li ser zimanên mirovan dixebite. Xebatên ku *orthographic priming*ê dihewînin jiber eleqeya derbarê pêvajoya naskirina peyvê ya dîtbar derketiye holê ku dema mirov kiryara xwendinê dike, di vê prosesê re derbas dibe.

[34] Kathleen Rastle û yên din, "The broth in my brother's brothel: Morpho-orthographic segmentation in visual word recognition", *Psychonomic Bulletin & Review*, 2004, 11 (6), 1090-1098.

dibe, maweya nasînê di bin bandora bikaranînên wê yên berê de dimîne û bi vî awayî dariştina peyva aloz û nasîna wê ya teşeyî û dîtbarî hêsan dibe ku ev yek bi wan hişyarkeran re pêwendîdar eku di hişê me de tomarkirî ne. Bi heman şiklî, ji berê de rûbirûbûna peyvên ji heman kokê hatine dariştin (w.m.,*paqijker, paqijkerî, paqijî*) maweya ku em koka wê peyvê/forma sade dinasin, kurt dike.

Bandora şefafiya wateyî ya li ser nimînendetiya morfolojîk xwe dispêre wê fikrê ku dibêje têkiliyên morfolojîk bingehê dide nexşeya navbera form û wateyê. Tevî ku nexşekirina form-wateyê bi pirranî keyfî be jî (w.m., em li bendê nînin ku peyvên ku wekî hevdu tên bilêvkirin ji aliyê wateyê ve jî bişibin hevdu; wekî mînak, tu eleqeya *zozan*ê, bi *hozan*, *ziman*, *zeman*ê re tune ye), peyvên ku ji aliyê teşenasiyê ve kompleks/aloz in dikarin di wê nexşekirinê de “gravên biserûberiyê” (*islands of regularity*) yên muhim pêk bînin.[35]

Zimannas û nivîskarê kurd Tan peyvên aloz/kompleks wekî *peyvên nexwerû* dinavîne û taybetmendiyên wan destnîşan dike. Ew dibêje, bêjeyên nexwerû ew cure peyv in ku ji çend hêmanan pêk hatine. Ew hêmanên ku wan bêjeyan pêk tînin, hin caran peyvên serbixwe ne, hin caran bêjeyeke serbixwe û qertafek têne ba hev û bêjeyeke nû pêk tînin. Herwiha carinan jî qertaf tên pêşî yan jî paşiya bêjeyekê û bêjeyeke nû pêk tînin. Gelek caran jî bêjeyek hem pêşgirê hem jî paşgirê werdigire.[36] Di heman demê de peyvên nexwerû, peyvên hevedudanî û peyvên pêkhatî di nav xwe de dihewînin. Mirov dikare bibêje ku di kurmancî de peyvên aloz/nexwerû gelemperî pirkîteyî ne. Li jêrê (14) çend mînakên peyvên aloz cih digirin:


**(14)**

| | | |
|---|---|---|
| mê-kew | zêr-ker | berd-bir |
| dan-er | ser-dav | xwîn-dar |
| mêr-anî | ber-dest | ser-leşker |
| kal-e-mêr | dar-e-bî | tîr-e-mar |
| ser-qot-î | pel-weş-în | gotin-bêj-î |
| gal-e-gal-î | ser-e-jor-î | da-beş-ne-bar-î |

[35] Kinoshita & Lupker, *b.n.,* r.282.

[36] Tan, *b.n.*, r.81.

Peyvên aloz; peyvên darişţî û peyvên hevedudanî di nav xwe de dihewînin. Li jorê jî hate gotin ku peyvên sade, peyvên wezîfedar yên rêzimanî di nava xwe de dihewînin. Lewre, bi nimûneyan ve eger hemû peyvên navhatî di tabloyekê de rêz bin wê wiha be:




| | | | |
|---|---|---|---|
| *dil* | *bi…re* | **hevedudanî** | **darişţî** |
| *çav* | *ya, a* | *marmasî* | *nivîskar* |
| *sol* | *di…de* | *keskesor* | *wargeh* |
| *gul* | *ya* | *nîvroj* | *kirmanşanî* |
| *deng* | *li* | *dêlegur* | *kêmasî* |

**Tablo 3:** Peyvên xwerû û peyvên aloz

Di nav peyvên aloz/kompleks de her tim peyveke xwerû heye. Bo nimûne, peyva *nivîskar* dikare li ser du perçeyan dabeş bibe, *nivîs* û "–kar". Her yek ji van herdu perçeyan anku 'biçûktirîn yekeyên watedar ên zimên' wateyeke nû didin temamiya peyva *nivîskar*. Berî ku morfema "-kar"ê li *nivîs*ê zêde be, nivîs tê wateya 'komek ji peyvan yên ku li derekê hatiye nîşankirin', lêbelê piştî ku "-kar" hate ser, êdî tê wateya 'ew kesê ku karê wî/wê nivîsandin e'. Paşgira "-kar"ê peyvê dike peyveke aloz, dema ku ev paşgir jê bê avêtin peyveke xwerû/sade derdikeve holê; *nivîs*. Peyva *nivîs*ê tu yekeyeke watedar di nav xwe de nahewîne, ji ber hindê ew peyveke xwerû ye û di heman demê de morfemeke peyvî (*lexical morpheme*) ye. Herwiha, morfema "-kar" ya ku wateya "failê kiryarê" dide morfemeke vebestî (*bound morpheme)* ye.

## 1.2. Morfem

Biçûktirîn yekeya peyvê ya ku ji hêla rêziman û hevoksaziyê ve tê destnîşankirin morfem e ku wekî bingeha ziman tê dîtin. Zimannasan morfem mîna biçûktirîn yekeya rêzimanî hesibandine, çunku êdî ji parçebûna wê tu yekeyeke watedar ya ku bikaribe bi tena serê xwe peyvekê an jî rayeka lêkerekê watedar bike, dernakeve holê. Lêbelê divê morfem bi peyvekê, bi çend kîteyan an jî bi pêşgir û paşgiran ve neyê tevlihevkirin. Ji ber ku têgeha morfemê dikare li ser çend rewşên ciyawaz bête sepandin. Dirist e ku mirov bibêje morfem peyvan pêk tîne lêbelê morfem hertim ne peyvek e. Hin morfem hene ku peyv in lê hin peyv hene ku di nav xwe de du an jî zêdetir morfeman dihewînin. Carinan jî morfem wekî kîteyan tên zanîn, ev yek xelet e. Lewre pirr peyv hene ku ji du an jî zêdetir kîteyan pêk tên lêbelê tenê morfemek in. Sermeselê, *meriv*, *ziman* û *mizgeft* wekî ku xuya dike peyvên serbixwe ne, lêbelê di heman demê de ji ber parçenebariya xwe morfem in. Meriv dikare bibêje ku her morfemek an kok e an jî qertaf e. Di vir de qertaf hem pêşgir û hem jî paşgiran di nav xwe de dihewîne. Her peyv herî kêm divê morfemekê di nav xwe de bihewîne.[37] Meriv dikare bi vî rengî çend nimûneyên morfeman bide:

**(15)**

| | | | |
|---|---|---|---|
| baş | baş-tir | baş-î | ne-baş |
| çê | çê-tir | çê-(y)-î | ne-çê |
| | | | |
| nivîs | nivîs-kar | | nivîs-kar-î |
| cot | cot-kar | | cot-kar-î |

Ev peyvên rajor dikarin bêne perçekirin anku li ser yekeyên biçûk ên watedar bêne dabeşkirin: *baş + tir*, *baş + î*, *ne + baş*, *nivîs + kar*, *û wd.* Her yek ji van perçeyên li jor morfem in. Carinan peyvek dikare ji du an jî zêdetir morfeman pêk bê:

| | |
|---|---|
| yek-morfemî | kil<br>çav<br>dil |

[37] Robert Stockwell & Donka Minkova. *English words: History and structure.* New York: Cambridge University Press, 2001, r.57.

| | |
|---|---|
| du-morfemî | fam-ber<br>dev-tel<br>paş-wext |
| sê-morfemî | ne-dît-bar<br>pê-bawer-î<br>guh-dar-î |
| çar-morfemî | pêş-da-hat-î<br>ser-ber-jêr-î<br>şev-e-der-î |
| bi zêdetir morfeman | ser-jin-ik-î-bûn<br>ser-ber-jêr-î-bûn<br>bi-ser-û-ber-kirin<br>li-xwe-mikur-ne-hat-in |

**Tablo4:** Nimûneyên Morfemên Pir-kîteyî

Peyvên ku ji du morfeman pêk tên bi gelemperî peyvên aloz in. Meriv dikare di vê xalê de peyvên wek *vergî* û *merdimî yên* bi zazakî/kirmanckî[38] nimûne bide. Ev herdu peyv ji hêla morfolojiyê ve peyvên aloz in, ji ber ku *verg* wateya gurekî û *merdim* jî wateya merivekî dide, lêbelê –î ya paşgir wateya pirjimariyê li peyvê zêde dike. Di vir de hem verg û merdim, hem jî –î ya paşgir bi tena serê xwe morfem in. Her yek ji wan êdî nikarin bibin perçeyên biçûktir ên watedar. Anku piştî ku peyv hate perçekirin, perçeyên ku derketin holê dema ku bi tena serê xwe jî hatin bikaranîn xwediyê wezifeyekê û wateyekê ne; bi temamî perçeyên bêwatedar û bêerkdar nînin.

Lêbelê di vê xalê de, divê bala me li ser berdewamiya erka morfema rêzimanî be. Anku dema ku morfem li ser peyvên cuda bê sepandin divê heman peywirê pêk bîne û berdewam be. Bo nimûne, eger em peyvên *xirabî* û *bajarî* binêrin, em ê bibînin ku herdu peyv jî bi paşgira *–î* ve qediyane. Peywirên paşgirên ku hatiye li ser peyvên *xerabî* û *bajarî* ne heman peywir e; wate û erka wan ne wek hev in. Wexta ku em paşbendika "–î" yê li rengdêrekî zêde bikin, em ji wê navdêrekê

38 Di kurdiya zazakî/kirmanckî de, halê sade yê peyvekê dikare bi tena serê xwe pirrjimar be, lêbelê kurmancî de encax dema ku peyv bikeve nava ravekê an jî di risteyekê de bê bikaranîn pirjimariyan –an, -ên hildide ser xwe. Ji ber vê taybetmendiya zazakî berpêşkirina mînaka peyveke ku bi pirrjimariyê ve dibe kompleks û di heman demê de hewcedariyê ravekê nabe, bo mînakê li vir asantir lê hat.

bi dest dixin. Feqet, eger em heman paşgira "–î" yê bînin li pişta navdêran, wê demê ji navdêran rengdêr tê çêkirin. Wekî ku tê dîtin di peyva *xirabî* de paşgira navborî navdêr çêkiriye, lê heman paşgirê di peyva *bajarî* de ji navdêrekî hem rengdêr hem jî navdêrek çêkiriye. Ji vê yekê tê fêmkirin ku herdu –î yên paşgir di rastiya xwe de du heb peywirên navdêrsazî û rengdêrsaziyê rabûye. Di desteyên peyvên jêr de pêşgira "ne-"yê bo nimûne hatiye nîşandan:

**(16)**

| **A** | **B** |
|---|---|
| bixêr | nebixêr |
| zexm | nezexm |
| heq | neheq |
| diyar | nediyar |
| kavil | nekavil |
| maqûl | nemaqûl |
| xirab | nexirab |

Di kurmancî de bi dehan rengdêr hene ku bi "ne-"yê ve dest pê dikin. Di hemû rengdêrên li jorê de erka "ne-"yê heman tişt e anku wateya neyînîyê dide peyva ku lê zêde dibe. *Nebixêr* neyîniya peyva *bixêr* e, *neheq* jî neyîniya peyva *heq* e. Wekî ku ji mînakan jî berçav e, "ne-" dema ku li peyvekê zêde dibe di nav berdewamiyekê de heman wateyê li peyvê zêde dike. Hemû peyvên li jor ji du beşên watedar pêk tên: *ne +xirab, ne + heq, ne + diyar, ne + zexm* û wd. Çawa ku "ne-" di hemû mînakên li jorê de heman wate dide, wisa jî *deng* di lîsteya peyvan ya li jêr de (17) heman wateyê dide peyvê:


**(17)**

| | | |
|---|---|---|
| denganî | dengdar | bêdeng |
| dengnasî | bideng | hevdeng |
| denggir | yekdeng | serodeng |
| dengpîv | nîvdengdêr | dengdan |
| dengxweşî | bêdeng | dengsazî |

| | | |
|---|---|---|
| dengkuj | dengguhêz | dengegaz |
| dengvedan | dengxwên | dengveder |
| dengrêzî | dengandin | vedengî |

*-deng / deng-* di lîsteya jorê de ne parçebar e, lewre herçiqas *de* ji bo diyarkirina cihê tiştekî daçekek be jî, hem di rewşeke bi vî rengî de daçek nakevin nav peyvan hem jî têkiliyeke wê ya wateyî bi peyvê re nîne. Bi heman rengî bi tu şiklî ji aliyê wateyê ve têkiliya *den* bi peyva deng re tune ye. Wekî ku tê dîtin deng di hemû peyvên li jor de, tê wateya "bayê ku ji pişika mirovî derdikeve û di devî de teşe digire"[39] Di vê xalê de, em dibînin ku peyva *deng*ê ji tîpên <d> û pey re <e> û bi zêdebûna <n> û <g>yê ve hatiye holê, lêbelê di pêwenda navhatî de, her yek ji wan tîpan bi tena serê xwe xwediyê tu *wate*yê nîne. Eger her tîpeke di peyva dengê de xwediyê wateyekê bûya, wê demê divê her yek ji wan wekî morfemeke serbixwe bihata nasîn. Lêbelê, her yek ji wan herfan parçeyeke pêjn/sewtê ne, têne li ba hevdu û morfeman dinimînin. Ji bo têkiliya deng/sewt, morfem û wateyê wekî di tabloya jêrîn de ye:

[39] Umîd Demîrhan, *Ferhenga Destî kurdî bi kurdî* (çapa duyem a berfirehkirî), sewad, 2007, r.86.




**Tablo 5:** Têkiliya Deng, Morfem û Wateyê (Stockwell, R., and D. Minkova. 2001: 58)

Herwiha di vê babetê de divê em bi bîr bixin ku morfem dikarin ji nû ve bêne bikaranîn anku veçerxînbar (*recyclable*) in.[40] Ji xeynî vê ji bo ku wateya peyvên aloz bi rehetî bêne texmînkirin, divê morfem ji peyvekî ta peyveke din nîşaneyên nasyariyê bide û bi awayekî wateyê li bitûniya peyvê zêde bike.[41]

Morfem di nava xwe de wekî du birran tên parvekirin: Morfemên (*free morpheme*) serbest û morfemên vebestî/girêdayî (*bound morpheme*). Morfemên ku bi tena serê xwe xwediyê wateyekê ne û ji bo watedarbûnê pêdivî bi tiştekî nînin morfemên serbest in. Morfemên serbest peyvên xwerû ne û eger ji wan pêkhateyek

[40] Stockwell & Minkova. *h.b.*, r.56.

[41] Andrew Carstairs - McCarthy, *An Introduction to English Morphology: Words and Their Structure*, Edinburgh University Press, 2002, r.17.

bê jêkirin, wateya wan bi temamî ji dest diçe. Lewma li ser morfemên serbest tu guherîneke ku zirarê nede peyvê an jî wateya peyvê xerab neke, nikare pêk were. Lêbelê morfemên vebestî barovajî morfemên serbest bi tena serê xwe bi tu rengî nikarin nimandina wateyê bikin. Lewma morfema vebestî divê an li kokê an jî li morfemeke din zêde bibe. Bi pêkanîna yek an jî zêdetir morfemên vebestî û morfemeke serbest ve peyva kompleks/aloz derdikeve holê. Morfemên vebestî wekî qertaf jî tên zanîn (pêşgir, navgir, paşgir).

### 1.2.1. Morfemên Serbest

Morfemên serbest ew cure morfem in ku bi tena serê xwe tevdigerin û xwediyê wateyekî ne an jî kargîneke gramerî pêk tînin; w.k., *meriv*, *rev*, *û.*[42] Morfemên serbest di nava xwe dibin du par, *morfemên watedar* (peyvî) û *morfemên wezîfedar* (rêzimanî).

### 1.2.2. Morfemên Watedar (*Peyvî*)

Morfemên watedar ku bi navên xwe yên wekî morfemên peyvî an jî morfemên binaverok (*content/lexical morphemes*) jî tên zanîn, daxilê *birra bervekirî* ne. Morfemên wihareng xwedîmane ne û bi gelemperî salixê tişt, rewş, tevgerekê dikin. Navdêr, rengdêr, hoker, lêker di vê beşê de cih digirin. Bo nimûne, *mal, dil, lez, hez, tim, roj, zeng* û wd. Ji ber vê morfemên vê beşê tim û daîm pirtir dibin wekî koma bervekirî (*open class*) hatiye binavkirin. Di werara zimanî ya asayî de dema ku ferhenga zimên xurt dibe, koma bervekirî derê xwe ji peyvên nû re vedike û pê hertim zêde dibe. Ev kom ji peyvên watedar pêk tên ku di ferhengan de wekî yek-morfemî cih digirin. Hemû peyvên nû yên ku li zimanekê zêde dibin dikevin vê binbeşê.

### 1.2.3. Morfemên Wezîfedar (*Rêzimanî*)

Morfemên wezîfedar an jî morfemên rêzimanî (*functional / grammatical morphemes*) ew morfem in ku bi tena serê xwe yan xwediyê wateyeke kêmber in yan jî qet wateyeke wan tune ye, lêbelê di hevokê de an jî di girêdana hevokan de erkeke gramerî hildigirin. Morfemên wihareng wekî morfemên watedar xwedîwate nînin û salixê wateyê nadin, feqet fonksiyona wan anku wezîfeya wan ya rêzimanî

---

[42] Zapata Argenis A, Inglés IV (A-2007) Universidad de Los Andes, Facultad de Humanidades y Educacion, Escuela de Idiomas Modernos, 2007.

heye di nav û navbera hevokan de. Bo van morfeman meriv dikare *daçek, gihanek, cînavk, lêkerên alîkar* wekî mînak bide. Morfemên wekî *lê, ev, li, hûn, vê, ji, ku, me*, morfemên wezîfedar in. Di morfemên wezîfedar de ya girîng wezîfeya wan e, ne wateya wan.

### 1.3. Morfemên Vebestî

Morfemên vebestî di nava xwe de dibin du beş: Morfemên çemandinê (*inflectional morphemes*) û morfemên darîştinê (*derivational morphemes*).

#### 1.3.1. Morfemên Çemandinê (*Inflectional Morphemes*)


Tan derbarê morfemên çemandinê de ku ew wekî "qertafên kêşanê" bi nav dike dibêje "ev cure qertaf in ku tu wateyê li bêjeyan zêde nakin, li şûna wê, bêjeyan ji aliyê dem, kes, rawe, mêjer û zayendê ve temam dikin. Qertafên kêşanê yên kurmancî hinek pêşgir in, hinek jî paşgir in. Hem tên serê bêjeyê hem jî têne dawiya wê."[43] Wekî ku ji ravekirina Tanî jî tê fêmkirin morfemên çemandinê anku qertafên kêşanê bi gelemperî wateyeke nû li peyvê bar nakin û birra peyvê (*word class*) naguherînin. Bo nimûne eger peyv navdêr be her wek xwe navdêr dimîne û eger rengdêr be dîsa ji birra xwe venaqete. Bo nimûne peyva "bedew" rengdêr e, eger em bi paşgira "-tir"ê ve peyeya hevrûkirinê bidinê wê bibe "bedewtir" lêbelê wê dîsa jî wekî xwe rengdêr bimîne. Bi vê yekê tê fêmkirin ku paşgira hevrûkirinê ji ber ku wateya bingehîn ya peyvê naguherîne qertafeke kêşanê ye. Helbet hemû qertafên darîştinê cureya peyvê naguherînin. Herwiha peyva "nivîsîn" lêker e, wexta ku bi çemandinê ve demên cuda jê bê bidestxistin, bo nimûne, "nivîsî", "nivîsîbû", "nenivîse", "nanivîse", "nivîsandiye" dîsa jî wateya wê ya ku di koka wê de –nivîs- diyar dibe di hemû deman de jî eşkere xuya dike. Çawa ku ji mînakan jî tê fêmkirin qertafên kêşanê/çemandinê ji aliyê hejmar, zayend, dem, rawe, kesê ve diyar dikin.Wateyeke nû li peyvê bar nakin lêbelê zanyariyên rêzimanî yên çêlhatî li wateya heyî ya peyvê zêde dikin. Rast e, wateya bingehîn a peyvê pêrgî tu guherîneke birra peyvê nayê, bi ser de jî wateya nû ya ku bi rêya morfema çemandinê li peyvê bar dibe, zanyariyên wisa dide dest ku eger fonksiyona wê – morfema çemandinê – bê zanîn bi rehetî guherîna ku li ser navdêr û lêkeran çêdibe, tê pêşbînîkirin. Herwiha qada tesîrê ya morfemên çemandinê bi hin aliyan ve zêdetir e. Bo nimûne, qertafa demekî dikare li ser hemû lêkeran bê sepandin. Xêncî hin

[43] Samî, Berbang: *Morfemên Kêşanê*, www.academia.edu, 25/08/2015.

îstisnayên qertafên peyvçêker, mirov nikare heman tiştî bo hemû qertafên dariştinê bêje.

### 1.3.2. Morfemên Dariştinê (*Derivational Morphemes*)

Morfemên dariştinê ew cure morfem in ku bi wan ve peyvên nû tên hilberandin. Bi gelemperî wateya peyva ku morfema dariştinê tê li ser diguhere. Bo nimûne *–dar* paşgirek e anku morfemeke dariştinê ye. Wexta ku morfema dariştinê -*dar* bê li ser peyva *deyn* jê nûpeyvek çêdibe û wateya nûpeyvê naşibe peyva *deyn*ê. Di vir de berî ku paşgira –dar lê zêde bibe peyva deyn dihat wateya “tişta ku mirov dide kesek din lê wergir piştî demekê li mirov vedigerîne” lêbelê *deyndar* tê wateya “kesa/ê ku tiştek ji kesekî din hildayeû lazim e ku lê vegerîne. Wekî ku ji mînakê jî tê dîtin morfema dariştinê *–dar* wateya peyvê bi temamî diguherîne. Herçiqas di mînaka jorîn de birra peyvê (*word class*) neguherîbe jî –deyn û deyndar herdu jî navdêr in- morfema dariştinê dişê birra peyvê jî biguherîne. Wekî mînak peyva *kêm* rengdêr e, wexta ku paşgira *–asî* lê zêde bibe, ji birra rengdêrtiyê derdikeve û dikeve birra navdêrtiyê; *kêm+asî.*




**Tablo6:** Cureyên Morfeman

## BEŞA DUYEM

## 2. PEYVSAZÎ Û QERTAFÊN PEYVSAZ ÊN KURMANCÎ

### 2.1. Peyvsazî û Wergiriya wê

Peyvsazî di zimannasiyê de wekî binbeşeke teşenasiyê (morfolojî) tê lêkolînkirin. Peyvsazî di beşeke sereke ya morfolojiyê de cih digire ku wekî morfolojiya darîştinê jî tê zanîn. Kaltz û Leclercq di gotara xwe ya bi navê "Lêkolîna Peyvsaziyê ji Destpêkê Heta Sedsala 19mîn" şopên peyvsaziyê ên dîrokî bi awayekî heta demên kevnare dibin.[44] Bi demê re peyvsazî wekî beşeke serbixwe ya morfolojiyê hatiye naskirin û her çûye lêkolînên li ser vê qadê zêdetir bûne. Schmid derbarê dabeşbûna peyvsaziyê de wiha dibêje:

> "Xebata morfolojiyê (*teşenasî*) bi edeten li ser du qadên mezin parve dibe.A yekem wekî morfolojiya çemandinê (*inflectional morphology*) tê zanîn û bi kirdeyê kategoriyên gramerî yên wekî rewş, mêjer, dem û ruxsarê re eleqedar dibe. Ev morfemên çemandinê yên navhatî rayeka peyvan ve dizeliqin û formên peyvan ên nû (ne ku peyvên nû) diafirînin […] Şaxa mezin a duyem a morfolojiyê jî peyvsazî ye ku morfolojiya darîştinê ya ku ji aliyê termînolojiyê ve miqabilê morfolojiya çemandinê ye, werdigire nav xwe."[45]

Bi gelemperî, dema ku behsa peyvsaziyê tê kirin ji nû ve sazbûn û çêbûna peyvekê tê hişê meriv, lêbelê di rêbazên wekî *qusandin* û *paşvesazi*yê de bi tu rengî morfem an jî herf li rayeka peyvê zêde nakin. Ji ber vê yekê, mirov dikeve şikê ku ev awayên payvsaziyê nebin. Ev babeta ji berê de bûye mijara nîqaşê lêbelê îroro ev rêbazên ku mirov tê de yekeyên peyvê jê dibe û kurt dike wekî peyvsaziyê tên lêkolînkirin. Dir vir de encama ku derdikeve holê girîng e. Peyva ku bi *qusandin* an jî *paşvesazi*yê çêdibe, dawiya dawî li ferhenga zimên zêde dibe û wekî peyvên ku bi darîştinê hatine pê tên bikaranîn. Bi vê rêyê, çêbûna peyveke nû bi awayekî derveyî darîştinêjî divê di binbeşa peyvsaziyê de bête vekolîn.


---

[44] Barbara Kaltz & Odile Leclercq, "Word-formation Research from its Beginning to the 19th Century" *Word Formation. An International Handbook of the Languages of Europe* (ed.) Peter O. Müller, Ingeborg Ohnheiser, Susan Olsen & Franz Rainer (HSK), Berlin & New York: De Gruyter, 2015, r. 22-38.

[45] Hans-Jörg Schmid, "Morphology", *Exploring Language and Linguistics* eds. Natalie Braber, Louise Cummings & Liz Morrish, Cambridge: Cambridge University Press, 2015, r. 77-110.

Lêkolîna li ser peyvsaziyê pergalên teşeyî û rêkûpêkiyên di binê pêkhatina yekeyên kompleks de cih digirin, bi rêya blokên (*libin*) heyî lêdikole da ku qeyd û bendan û cureyên din yên giştîkirinê ava bike.[46] Lêkolandina peyvsaziyê li milekî rê û rêbazên dariştina peyvan destnîşan dike û eger rêyên nû peyda bibin wan ji aliyê zimannasî û teşenasiyê ve lêdikole, li milekî din jî wergirî (*scope*) û rêyên çêbûna peyvan nîqaş dike, lê dixebite ku bingeha teorîk bo vê babetê dayne.

Xêncî morfolojiya dariştinê,peyvsazî pêkanîn/hevedudanînê jî lê dikole ku rêbazeke berbelav a zimanan e. Tiştekî berçav e ku di hevedudanînê de bipêşgirkirin û bipaşgirkirin nîne lêbelê mîna rêbazên *paşvesazî*, *qusandin* û *têkilkirinê* yên bi awayekî bêmorfem pêk tên, di binbeşa peyvsaziyê de cih digirin. Schmid di tabloya xwe ya derbarê wergiriya peyvsaziyê de, rêbazên ku bêmorfem pêk tên jî nîşan dide:




**Tablo 7:**Wergiriya qadên morfolojî û peyvsaziyê[47]

Li ser dabeşkirina qada çêbûn/diristkirina peyvan bi temamî nebe jî lihevkirineke berfireh heye.[48] Bi gelemperî ji bo bidestxistina peyvên nû rêyên li ber mirov pirr in: eger tiştekî nû peyda bibe û di zimanê wê civakê de beranberê wê tiştê têgehek tune be, wê demê ji bo bidestxistina wê çend vebijêrk hene. Herwiha divê bê bi bîr xistin dema ku peyveke nû ji zimanekî re hewce bibe û eger peyva resen ji hêla vepîtandin, deng û rêzimanê ve têra wî zimanî neke û dijraber be, beramberî


[46] Hans-Jörg Schmid, "The Scope of Word-formation Research", *Word Formation. An International Handbook of the Languages of Europe,* (ed.) Peter O. Müller, Ingeborg Ohnheiser, Susan Olsen & Franz Rainer (HSK), Berlin & New York: De Gruyter, 2015, r.1

[47] Hans-Jörg Schmid, *g.n*., r. 77-110.

[48] Malmkjær, Kirsten, *The Linguistic Encyclopedia (Second Edition)*, London & New York 2002, r. 359.

wê peyvê li gorî rê û rêbazên wî zimanî çêkirina peyveke nû tiştekî asayî ye. Ev pêkhateya nû bi temamî ji nû ve nayê pê lêbelê ji materyalên ku di zimên de berdest in, ji şêweyên diyar û bi perçeyên zimên ve li gorî sîstema wê zimanê bi rêyên asayî tê diristkirin. Ji rabirdûyê hetanî nika, mirovan methodên têvel emilandine ji bo afirandina peyv û termên nû. Ji van metodan hinek ev in; darîştin, hevedudanîn, têkilkirin, dubarekirin û wd.

Çawa ku li fêzê jî hate ziman, diristkirina peyvan ji hêla zimannasiyê ve wekî binbeşeke morfolojiyê tê bicihkirin. Dîsa jî li ser hin rêbazên peyvsaziyê lihevkirinên giştî pêk nehatiye, ji ber ku li gorî çavkaniyan û kesan hejmara rêbazên peyvsaziyê diguhere.Bi vê mebestê bo ku cihê diristkirina peyvan di serê mirov de zelal bibe wergiriya morfolojiyê bi şemayeke bi vî teherî ve dikare bête berpêşkirin.[49]




Di vê beşa tezê de piştî ku çavkaniyên sereke yên li ser peyvsaziya kurdî hatine ravekirin, binbeşên peyvsaziyê wê bin pênasekirin. Di derbarê termînolojiya peyvsaziyê de, divê bê bibîrxistin ku pirraniya têgehên ku wê bên pêşkêşkirin ji aliyê Husein Muhammed ve di rêzegotarên wî yên li ser peyvsaziyê de hatine nivîsandin.[50] Helbet têgehên ku ji berê de jî hatine bikaranîn hebûn, hin ji wan bo beşên din ên tezê hatin şixulandin.

Herçend li gorî ziman, armanc û baweriya lêkolîner û hin tiştên din sinifandinên cuda jî pêkan bin, Tablo 8an a li xwarê rêyên herî berbelav ên sinifandina cureyên sereke yên peyvsaziyê di zimanên cihanê de destnîşan dike.[51]

[49] Malmkjær, *h.b.*, r. 358.

[50] Husein Muhammed, “Peyvsazî di Zimanê Kurdî de”, *Kanîzar (kovara elektronîk)*, 2015, h.1;

[51] Hans-Jörg Schmid, "The Scope of Word-formation Research", *bn.*, r.6




**Tablo 8:** Lêkolîna beşên peyvsaziyê

### 2.2. Xebatên li ser Peyvsaziya Kurdî

Xebatên li ser peyvsaziya kurdî bi gelemperî wekî beşên biçûk di nav kitabên rêzimanî de cih digirin û kêm-zêde qala qertafên kurdî (çi pêşgir, çi jî navgir û paşgir) û cureyên peyvên kurdî û ji mînakên qertafan û peyvên ku ji qertafan çê dibin, dikin. Li gorî raya zimannasê kurd Husein Muhammed *Rêzimana Kurdî* ya Celadet Bedirxan û Roger Lescot ya bi fransî yekem rêzimanname ye ku bi rêjeyî bi berfirehî qala peyvsaziya kurmancî tê de hatiye kirin.[52] Ji wê xebata girîng heta îro pir rêzimannameyên kurdî hatine çapkirin û pirranî jî binbeşên morfolojiyê de û behsên qertaf û darîştin/viraştina peyvan de vê mijarê raber dikin. Pirraniya berheman bi kinî qala dabaşê dikin û nakevin nav hûrgiliyên mijarê loma mijar bi berfirehî nayê şîrovekirin. Lêbelê çend berhemên girîng hene ku mijarê bi nêrînên cuda dinirxînin û berfirehtir jê çêl dikin. Berhema Amed Tîgrîs ya bi navê *Pêşkît û Parkît* ku xaseten qala pêşgir û paşgirên kurmancî dike, dikare wekî berfirehtirîn xebata çapkirî ya li ser peyvsaziya kurmancî bê hesabkirin.[53]Li gorî Muhammed kitêba Kamiran Rehîmî ya bi navê *Binemakanî Wişesazî û Wişeronan le Zimanî Kurdî da* girîngtirîn berhema li ser mijarê ya bi soranî ye û herwiha kitêba Ismail Fattah Kamandar ya bi navê *Les Dialectes Kurdes Meridionaux: Etude Linguistique et Dialectologique* (Devokên Kurdî yên Başûrî: Xebata Zimannasiyê û Diyalektolojî)

[52] Muhammed, *g.n.,* r.4.

[53] Muhammed, *g.n.*, r.4.

wekî kitêbeke girîng ya li ser peyvsaziya kurdiya başurî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) ye.[54]Divê bê bibîrxistin ku pirtûka *Rêzimana Kurmancî* ya Samî Tan heman mijar wekî beşeke berfireh di bin sernavê peyvzaniyê[55]de rave kiriye û herwiha çend beşên din yê kitêba xwe de jî behsa qertaf, qertafên navdêrsaz, paşgirên navdêrsaz, paşgirên lêkersaz jî kiriye û bo xebatên bi vî rengî bi ferhengoka li dawiya pirtûkê zêdekirî ve hewla bidestxistina termînolojiyeke kurmancî ya hevbeş kiriye.

Li ser peyvsaziya kurdî hejmara kitabên bi kurmancî kêm in û yên heyî jî bi gelemperî ne bi nêrîneke berfireh ve hatine amadekirin ne jî hemû binbeşên peyvsaziyê rave dikin. Lewma hin kitabên li ser vê babetê ji hêla qada peyvsaziyê ve berteng in û ji pirsgirêkên ilmî jî bi rêjeyî dihewînin. Di vê xebatê de, çiqas ji destê me bê, em ê lîsteyeke kitab û gotarên li ser peyvsaziyê li jêr rêz bikin û bi kinî be jî danasina wan ya bi mijarê re têkildar bikin. Kitabên li jêr bi gelemperî an wekî xebateke xweser li ser peyvsaziyê rawestiyane an jî di nava xebatê de beşek ji bo peyvsaziyê terxan kirine. Lêbelê ev lîsteya biçûk ne bêkêmasî ye.

*Emir Djeladet Bedir Khan* û *Roger Lescot*(1971) *Grammaire Kurde (Dialecte Kurmandji).* Ev kitaba ku bi fransî hatiye nivîsîn lêbelê bi erebî û tirkî jî berdest e yekem rêzimanname ye ku bi rêjeyî bi berfirehî qala peyvsaziya kurmancî tê de hatiye kirin. Di kitabê de beşa bi navê *Composition des Mots* (Pêkhatina Peyvan) di kitabê de du beşên sereke yên peyvsaziyêanku pêşgir û paşgir bi mînakên kurmancî ve hatine ravekirin. Di pirtûkê de Celadet Alî Bedirxan û Roger Lescot di beşa pêşgiran de dibêjin herçiqas hinek ji wan kêmpeyda bin jî cih daye hemû pêşgirên ku wan tespît kirine.[56] Ji vê bergehê, mirov bi rehetî dikare amaje pê bike ku ev rêzimanname yekem hewldan e ku dixwaze hemû pêşgir û paşgirên kurmancî nîşan bide û ji ber ku wate û kargîna pêş û paşgiran jî hatiye berpêşkirin û rêzkirin, cihekî muhim dagirtiye. Di destpêka beşa kitêbê ya navborî de behsa pêkhatina peyveke nû *balafir*ê tê kirin û wiha tê gotin "…ev peyv di Şerê Cihanî yê Yekem de

---

[54] Muhammed, g.n., r.4.

[55] Tan, di çapa duyemîn (2011) ya pirtûka xwe de heman mijar wekî *peyvsazî* bi kar anibû di dewsa morfolojiyê de. Lêbelê di çapa nû ya pirtûka xwe de (2015) heman beş wekî *peyvzanî* sererast kiriye. Peyvsazî ji bo morfolojiyê têgeheke nerast e ji ber ku *morf* tê wateya form anku teşeyê û ev form ne tenê peyv in herwiha qertaf in jî. Bi raya min *morfolojî* peyveke berbelavbûyî û naskirî ye jê re kurmancîkirin hewce nake lê eger bê wergerandin *teşenasî* an jî *şêwenasî* bêtir lê tê. Dîsa jî bo rêgiriya alizandina têgehan, di vê xebatê de peyva *morfoloji*yê ya ku derbasî pirranîya zimanên cihanê bûye, hatiye bikaranîn.

[56] Celadet Alî

, Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2009, r.280.

dema ku makîneyên firinde li ser asoya Kurdistanê xuya bûn derket holê. Peyva «balafir»ê ji peyvên «bala» û «fir»ê pêk tên. Paşê ji vê peyvê balafirvan, balafirvanî, balafirgeh û wd., hatin dariştin."[57]

*Amed Tîgrîs* (2001) *Pêşkît û Parkît*. Nivîskarê pirtûkê li gorî rêza alfabetîk pêşkît û parkîtên[58] kurmancî rêz kirine, taybetî û bingeha peyv, pêşgir û paşgiran hatiye ravekirin. Li ser her pêşgir û paşgirekê bi kurtî zanyarî hatine derpêşkirin. Di berhemê de nivîskar 42 pêşgir û 138 paşgirên kurmancî destnîşan kiriye ku hin ji wan pêşgir û paşgirên çemîner in, ne yên peyvsaz in. Ji ber ku pirtûk tenê li ser pêşgir û paşgiran hûr dibe û wan di berhemekê de kom dike bi roleke muhim radibe. Nivîskar bo hemû pêş û paşgiran hewl dide ku hejmarek zêde mînakan nîşan bide lewma hema hema bo her pêşgir û paşgirekê –eger nimûne berdest bin– bi dehan peyvên ku bi rêya qertafê hatine darîştin mînak dide. Nivîskar di destpêka pirtûka xwe dexebatên li ser paşgir û pêşgirên kurmancî dinirxîne, çend kêmsiyên wan destnîşan dike, behsa girîngî û rola wan ya di dewlemendkirina zimên de dike û wiha pê de diçe; "Teknîk her ku bi pêş dikeve, tiştên nû tên dîtin, bi wê jiyana civatî jî tê guhartin. Kar û mijarên nû derdikevin holê, navên nû li wan tên kirin. Li gor hewcedariya dem û civata nû ziman jî bi pêş dikeve û xwe li gor civat û teknîka nû diguhêre. Di ziman de termînolojî tê guhartin û peyvên nû tên dîtin. Hejmara bêjeyên ferhenga kurdî zêde dibin. Di vî warî de kar û wezîfeyeke girîng dikeve ser pêşkît û parkîtan ku bi alîkariya wan gotinên nû tên çêkirin."[59]

*Kamiran Rehîmî* (h.1387) *Binemakanî wişesazî û wişeronan le zimanî da*[60]. Kitab rêbazên giştî ên peyvsaziyê bi awayekî ilmî dide ber xwe û yekoyeko wan rave dike. Di dawiya berhemê de termên ku di pirtûkê de hatine bikaranîn û tên pêşniyazkirin bi rêya ferhengokeke bi îngilîzî, farisî û soranî ve hatiye amadekirin. Nivîskar rewşa pêvajoya peyvsaziya kurdî *kaotîk* bi nav dike û bi rê û rêbazên zanistî yên derbarê peyvsaziya zimanên cihanê li ser kurdî disepîne. Kitab hem ji ber ku xebateke zanistî ye hem jî bi berfirehî peyvsazî daye ber xwe girîng e.

*Samî Tan* (2015) *Rêzimana Kurmancî*. Rêzimannameya Samî Tan bê şik xebateke girîng û berfireh e ku bi pirhêlî babetên rêziman û zimannasiya kurdî

---

[57] Bedirxan û Lescot, *h.b.*, r.275.

[58] Amed Tîgrîs, ji dêleva pêşgir û paşgiran (bi înglizî *prefix* û *suffix*) pêrkît û parkît bi kar tîne.

[59] Amed Tîgrîs, *Pêşkît û Parkît*, weş. Medya, Stockholm, 2001, r.9.

[60] Kamran Rehîmî, *Binemakanî Wişesazî û Wişeronan le Zimanî Kurdî da*, Korî Zanistî Zimanî Kurdî-Êran, weş. Gutar, Seqiz, 1387.

berpêş dike. Ji ber ku xebata Tan di hin beşên kurdî yên zanîngehan de jî wekî pirtûka sereke ya rêzimanê tê xebitandin, têgeh û termînolojiya ku nivîskar bi kar tîne –ku heman demê de xwe dispêre Celadet Bedirxan- her diçe li Bakurê Kurdistanê serdest dibe. Tan rêzimannameya xwe ya ku di sala 2005an de yekem car bo weşanê amade kir, pey re bo her çapeke nû ya kitêbê beşên wê yên bikêmasî û nezelal bêhtir kamil kirin.

*Rêzimana Kurmancî* (2015) ya Tan beşeke berfireh bo peyvsaziya kurmancî terxan kiriye. Di beşa bi navê *peyvzani*yê de ku nivîskar bo morfolojiyê bi kar tîne, cureyên peyvan, qertafên kêşanê û qertafên peyvsaz bi nimûneyan ve hatiye eşkere kirin. Di bin sernavê qertafên peyvsaz de ku dikeve nav babeta peyvsaziyê nivîskar pêşgir û paşgirên kurdî senifandiye û minak ji bo wan daye. Beşa bi peyvsaziyê re têkildar ya bi navê *peyvzani*yê qedera 20 rûpelan e. Herwisa di vê beşê de pêşgir û paşgirên kurmancî, fonksiyon û wateya wan bi mînakan ve bi seredorî hatiye pêşkêşkirin. Girîngiya vê beşe, destnîşankirina erk û peywira pêşgir û paşgiran e. Di pirtûkê de, beşa bi peyvsaziyê re têkildar ne tenê ev beş e. Tan, di beşa navdêran de peyvsaziya navdêran, di beşa hevalnavan de peyvsaziya hevalnavan, di beşa hokeran de peyvsaziya hokeran, di beşa daçekan de peyvsaziya daçekan û ya herî berfireh jî di beşa lêkeran de peyvsaziya lêkeran nirxandiye, boneta her yekê ji beşên navhatî xwerûbûn û alozbûna wan bi nimûneyan ve destnîşan kiriye. Beşa bi navê “ji aliyê peyvsaziyê ve lêker”ê de lêkerên xwerû, lêkerên nexwerû, lêkerên pêkhatî û qertafên lêkersaz, paşgirên lêkersaz û pêşgirên lêkersaz hatine nirxandin û mînak bo paşgir û pêşgirên lêkersaz hatine berpêşkirin. Pirtûka Tanî, bi rastî jî bo babeta peyvsaziyê zanyariyên bimifa dihundirîne û lewma jî bo fêmkirin û zelalkirina vê mijarê çavkaniyeke sereke ya rêziman û zimannasiya kurmancî ye ku ji aliyê pirr kesan ve tê bikaranîn.

*Ismail Fattah Kamandar* (2001) *Les Dialectes Kurdes Meridionaux Etude Linguistique et Dialectologique* (Devokên Kurdî yên Başûrî: Xebata Zimannasiyê û Diyalektolojî) Ev kitêb berfirehtirîn rêzimana kurdî ye ku bi zimanekî biyanî hatiye nivîsîn. Nivîser hewl dide di vê kitêbê de bi awayekî sîstematîk dengnasî (*fonolojî*), teşenasî (*morfolojî*), hevoknasî (*sintaks*), û peyvsaziya (*word formation*) van devokan pêşkêş bike. Bi dirêjahiya xwe û di piralîtiya xwe ya pêşkêşkirina

nimûneyan ji devokên cuda û berhevdan û miqayesekirina wan de ev kitêb di zimannasiya kurdî de bênimûne û bêhevta ye. [61]

*Husein Muhammed (2015) Peyvsazî di Kurdî de (1), Peyvsazî bi Darîştinê (2)* Peyvsazî bi Darîştinê (II) û Dubarekirinê (3). Husein Muhammed di rêzegotarên xwe de yên ku bi seredorî hersê hejmarên kovara kanîzarê de derçûn, babeta peyvsaziyê bi awayekî ilmî û di çarçoveyeke teorîk de hildide dest. Fikrên Muhammedî yên xwemalî û mînakên resen ji kurmanciyê vê xebatê ji hinkûfê wê cihêtir dike. Helbet xebatên wî yên domdar, mijûliya wî ya salane bi zimannasiya kurdî, derfeta bidestxistina xebatên cihêreng ên zimanê kurdî ku bi zimanên cihê hatine nivîsîn rê li ber wî xweş dike ku ew bi bergeheke firehtir û bi miqaseyeke saxlemtir ve kurdî binirxîne. Muhammed di xebata xwe ya navborî de kêmasiyên xebatên berî ya xwe destnîşan dike û amaje pê dike ku gellek ji vekoleran bi armanca ku kurdî dewlemendtir bikin, bi awayekî neilmî pêşgir û paşgir li kurdî zêde kirine. Herwiha ew dibêje hin xebatên kurdî de erk û wateya pêşgir û paşgirên kurdî baş nehatine diyarkirin û hin qertafên çemîner wekî paşgir hatine hesabkirin. Ev xebata navborî ya Muhammedî ji aliyê termînolojiyê ve bû bingeh bo vê xebatê.[62]

*Abdûrrahman Bakir (2015) Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî (1)[63].* Ev pirtûk, a ku peyvsaziya navdêr, cînavk, hevalnav, jimarnav, hoker, veqetandek, daçek, baneşanan wekî beşên serbixwe dide ber xwe û wan bi yeko yeko dinirxîne. Bi vê rêbaza xwe ve dişibe rêzimannameya Tan. Pirtûkê herwiha bi mînakan ve paşgir û pêşgirên kurmancî rave kirine di beşên têkildar de. Awayê nirxandina peyvsaziyê ya vê pirtûkê naşibe gotarên Muhammed an jî pirtûka Rehîmî yên ku zêdetir bi rê û rêbazên derbasdar ên navneteweyî ve dixwazin nêzîkî babetê bin. Ev pirtûk ji ber ku bi awayekî serbixwe ev babet nirxandiye di vê qadê de cihekî muhim dadigire.

*Reşo Zîlan* (2005) "Paşgirên Kurdî I-II-III", Ev rêzegotarên Zîlan, bi seredorî hejmarên 36, 37, 39 yên Kovara Kurmancî de hatine weşandin. Zîlan wateya ku paşgirê daye peyvê û cureyên peyvan yên ku bi paşgirê ve saz dibe, rêz dike. Bi vî rengî xebata Zîlan, ji hinkûfên xwe sîstematîktir û tekûztir xuya dike. Ev xebat bo paşgirên kurmancî xebateke muhim e.

[61] Husein Muhammed, "Nasandina kitêbekê: Rêzimana Kurdiya Başûrî", *Kanîzar (kovara elektronîk)*, 2015, h.2, r.73-74.

[62] Hin gotarên Muhammed dema ku teza min ber bi qedandinê bû, derketin. Ji ber ku dema min nemabû êdî, min nikaribû jê istifade bikira.

[63] Abdûrrahman Bakir, *Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî (1)*, weş. Aram, Stenbol, 2015.

### 2.3. Dariştin (*Derivation*)

Pêvajoya herî berbelav ya çêkirina peyvan bê şek û şibhe ev pêvajoye ku em jê re dibêjin *darîştin*.[64] Ev angaşta ku ji bo zimanê îngilîzî hatiye gotin di heman wextê de ji bo zimanê kurdî jî rast e. Di kurmancî, zazakî û soranî de bi rêya pêşgir, navbir, paşgiran bi hezaran peyv hatine darîştin û hê jî ev pêvajo didome. Pêvajoya darîştinê li ser bingeha peyva heyî pêk tê. Lewma, rola pêşgir, paşgir û navbirên kurdî di pêvajoya bidestxistina peyvên nû de muhim e. Lê di rewşa pêdivî de eger peyvek ji rayek û pêşgir û paşgiran ve bête çêkirin, divê berî her tiştî wateya pêşgir an jî paşgirê baş bête zanîn ku ev bêjeya nû li bejn û bala zimên were. An na peyvên req, temosarkî û mekanîk derdikevin ku ev jî di heman demê de mirina hin peyvên zimên bi xwe re tîne. Zimanê kurdî zimanekî wisan e ku hem ji pêş ve, hem ji paş ve hem jî, ji nav ve qertaf (*pirtik, ek*) distîne.[65] Di warê çêkirina peyvên nû de wazifeyeke mezin ya pêşgir (*prefix*), paşgir (*suffix*) û navgiran (*infix)* heye. Binavkirineke gelemperî ve ev hêmanên navborî qertafên peyvsaz in ku pê peyvên darîştî tên pê. Lewre bi saya serê van qertafan, peyv û bêjeyên nû tê dizên.

#### 2.3.1. Qertaf (*Affix*)

Qertaf; di vir de qesta me qertafên peyvsaz in, dişên bi tevlêbûna xwe ve peyvên nû bidarijin û peyva nûpêkhatî ya ku bi rêya qertafê saz dibe di ferhenga zimanekê de dişê cih bigire. Li gorî Muhammed "mirov dikare pirtikan li gor erk û wezîfeyên wan jî li ser du pişkên mezin parve bike. Hin pirtik çemîner in (*inflectional*) û hin jî peyvsaz in (*derivational*)."[66] Ji ber ku babeta me ya sereke peyvsazî ye em dê qala qertafên çemandinê/kêşanê nekin. Qertafên peyvsaz, wekî ku ji nav jî tê famkirin peyvan saz dikin. Pêşgir, paşgir û navgir dikevin binbeşa vê mijarê. Qertaf, bi gelemperî nikarin bi tena serê xwe peyvekê pêk bînin, lê tên ser rayek û gewdeya peyvê. Wateyên wan, carna ne diyar in, carinan jî xumam in. Tan amaje pê dike ku qertafên peyvsaz ên kurdî bi piranî berê peyvên serbixwe bûne, bi domana demê re wateya wan hatiye jibîrkirin, ji peyvên watedar dageriyane morfemên peywirdar.[67] Ne tenê qertafên kurdî, herwiha hindek qertafên peyvsaz ên zimanên din jî bi heman rengî berê peyvên serbixwe bûne, lê bi pêvajoya qertafbûnê re derbas bûne, bo

---

[64] George Yule, *The Study of Language (Fourth Edition),* Cambridge University Press, New York 2006, r. 58.

[65] Zana Farqînî, "Dahûrîna le ser parkîtên di kurmancî de", *Kovara Zendê* (Payîz, 1996) h.1, r.62.

[66] Husein Muhamed, "Peyvrêzî", *kulturname.com*: http://www.kulturname.com/?p=8857 (29.09.2015)

[67] Tan, *b.n*, r.63

nimûne tirkî.[68] Di vê babetê de mirov dikare bibêje ku hindek qertafên peyvsaz ên zimên carinan ji demên dêrîn heta roja me hatine. Bo nimûne qismeke qertafên peyvsaz ên kurmancî di çavkaniyên zimanên kevn ên îranî de xuya dibin, hindek ji wan wê demê xwediyê wateyekê bûne û bi demê re li zimanên îranî ên berdest belav bûne. Loma ji aliyê dîrokî ve meriv dikare şopa hindek qertafên kurdî di metnên kevn yên îranî de bibîne ku demekê ne wekî niha qertaf bûne, lêbelê peyvên serbixwe bûne. Bi demê re, bi erkên nû rabûne û bûne paşgir. Bo nimûne paşgira –geh a ku di kurdî de çalak e, di zimanê pehlewî de dihat wateya cih, text, nivîn.[69] Wekî ku tê dîtin pareke mezin ya qertafên peyvçêker ên kurdî di rastiya xwe de wextekê peyvên serbixwe bûne. Ji ber vê çendê ye ku nika hindek qertafên farisî, kurdî, belûçî, talîşî yên hevpar ji avesta û farisiya kevn hatine. Îhtiyacên ku bi demê re derketine holê rê li ber qertafbûna wan vekiriye. Helbet, hindek qertafên kurdî hene ku mirov nikare di metnên dîrokî de şûnpêyên wan teqîp bike. Li jorê jî gotin hate ser, form û taybetmendiyên ziman-malbata kurdî dihêle ku ew hem li pêşî û paşiya xwe, hem jî li nava xwe qertafên peyvsaz bigire. Ev taybetmendî ya ku fonksiyoneke çalak û pirhêlî dide ziman, di derbarê afirînerî û berhemdariyê de şiyan û behremendiya zimanê kurdî berçav dike.

Bi demê re çendek qertafên çemandinê, wateyên nû digirin û bêyî ku teşeya xwe biguherînin wezîfeya qertafên peyvsaz hildidin. Bo nimûne, paşgira –an ya ku hê jî di cureyên kurdî de li kar e, dikare peyveke nû çêbike, wekî *erdelan, omeriyan, reşkotan* û wd. Ev yeka nîşan dide ku bi domana demê re guherînên bingehîn ên wateyî yên ku bi heman demê bi bikaranîna demdirêj re jî têkildar in dihêle ku hin qertafên çemîner wezîfeya xwe berfirehtir bikin û bibin qertafên peyvsaz.

Farqînî ji aliyê binyadî ve qertafan wekî *qertafên sade* û *qertafên hevedudanî* li ser du pişkan dabeş dike. Li gorî wî qertafên peyvsaz bi çar awayan dikarin peyvên nû biafirînin ku her yek ji wan xwediyê wezifeyekê ne:

1. Qertafên ji navdêran navdêr çêdikin
2. Qertafên ji navdêran lêker çêdikin
3. Qertafên ji lêkeran navdêr çêdikin

[68] Nadir İlhan, "Türkçede Ek + Kök / Kök + Ek Kaynaşmasıyla Ortaya Çıkan Ekler", *Turkish Studies*, Volume 4/8 Fall 2009, r.1572-1594., 2009

[69] David Neil McKenzie, *A Concise Pahlavi Dictionary*, Oxford University Press, London, 1986, r. 34.

**4.** Qertafên ji lêkeran navdêr çêdikin[70]

Qertaf an jî *pirtik* ligel hevedudanînê rêya herî berbelav ya sazkirina peyvan e ku wekî ku li jorê jî gotin hate ser, tîne pêşgir, paşgir û navgiran di nav xwe de dihewîne. Wekî hemû qadên din yên zimannasî û rêzimannasiya kurdî, li ser têgehên vê babetê jî lihevkirineke giştî hê pêk nehatiye. Aydogan jî gotara xwe ya li ser termînolojiya zimannasiya kurdî de dibêje "gava ku mirov bala xwe dide rêzimanên kurdî yên zaravayê kurmancî û metodên fêrbûyina vî zaravayî, mirov di cîh de dibîne ku di binavkirina têgehên zimannasiyê de lêkolîn û xebatênku heta niha hatine kirin, li hevdu nakin."[71] Lihevnekirin û aloziya ku li ser navê pêşgir û paşgiran peyda bûye ne kêmî aloziyên babetên din e. Herçend e me hin çavkaniyên sereke li vir rêz kiribin jî, reng e ku ev tablo çend rêzimanname û gotarên sereke tenê dihewîne da ku wêneyê vê nelihevkirina têgehan baş bête dîtin. Divê mirov ji bîr neke û bibêje ku berbijara ku em lê xebitîn di vê xebatê de bi kar bînin berbijara herî berbelav e di kurmancî de.[72]

| | | |
|---|---|---|
| **H. Muhammed[73] (2015)** | pêşpirtik | paşpirtik |
| **Amêdî (2012)[74]** | pêşpirt | paşpirt |
| **Yıldırım[75] (2012)** | pêşgir | paşgir |
| **Tan (2015)** | pêşgir | paşgir |
| **Baran[76] (2012)** | pêşgir | paşgir |

70 Farqînî, *g.n.*, r.9

71 Îbrahîm Seydo Aydogan, *Guman-1*, weş. Lîs, Stenbol, 2013, r. 19

72 Di vê xebatê de me qertaf, (*affix*), pêşgir (*prefix*), paşgir (*sonek*) bi kar anî.

73 Zimannas Husein Muhammed di gotarên xwe de yên ku bi gelemperî li ser înternetê belav dike, bikaranîna *pêşpirtik* û *paşpirtik*ê çêtir dibîne. Bo nimûne, binêre: *Kovara Kanîzar*, hejmar 1:https://zimannas.files.wordpress.com/2015/08/hejmar11.pdf (25/10/2015)

74 Ev dîrok ya çapa latînîzekirî ye ku ji aliyê M. Xalid Sadînî ve tîpguhêziya wê hatiye kirin. Binêre: Sadiq Behaeddînê Amêdî, *Rêzimana Kurdî (Kurmancîya jorî û jêrî ya hevberkirî),* Weşanên Dîwan, Stenbol, 2012.

75 Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, weş. Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê, Mêrdîn, 2012.

76 Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî,* Weşanên Belkî, Stenbol, 2012

| | | |
|---|---|---|
| **Zîlan[77] (2005)** | pêşgir | paşgir |
| **Shojai [78] (2015)** | pêşwend | paşwend (?) |
| **Veroj[79] (2014)** | pêşqertaf | paşqertaf |
| **Aydogan[80] (2012)** | pêşgir/pêşpirtik | paşgir/paşpirtik |
| **Tîgrîs[81] (2001)** | pêrkît | parkît |
| **Rehîmî[82] (1387)** | pêşgir | paşgir |

**Tablo 9:** Di Kurmancî de navên cihêreng bo pêşgir û paşgiran

a) **pêşgir (*prefix*):** li pêşiya rayeka peyvê zêde dibin û wateyeke nû didin peyvê. Di kurdî de li gorî paşgiran hejmara wan kêm in.
b) **paşgir (*suffix*):** tê pişta rayeka (kok) peyvê û wateyeke nû li peyvê bar dike. Bi gelemperî cureya peyvê jî diguherîne. Qertafên herî çalak û berbelav yên kurdî paşgir in.
c) **navbend (*interfix*):** qertafa ku rayeka peyvê perçe nake lê dikeve navbera du rayekên cuda û wan bi hevre dizeliqîne.*ser-o-bino, reş-e-ba.*
d) **navgir (*infix*):** bi gelemperîdi peyvên ji zimanê samî deynkirî de rûdide, dikeve nava rayeka peyvê û wateyeke nû lê bar dike: *şewitîn >şew**a**t, weşîn> weş**a**n.*
e) **dorgir(*circumfix*):** morfemeke awarte ye ku tê li dora herdu aliyên koka peyvê û rayekê bi wî awayîdorpêç dike. Ev cure qertaf di kurmancî de tune ye lewma mînakên me yê ji zimanên beyanî be: *frag-en >ge-frag-t, trink-en, ge-trunk-en.*
f) **transfix (transfiks):** morfemeke awarte ye ku qertafê ji hev dike û wateyê de guherînê pêk tîne. Herî zêde di zimanên samî de heye. Mirov dikare

[77] Reşo Zîlan, “Paşgirên Kurdî”, *Kurmancî: Rojnameya Taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê*, j.36

[78] Behrooz Shojai, “Dengsaziya Kurmancî”, Notên Waneya Rêzimana Kurmancî, Enstîtuya Zimanên Zindî Unîversîteya Mardin Artuklu.

[79] Seîd Veroj, *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî / Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî, Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî*, Weşanên Ava, Stenbol, 2014.


[80] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnîsînê*, weş. Rûpel, Stenbol, 2012.

[81] Amed Tîgrîs, *b.n.*

[82] Rehîmî,*b.n.*, r.107

mînakan ji peyvên ku di heman demê de ketine kurdî bide:*k-t-b* 'nivîsîn', tewang û dariştin bi rêya dengdaran ve pêk tê, *ketebe* 'nivîsîn', *kitab* 'pirtûk', *kutub* 'pirtûk (pirjimar)', û wd.

**g) pevgir**[83] **(*confix*):** qertafên (affix) ku tên li ser koka peyvê û xwe bi peyvê ve digirin. Pevgir nakevin navbera du peyvên jev cuda. Di vir de wekî sernavekî ji bo qertafên ku nakevin navbera rayeka peyvê tê xebitandin




**Tablo 10:** Qertaf û cureyên wan

### 2.3.2. Pêşgir (*Prefix*)

Pêşgir ew kîteyên serbixwe ne ku bi tena serê xwe ne xwedî wateyeke berdest in, lê çaxa ku li pêşiya peyvekî zêde dibin wateyeke nû ji peyva heyî derdixin. Di zimanê kurdî de pêrkît û parkît dikare ji hinek kîteyên serbixwe, daçek, bêjeyên neyînî (*negation*), zayende, hoker, navdêr û ji hinek pêrkît û parkîtên taybet pêk bên.[84] Di vê xalê de, bi taybetî jî di qada qertafan de –çi pêşgir, çi navgir û paşgir- zimanê kurdî dişibe zimanê îngilîzî. Pirraniya pêşgirên di zimanê îngilîzî de

[83] Herçiqas di hin çavkaniyan de, di wateya dorgirê (circumfix) de hatibin bikaranîn jî, me pevgir (*confix*) ji bo kategorîzasyona zelal ya forma qertafan, ew bi awayekî cuda nirxand.

[84] Amed Tîgrîs, *b.n.*,r.8.

xwedî du taybetmendiyên balkêş in: înteraktîf in û bi serbestî peyvê ve dizeliqin,[85]bi vê halê xwe ve dişibe kurdî. Bi hejmareke zêde pêşgiran ve kurdî pirr-fonksînel e. Ev yeka di pêwîstiya diristkirina peyvên nû de, derfetên berfireh li ber kurdiya kurmancî vedike. Çunku bi rêya pêşgiran bêyî ku peyvek ji kokê ve bête afirandin, wateyeke nû li peyva heyî tê zêde kirin. Ev hem bo têgehên nû zêdetir derfetan berpêş dike, hem jî peyvên bi rêya pêşgiran pêk tên li ferhenga zimên zêde dike.

| Pêşgir | Wate | Mînak |
|---|---|---|
| ra- | jor, li ser, pêşxistin (carna jî wateya ber bî jê dide; raketin) | rakirin, rawestgeh, ragihandin… |
| ve- | paşveçûn, dubarekirin, nûkirin | vekişîn, vedîtin, vejîn… |
| der- | derbûn | deranîn, derçûn, derkirin… |
| dû- | berdewamî, li pişt mayîn | dûajo, dûmahîk, dûxan… |
| wer- | guhastin, nûkirin | wergêr, wergirtin, weranîn… |

**Tablo 11:** Çend Nimûneyên Pêşgiran

### 2.3.3. Paşgir (*Suffix*)

Paşgir, paşdanî, paşpirtik, pêrkît an jî carinan paşgîn[86] cureyekê morfeman e ku tê li ser rayek û gowdeyê peyvan û wateyeke nû li peyvê zêde dike. Paşgir kîteyek, an jî koma kîteyan e ku tê li pişta peyvê û wateya fonksiyona rêzimanî ya peyvê diguherîne û carinan birra peyvê jî diguherîne. Hejmara paşgirên kurdî gelek ji hejmara pêşgirên kurdî zêdetir e. Ji dusedî zêdetir paşgirên kurmancî hene.

| Paşgir | Wate | Mînak |
|---|---|---|

[85] Adrienne Lehrer, "Prefixes in English Word Formation", *Folia Linguistica*, 1995, 29 (1-2), r.133-148.

| | | |
|---|---|---|
| -dar | xwedîtî, | dikandar, deyndar, maldar |
| -geh | cih, war, şûn | seyrangeh, dirûngeh, xwaringeh |
| -gir | girtin | masîgir, kirêgir, xelatgir |
| -nak | hebûna tiştekî, tijî | tirsnak, xeternak |

**Tablo 12:** Çend Nimûneyên Paşgiran

### 2.3.4. Navbend (*Interfix*)

Di kurdiya kurmancî de, xêncî pêşgir û paşgiran, navbend jî hene ku dikevin navbera du peyvan û wan peyvan pevre dikelijînin. Navbend koka peyvan xerab nakin wekî navgiran.

| Peyva yekem | Navbend | Peyva duyem | Mînak |
|---|---|---|---|
| rast | -e- | rast | rasterast |
| ser | -o- | bin | serobin |
| ser | -û- | ser | serûser |
| dev | -û- | dev | devûdev |
| şeh | -în- | şah | şehînşah |

**Tablo 13:** Çend Nimûneyên Navbendan

### 2.3.5. Dorgir (*Circumfix)*

Dorgir (*circumfix*) bi awayekê biqertafkirinê (*affixation*) ye kupêşgir û paşgir bi hevdemî hev digirin, yek tê pêşiya peyvê ya din jî tê paşiya peyvê. Qertafeke bi vî rengî ya ku bikaribe heman fonksiyonê pêk bîne di kurdî de nîne. Tan di pirtûka xwe de bi kurtî behsa dorgiran dike û amaje pê dike ku peywira gihaneka "û" ya ku wekî -o- dikeve navbera du peyvan, nêzîkî dorgirê ye ku di peyvên *serobino* û *şaşomaşo* de xuya dibe.[87] Lêbelê ji ber ku bi temamî koka peyvê naxin navbera xwe û herwiha

[87] Tan, b.n., r. 75

ji ber ku ji aliyê teşeyê ve peyveke hevedudanî ye, nabe ku mirov van nimûneyan wekî dorgirê qebûl bike. Pênaseyên dorgirê, ne kêm in û zimanên ku teşeyên wan hatiye lêkolîn, hin xususiyetên bi rengê dorgirê nîşan bidin jî, sedî-sed ne wekî hevdu ne. Dorgir ji du perçeyan pêk tê, yek ji wan perçeyan tê pêşiya kok/rayekê ya din jî tê dawiya rayekê. Eger em rayeka peyvê wekî *kok* binivîsin, koka di nava dorgirê de wiha xuya dike wiha ye: *X-kok-Y*. Di hin zimanan de, peyva bi dorgirê çêdibe, peyveke nû ya darîştî ye, lê di hin zimanan de ev peyv tenê qertafên demê an jî yên neyîniyê digirin anku morfemên çemandinê ne. Bo nimûne zimanê *çîkasawî* ku zimanekî hindiyanî ye li Oklahomayê tê axaftin, di neyînikirinê de fonksiyona dorgirê nîşan dide:

| | | | |
|---|---|---|---|
| *chokma* | "ew baş e" | *ik-chokm-o* | "ew ne baş e" |
| *lakna* | "ew zer e" | *ik-lakn-o* | "ew ne zer e"[88] |

Çawa ku ji nimûneyê jî tê fêmkirin, dorgira *ik-…-o* ya zimanê *çîkasawî* ji du perçeyan pêk hatiye û koka peyvê ji herdu aliyan ve pêçaye. Dorgir qertafeke aloz e ku ji du perçeyan anku ji pêşgir û paşgirekê pêk tê, lêbelê temamkerên hevdu ne dema ku wateyekê li bitûniya peyvê zêde dikin. Wekî jorê jî hate behskirin, bi qertafeke bi vî karî ya ku bikaribe dora peyva kurdî bipêçe nîne.

### 2.4. Rayeksazî (*Coinage*)

Rayeksazî[89] (bi îngilîzî *coinage,* carinan jî, *root creation*) an jî *lêkdan*[90] pêvajoyeke kêmbelav û awarte ye.[91] Di vê rêbazê de lêkirina peyvekê derveyî adetan pêk tê. Çavkaniya van peyvan bi gelemperî navên tîcarî yên markeyan e.[92] Ew bi temamî afirandina termeke nû ye. Mînakên herî berbelav bo peyvên bi rêya rayeksazê hatine lêkirin ev in; *aspîrîn*, *google*, *naylon*ê. Mînakên vê taliyê yên ku zêde berbelav bûn *kleenex* û *xerox* e ku ew herdu wekî malên tîcarî yê fîrmayekî

---

[88] Ev ninmûne ji vê kitêbê hatine wergirtin: Dani Byrd & Toben H. Mintz, *Discovering Speech, Words, and Mind,* MA: Wiley-Blackwell, 2010, r.218.

[89] Peyva *rayeksaziyê* yekem car di vê xebatê de hatiye pêşniyazkirin bo peyva *root creation* û *coinage* a ingilîzî ku bi tirkî wekî *uydurma* an jî *kök yapımı* tê zanîn.

[90] Rehîmî di berhema xwe ya li ser peyvsaziyê de bo *coinage*ê peyva *lêkdan*ê pêşniyaz dike. Bnr. Rehîmî,*b.n.*, r.109.

[91] Laurel J. Brinton & Elizabeth Closs Traugott, *Lexicalization and Language Change*, Cambridge University Press, Cambridge, 2005, r.43-44.

[92] Yule, *b.n.*, r.53

dest pê kirine û bi pelepel li seranserê dinyayê bi vî navî belav bûn. Herwiha hin navên ku kurdên bakur ji tirkan wergirtine jî hene. Bo nimûne, *girgir*[93], *tursîl*[94], *mîntaq*[95] û wd. ne.

**(18)**

| | |
|---|---|
| google | xerox |
| kleenex | nylon |
| zipper | nutella |
| aspirin | escalator |
| girgir | mîntaq |

### 2.5. Qusandin (*Clipping*)

Qusandin, kurtkirin an jî kurtenav (*clipping)* kurtkirina formên dirêj yên peyvan e, bi gelemperî li dawiya peyvê tê werandin (*ad* ji *advertisement*) lêbelê carinan jî qusandin li destpêka peyvê (*plane*)[96] yan jî hem destpêk hem jî dawî bi hevre (flu)[97] tê qusandin [...].[98] Zimannasê kurd Muhammed li ser heman têgehê wiha dibêje "qusandin yan *kurtkirin* tê maneya avêtina yek yan çend dengan/herfan ji peyvekê. Qusandin dikare li destpêkê, navê yan dawiyê peyda bibe yan jî aloz be. Bo nimûne *Miho* ji *Mihemed* (kurtkirin li dawiyê), *Aqûb* ji *Yaqûb* (kurtkirin li destpêkê), *bên* ji *bêhn* (kurtkirin li navê) û *Mem* ji *Mihemed* (kurtkirina aloz)."[99] Qusandin pêvajoyeke ku pê bêje (xwerû an jî aloz) tên kurtkirin, lêbelê heman wateyê ji dest nadin û wekî endamê heman birra peyvê dimînin. Gelek caran, encama qusandinê asta guherîna teşeyî de ye.[100] Herçiqas Bauer dibêje peyva ku bi rêya qusandinê bi dest dikeve di heman wateyê de ye jî hin kes li dijî vê fikrê ne.[101]

---

93 Navê alaveke paqijkirinê ye ku pê toza rûyê xalîçeyan tê malîn.

94 Tursîl navê markayeke tîcarî (*trademark*) ye bi demê re ji ber ku di nav gel de pirr hatiye bikaranîn bûye navê gelemper ji bo deterjanê.

95 Mintaq jî li hin herêmên kurdên bakur di dewsa maddeya paqijiya firaqan de tê bikaranîn.

96 Peyva *airplane* di îngilîzî de wekî *plane* li destpêkê tê qusandin. Airplane bi kurmancî tê wateya *balafir*ê.

97 Forma qusandî ya *flu* yê bi werandina destpêk û dawiya peyva *influenza*yê (grîp) ve tê bidestxistin.

98 David Crystal, *A Dictionary of Linguistics and Phonetics,* Fifth edition, Blackwell Publishing Ltd., 2003, p.1-109.

99 Husein Muhammed, "Peyvsazî di Zimanê Kurdî de", *Kanîzar (kovara elektronîk)*, 2015, h.1, r.4.

100 Laurie Bauer, *English Word-Formation*, Cambridge, Cambridge University Press, 1983.

101 Zapata peyva *exam* (ezmûn) ya ku ji kurtkirina *examination*ê (ezmûn) hatiye bidestxisin wekî nimûne dide û dibêje 'dibe ku hin kurtkirin êdî nikaribin di heman pêwendê de bên bikaranîn'. Sermeselê, peyva *examê* zêdetir bo ezmûnên akademîk an jî testan tê bikaranîn lêbelê nikare ji bo

Wekî ku tê dîtin peyva nû ya ku bi rêya qusandinê hatiye pê carinan bi rêjeyî dikare wateyeke nû bide ser xwe û herwiha dikare pêwenda ku tê de tê qalkirin biguherîne. Herwiha eger em di nav civatekê de ji kesekî bi navê *Ehmed* re bêjin *Ehmo* wê demê têkilî û samîmiyeta me bi wî kesî re heye. Plag li ser heman babetê wiha dibêje:

> Ferqa wateyî ya di navbera *Ronald* û *Ron* de, *laboratory* û *lab*[102] de çi ye? Herçiqas ne zêde berçav be jî wisa xuya dike ku kurtenav, xêncî wateya bingehîn nêzikahiya axêver û heybera ku ew jê çêl dike, nîşan dide. Nîşana nêzikahiyê dibe ku diyarkirina wateyeke civakî be ku axêver pê şanî me dide ku ew aidê grûbeke melûm e. Bi kurt û kurmancî, qusandin dikare wateyekê bide ser milê xwe, lêbelê rewşa tabiî ya morfemê şaşiya wateyê îfade dike.[103]

Rêjeya peyvên qusandî di zimanê îngilîzî de ne zêde bilind e. Bi gelemperî zimanên pêşketî de hejmara peyvên bi vê rêbazê hatine çêkirin ji zimanên newerarkirî zêdetir e. Herwiha hemû peyv jî nayên qusandin. Ew peyvên ku tên kurtkirin anku qusandin bi gelemperî di ziman de zaf çalak tên xebitandin, ne ku peyvên neçalak in. Li ser vê babetê xebera Jamet e dema ku dibêje “peyveke dirêj û bi berdewamî tê bikaranîn zêdetir tê qusandin ji peyveke kurt û nadir (kêm tê bikaranîn).”[104] Zimanê kurdî ji ber gef û qedexeyan bo werar û bikaranînê negihiştiye wê astê ku peyvên bi vî rengî zêde biafirîne. Di hemû zimanan de meyla peyva heye ku kintir bibin, bo nimûne peyva *ciwanmêr* bi demê re bûye *camêr* û ciwanega[105] bi demê re bûye conega.[106]

## I. Pêş-qusandin (*fore-clipping*)

*site* (website)

---

ezmûn û testên tibî bê xebitandin. Bnr: Zapata Argenis A, Inglés IV (A-2007) Universidad de Los Andes, Facultad de Humanidades y Educacion, Escuela de Idiomas Modernos, 2007.

[102]*Ron* kurtebêja *Ronald* e ku navekî îngilîzî ye, *lab* jî kurtkirina *laboratory*ê ye ku di kurdî de jî wekî *laboratuar* li kar e.

[103] Ingo Plag, *Word-Formation in English*, Cambridge, CUP, 2003, r.28.

[104] Denis Jamet, “A Morphophonological Approach to Clipping in English: Can the Study of Clipping be Formalized”, *Lexis Special* 1, September 2009, r.24.

[105] Bo guherîna hejmara dengan di peyvên kurdî de ku di heman demê de bi qusandinê re jî têkildar e, binêre: nivîsa Husein Muhammed ya bi navê “Guherîna Hejmara Dengan di Peyvê de” :https://zimannas.wordpress.com/2015/07/09/guherina-hejmara-dengan-di-peyve-de/ (01/11/2015)

[106] Di hin devokan de, bo nimûne li serhedê zêdetir deng jê ketine û bûye *conga*/*cange*.

*copter* (helicopter)

*chute* (parchute)

*phone* (telephone)

*cello*(violincello)

*blog* (weblog)

**II. Paş-qusandin (*back clipping*)**

*gas* (gasoline)

*fan* (fanatic)

*disco* (discotheque)

*fax* (facsimile)

*pop* (popular music)

*photo* (photograph)

*prof* (professor)

**III. Nav-qusandin (*middle clipping*)**

*cuz* (because)

*flu* (influenza)

*jams* (pyjamas)

*script* (prescription)

**IV. Qusandina Aloz (*Complex Clipping*)**

*Mem* (Mihemed)

*Zelêx* (Zelîha)

*camêr* (ciwanmêr)

*sci-fi* (science fiction)

*midcult* (middlebrow culture)

*sitcom* (situation comedy)

*grandma* (grandmother)

Di kurdî de navên jin û mêran bi gelemperî tên kurtkirin. Carinan koka bernavê kurtkirî bi zorê tê texmînkirin. Divê bê bibîrxistin ku kurtkirina di kurdî de ne

xerabkirina navê kesekî ye, ne jî ji ber biçûkdîtina kesekî ye. Ev wekî qaîdeyeke zimanî ye ku bi gelemperî bi paşgira –o ji navên zilaman re bernav çêdike.

**(19)**

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ehmed | Aho/Ehmo | Tahir | Taho |
| Ekrem | Eko | Gozel | Gozê |
| Hesen | Heso | Dilovan | Dilo |
| Mihemed | Miho | Gogerçîn | Gogê |
| Yusif | Uso/Wiso/Ûsiv | Çîçek | Çîçê |
| Silêman | Silo | Zulexa | Zelêx |
| Yaqup | Aqo | Elîf | Elfê |
| Cafer | Cefo | | |
| Abdullah | Apo | | |
| Îbrahîm | Brahim / Îbo | | |

### 2.6. Guhastin (*Conversion*)

Guhastin neqilkirina peyvan ji birrekî peyvan (*word class, part of speech*) bo bikaranînê wek endamên birreke din ya peyvan e. Peyv wek xwe dimîne lê bergeha bikaranîna wê tê berfirehkirin yan jî guherandin.[107] Têgeha birra peyvê (*word class*) ji bo cureyên peyvan ên wekî 'navdêr', 'lêker' 'rengdêr' tê bikaranîn. Dema ku birra peyvê diguhere ku ev yeka bêyî guherîna teşeyî pêk tê, hingê eger peyv rengdêr be dibe navdêr, an jî eger rengdêr be dibe lêker û wd. Rast e dema ku ev guherîna ji cureyekê ber bi cureyeke din pêk tê, rol û rista peyvê di nav hevokê de diguherîne. Ji ber ku guherîna form û binyadî di peyvê de çênabe di vê pêvajoyê de darîştin nîne (*zero derivation*). Muhammed li ser heman babetê dibêje "Di kurdî de, biguhastinê her lêkera bi forma ferhengî (*rader, infinitîv*) dikare bibe navdêr. Gelek navdêr dikarin bibin rengdêr. Rengdêr bi berfirehî dibin hoker lê gelek rengdêr dibin navdêr jî."[108]

[107] Husein Muhammed, *g.n.*, 14.

[108] Muhammed, *h.g.*, 17.

Sermeselê peyva *pêşî* ya ku em zêdetir wekî hoker dizanin wekî '*Jinikê pêşî pariyê devê xwe daqurtand', paşê ser de av vexwar*. Lêbelê heman peyv dema ku kategorî/birra xwe guhert, hindê dibe navdêr wekî "*pêşiyên me gotine 'ez wî seriyê erdê kim ku deh serî jê nabiece'*." Di hevoka duyem de peyva pêşî di wateya "bavûkal" de ye. An jî peyva *kirin*ê ya ku bi eslê xwe lêker e, bi guhastinê dibe navdêr wekî'vê *kira* te em ecêbmayî hiştin'.

### 2.7. Têkilkirin (*Blending*)

Di têkilkirinê de, du peyvên cihê yên ku li pêşî û paşiyê ve hin qertaf xistine bi hev ve dibestin û peyveke nû ya ku wateya herdu peyvan di nav xwe de kom dike, tînin pê. Yule dibêje ku di têkilkirinê de bi gelemperî destpêka peyvekê jê tê hildan û bi dawiya peyveke din ve tê girêdan.[109] Mirov dikare peyva îngilîzî *Spanglish*[110] (bi têkilkirina *spanyolî* û *îngilîzî*) wekî nimûne bide. Vê axiriyê, kurmanciya ku zêde di bin bandora tirkî de maye wekî *tirkmancî* (bi têkilkirina *tirkî* û *kurmancî*) tê binavkirin. Herwiha peyveke din ya ku qasî tirkmancî têrbelav e *sormancî* (bi têkilkirina *soranî* û *kurmancî*) ye ku ji zimanê wan kesan re tê gotin ku kurmancî û soranî li nav hev dixin. Dema ku kesek nîv-kurmanc û nîv-soran be, jê re *sormanc* tê gotin. Dîsa peyveke bi vî rengî ya ne zêde berbelav jî *erebmancî* (bi têkilkirina *erebî* û *kurmancî*) û *farsmancî* (bi têkilkirina *farisî* û *kurmancî*) ye vê axiriyê kete nav kurdî. Herçiqas zêde kêm bên xebitandin jî peyvên wekî *tirkzakî* (bi têkilkirina *tirkî* û *zazakî*) jî pêde pêde dikevin nav kurdî. Navê kitaba Şivan Zeren a bi navê *Kurdistanbul* bi vî karî hatiye çêkirin.

Herçend di kurmancî de têkilkirin zêde li kar nebe û peyên ku pê hatine dariştinê kêm bin jî, ev rêbaza dibe ku di dahatûyê de bibe rêyeke sazkirina termên nû. Ji bo zimanên ku êdî li dinyayê serdest in, *têkilkirin* wekî rêbazeke viraştina peyvan, her diçe belav dibe. Bo nimûne, di zimanê îngilîzî de hin peyvên ku bi rêya vê rêbazê hatine pê li gorî kurdî zaf temendirêj in. Di zimanê îngilîzî de, piştî sedsala bîstan peyvên bi vî rengî her çûne zêde bûne, vêga jî ev pêvajo bi alavên teknolojîk û çapemeniyê ve didome. Bi gotina Lehrer berê ev rêbaz wekî rêbazeke marjînal

---

[109] George Yule, *The Study of Language*. New York: Cambridge University Press, 2006, r.55-56.

[110] Di vir de peyva *Spanish* û ya *English* têkilî hev bûne û jê *Spanglish* derketiye.*Spanglish* tê wateya îngilîziya ku zêde di bin bandora spanyolî de maye, bi gelemperî ji aliyê spanyolên ku li DYAyê dijîn ve tê xeberdan.

dihate fikirîn, lêbelê di çend dehsalên dawî de her çû belav bû û marjînalbûna xwe winda kir û zêdetir zimannasan bala xwe da taybetmendiyên *têkilkirinê*.[111]

- **a.** *brunch*[112]**<***breakfast* + *lunch*(Di sala 1886an de hatiye dariştin)
- **b.** *slanguage* **<** *slang* + *language* (Di sala 1879an de hatiye dariştin)
- **c.** *solilioquacity* **<** *soliloquy* + *locuacity* (Di sala 1895an de hatiye dariştin)
- **d.** *motel***<***motor* + *hotel* (Di sala 1925an de hatiye dariştin)
- **e.** *transceiver* **<** *transmitter* + *receiver* (Di sala 1934an de hatiye dariştin)[113]

Tê dîtin ku kurmancî herî zêde peyvên di derbarê zimanan de bi vê rêyê dariştine, heçko di kurmancî de ev rêbaz wekî têkilkirina navên du zimanan hatiye fêmkirin. Wekî rêbazeke navneteweyî, têkilkirin kêm zêde di hemû zimanên cihanê de peyda dibe û ne tenê ji bo têkilkirina navên zimanan, herwiha bo têkilkirina navên cuda yên heyberan jî tê xebitandin ku mînakên navbirî de berçav in. Di zimanê tirkî de, *têkilkirin* piştî damezirandina Komara Tirkiyeyê belav bûye û hê jî bi saya vê rêbazê bi dehan peyvên nû tên viraştin. Bo zelalkirina mijarê çend peyvên tirkî yên *têkilkirî* li jêrê berdest in;

**(20)**

| | |
|---|---|
| yaysat <yayın x satış | belgeç < belge x geçer |
| arge <araştırma x geliştirme | albay <alay x bay |
| örtbas<örtüp x basmak | yarbay <yardım(cı) x bay |
| çekyat<çekip x yatmak | belgit (belirlemek x gitmek) |
| kapkaç<kaptı x kaçtı | tuğgeneral <tuğ x general |
| gerzek<geri x zekalı | tümgeneral <tümen x general |

111 Lehrer, Adrienne “Blendalicious”. Munat, J. (ed.) *Lexical creativity, texts and contexts.* John Benjamins, Amsterdam, 2007, r. 116.

112 *Breakfast* (taşt) û *lunch* (firavîn) li nav hev ketine û jê *brunch* derketiye ku tê wateya xwarina piştî taştê, lê berî firavînê tê xwarin ya ku tê de hem xurekên taştê hem jî xurekên firavînê hene.

113 Ev nimûneyên ku ji ferhengên cuda hatine berhevkirin, ji vê çavkaniyê hatine wergirtin: Lehrer, Adrienne “Blendalicious”. Munat, J. (ed.) *Lexical creativity, texts and contexts.* John Benjamins, Amsterdam, 2007, r. 116.

| | |
|---|---|
| yapboz<yapıp x bozmak | orgeneral <ordu x general |
| gelgit<gelip x gitmek | ordonat <ordu x donatım |
| bilsat<bilip x satmak | akbil <akıllı x bilet |
| kısbir <kısaltma x birleştirme | kesbir <kesip x birleştirme |
| seçal< seçmek x almak | sürgit < sürüp x gitmek[114] |

Bêjeyên ku bi rêya *têkilkirin*ê çêdibin, ne bêjeyên jixweber in ku bêyî midaxeleya merivan bên pê, berovajî vê yekê bêjeyên bi vî rengî bi teşebisên şexsan ve saz dibin û eger li gorî axêverên zimên peyva têkilkirî lihevhatî be, wê demê di zimên de diedile. Lehrer derbarê têkilkirin û nûpeyvên (*neologism*) din de pirseke balkêş li xwe dike û dibêje çima ew her diçin popûler dibin. Berdewamiya pirsa xwe de dibêje ew (peyvên têkilkirî) fêmbariyê zehmettir dikin çunku guhdar û xwîner lazim e ku serwextê wateya wan bin, wekî ku ew bi gelemperî neravekirî û neşîrovekirî ne. Lehrer dibêje ji ber ku peyvên têkilkirî komîk û şîrîn in, popûleriya wan zêde ye.[115] Bi rastî jî peyvên têkilkirî, bo nimûne, *sormancî* û *tirkmancî*, ji ber ku ne bi pêşgir ne jî bi paşgiran ve anku ne bi rêyên adetî yên nas ve hatine sazkirin, ji layê teşeyî ve bala meriv dikişîne ser xwe û bivê-nevê mirov li peyvê dihizire. Çunku peyv balkêş e û mereqdariyekê di mirov de hasil dike. Ev jî dihêle ku peyvên bi vî rengî wekî navên marqeyan bên şixulandin, armanc ji van navan ew e ku bala mirovan bikişînin ser xwe. Bo nimûne, tenê li bajarekî wekî Çewlîgê (bi tirkî *Bingöl*) bi dehan navên fîrmeyan bi têkilkirina *bin-* û beşên peyvên din pêk tê ku ev yeka şanî me dide bê ka *têkilkirin* gihiştiye çi radeyê:

**(21)**

Bin-sür < Bingöl x Sürücü (Kursu)

Bin-kap < Bingöl x Kaplıcaları

Bin-yak < Bingöl x Yakıt

[114] Mustafa Şenel, "Kes-kopyala-yapıştır; Yeni Kelime Türet", *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı Belleten,* (2009/1), r.99-109.

[115] Adrienne Lehrer , *h.b.*, r. 115.

Pro-bin < Proje x Bingöl

Kal-bin < Kalp x Bingöl

Wekî li jorê jî gotin hate ser, têkilkirin, ne bi werara tabiî ya ziman de jixweber pêk tê, lêbelê desttêwerdana merivan vebi zanebûn tên çêkirin. Ev yeka bi xwe re hin nîqaşên li ser têkilkirinê jî tîne. Gries dema hewl dide ku têkilkirinê pênase bike balê dikişîne ser bihemdîbûna wê. Ew dibêje "têkilkirin, bi zanebûn pêkanîna peyveke nû ye ku bi jêxistina hin perçeyên herî kêm du peyvên çavkanî yên cuda ve çêdibe."[116]

**(22)**

tirkmancî <tirkî x kurmancî

ewrasya <ewropa x asya

sormancî <soranî x kurmancî

zazamancî <zazakî x kurmancî

telecast <television x broadcast

popocrat <populist x democrat

sneakret <sneak x secret

foolosopher <fool x philosopher

alcoholiday <alcohol x holiday

Bollywood <Bombay x Hollywood

Peyvên têkilkirî herçiqas hatibin kurtkirin jî wekî bêjeyan tên bilêvkirin. Aydogan kitêba xwe ya bi navê *Rêbera Rastnivîsînê* de dema qala têkilkirinê dike di bin sernavê "Cureyekê din, kurtkirinên ku wekî bêjeyan dihên bilêvkirin" de dibêje ku "cureyekê kurtkirinên wekî bêjeyan dihên bilêvkirin jî heye ku ji herfên destpêkê bi tenê pêk nayê, ji her bêjeyekê beşekê destpêkê werdigire û bi vî awayî pêk dihê."[117] Herwiha Aydogan li ser mijara rastnivîsandina têkilkirinê de wiha pê de diçe:

[116] Stefan Th. Gries, (2004). "Isn't that fantabulous? How similarity motivates intentional morphological blends in English" in M. Achard & S. Kemmer (eds.), *Language, Culture, and Mind*, 415-428. Stanford: CSLI Publications.

[117] Mistefa Aydogan, *Rêbera Rastnîsînê*, weş. Rûpel, Stenbol, 2012, r. 145

“Kurtkirinên ku di vê kategorîyê de ne, heger nimînendeyên serenavan bin, herfa wan ya destpêkê bi girdekê dihê nivîsîn û heger ew ne nimînendeyên tu serenavan bin, herfa wan ya destpêkê bi hûrdekê dihê nivîsîn.”[118] Li gorî zimanê îngilîzî û tirkî têkilkirin di kurmancî de çalak û li kar nîne, dibe ku bi geşbûna zimên ve ev rêbaza çêkirina peyvê jî di kurmancî de belav bibe. Çunku dawiya dawî werar û bikaranîna zimanan a zêde û berbelavî û tesîra wan dihêle ku ziman dewlemend bibin û xwe bigihînin asta hevrêyên xwe yên ku ew ji ber hin sebeban jê mane. Di kurmancî de, peyvên ku bi rêya têkilkirinê hatine çêkirin, ne zêde ne. Hin peyvên beyanî yên ku di zimanên din de bi têkilkirinê hatine çêkirin di kurmancî de jî tên bikaranîn.

### 2.8. Kesnavî (*Eponym*)

Kesnavî[119] (*eponym*) ew peyv in ku ji serenavan (*proper names*) hatine darîştin.[120] Wekî ku li pênaseyên rajor jî tê famkirin, kesnavî ji navên kes, cih, karakterên rasteqîn an jî xeyalî tên darîştin û bi nav an jî paşnavê kesekî ve jî li dinyayê belav dibin. Yule derbarê vê babetê de dibêje kesnav (*eponyms*) peyvên nû ne ku xwe dispêrin navên kesekî an jî cihekî.[121] Bo nimûne peyva *boykott*ê ji paşnavê serperiştê milkiyetê yê îrlandî Charles Cunningham Boycott, peyva sandwichê ji paşnavê arîstokratê îngilîz *John Montagu, 4mîn Kontê Sandwichê* maye. Herwiha peyva paparazî (*paparazzi*)[122] ya ku tê wateya wênegirê ku li pey kesên navdar dikeve da ku bûyereke skandal û sosret peyda bike û bi rêya çapemeniyê belav bike, ji navê karakterekî fîlma Federico Fellini ya bi navê La Dolce Vita (Jiyana Bextewer) hatiye ku di fîlmê de kesê bi navê Paparazzo wênegireke ku li dû navdarên fîlmên amerîkî dikeve da ku wêneyên wan bigire.

---

[118] Aydogan, *h.b.,* r.145

[119] Me di vê xebatê de bi giştî hewl da ku termînolojiyeke hevpar ava bibe û loma jî me pirraniya navên di warê peyvsaziyê de ji xebata Husein Muhammed wergirt da ku di vî warî de pêşî li şaştêgihiştinan venebe. Lêbelê li ser çend têgehan de tercîha me hinekî guherî, yek ji wan jî *kesnavî* ye ku Muhammed di rêzegotarên xwe yên li ser vê babetê de wekî *saznavî* bi kar aniye. Divê mirov bîne ziman ku di wê pêwendê de ya ku mamoste mijar nirxandiye û mînak daye saznavî jî navekî qebûlbar e ku mînaka wî jî peyva *aspîrîn* e. Lêbelê di vê xebatê de, me xwest ev mijar (*eponym*) di bin *kesnavi*yê de bête nirxandin. Hin kesên ku herduyan (kesnavî û saznavî) di bin sernavekî de dinirxînin jî hene. Ya rast di vê babetê de lihevkirineke giştî nîne. Bnr. Bo xebata navborî: Husein Muhammed, “Peyvsazî di Zimanê Kurdî de”, *Kanîzar*, 2015, h.1.

[120] Victoria Fromkin û yên din, *hb.*, r. 502.

[121] George Yule, *b.n.*, r.54.

[122] Ya rastî, paparazzi forma pirjimar ya peyva *paparazzo* ye ku bi zimanê îtalî bo jina *paparazza*, bo zilaman jî *paparazzo* li dar e.

Kesnavan roleke zimannasiyê ya zaf muhim lîstiye di warê têgehên teknîkî û zanistî de. Ew taybetiyeke girîng ya zimên eku demeke dûvdirêj navên wan vekolerên ku jiyana xwe bi keşfên ilmî re terxan kiriye, bi vê rêyê di dîrokê de hatine neqişkirin.[123]

**(23)**

sandwich [Kontê 4em yê Sandwichî (1718-1792)]

jeans (Bajarê Îtalî, Cenevre)

volt (Îtalî, Alessandro Volta)

watt (Skoçî, James Watt)

fahrenheit (Elman, Gabriel Fahrenheit)

boycott – Charles C. Boycott

jacuzzi – Candido Jacuzzi

narcissistic – Narcissus

nicotine – Jean Nicot

pasteurization – Louis Pasteur

poinsettia – Noel Roberts Poinsett

sadistic – Marquis de Sade

salmonella – Daniel Elmer Salmon

volcano – Vulcan

masochism–Leopold von Sacher-Masoch

## 2.9. Sernavî (*Acronym*)

Sernavî an jî bi pêşnîyaza me *herfepeyv* ew cûre peyv in ku herfek an jî çend herfên berîn ên çend peyvan ji wan tên hildan, bi serherfan ve kurteya navê wî tiştî an jî sazûmanî tê bidestxistin û bi gelemperî wekî peyvekê tên bilêvkirin. Wekî nimûne peyva PINê bi serherfên peyên îngilîzî *Personal Identification Number* ve hatiye bidestxistin. Herwiha, bo nimûne peyva *radar*ê ku herfepeyveke beyanî ye, ji

[123] Jorge Eduardo Duque-Parra, J. Oscar Llano-Idárraga, Carlos Alberto Duque-Parra, "Reflections on Eponyms in Neuroscience Terminology", *The Anatomical Record*, vol. 289B, n.6, 2006, pp.219-224.

hildana seherfên ***ra**dio **d**etecting **a**nd **r**anging* ve pêk hatiye. Peyvên ku ji tîpekî an jî çend tîpên berîn yên peyvekî an jî du peyvan ve tên çêkirin, wekî acronym tê zanîn.[124]

**(24)**

*Radar* (*radio detecting and ranging*)

*scuba* (self-contained underwater breathing apparatus)

PIN *(Personal Identification Number)*

ATM *(automatic teller machine)*

OPEC *(Organization of Petroleum Exporting Countries).*

NASA – (*National Aeronautics and Space Administration*)

PAK- *(Partiya Azadiya Kurdistanê*)

AKUT (*Arama Kurtarma Teşkilatı*)

HIV - (*Human Immunodeficiency Virus*)

Ji nebûna dewleteke kurdî ku bi xwe re nebûna damûdezgehên kurdî jî tîne yek ji wan sebebên kêmbûna herfenavan in. Civakên ku zêdetir bi teknolojiyê re rûbirû mane, di vî warî de bi pêş ketine. Anku pêşketina sîyasî, aborî û sazûmanî bi awayekî tê bi pêşketina zimanî diqelibe. Lewre ziman bi hemû hêlên jiyana mirov re di nav têkiliyeke bivê-nevê de ye, dema ku beşeke jiyanê bi pêş dikeve û ew war dibe warê lêkolînên zanistî, hingê termînolojî û herfenavên pêwîst jî tên emilandin.

### 2.10. Wergirtin/Deynkirin (*Borrowing*)

Ji bo dahênana peyvan çavkaniyeke daîmî ya din jî ew pêvajo ye ku em jê re dibêjin *wergirtin* an jî deynkirin,anku rahiştina peyvan ji zimanên din. Di wergirtinê de ku pêvajoyeke demdirêj û çalak e, peyvek ji zimanekî derbasî zimanekî din dibe. Dema ku peyvek ji aliyê zimanekî ve tê deynkirin/wergirtin, ev peyv anegorî dengnasiya zimanê wergir, pêrgî guherînên binyadî, denganiyê (*phonetic*) tê. Deynkirin ji encama pêwendiyên çandî dertê ku di navbera du civakên zimên de rû dide. Bi gelemperî di rewşên deynkirinê de zimanê çavkanî (*deyndêr*) xwedî hêz,

[124] Baugh, A. & T. Cable, *A History of the English Language*, (1990): London, New York: Routledge.

prestîj û dewlemendiyê ye ku tişt û fikrên ku ev ziman bi xwe re tîne li ber çavê civaka zimên ya ku deyn dike, maqûl û kêrhatî ye.[125] Sermeselê, eşîrên almanan di çend sedsalên berîn yên P.Z. de bi têkiliya bazirganî ya digel romayiyan ve ji latînî birrek peyv deyn kirin. Bi heman awayî piştî ku kurd bûne misilman, bi sedan peyvên erebî bi rêya têgehên dînî ketine nav zimanê kurdî.

Di maweya xwe ya dîrokî de zimanê kurdî jî wekî hemû zimanên dinyayê ji zimanên cînar li gorî hewcedariya axêverên xwe birrek peyv deyn kirine. Hejmarek ji van peyvên deynkirî ji malbata zimanên ku kurdî jî tê de endameke hatiye hildan ku ev cure denykirin di heman demê de hevpariyeke asayî jî nîşan dide. Anku hevparî û deynkirinên ji zimanên farisî an jî ji zimanekî îranî ji ber nêzikahiya van herdu zimanan ya ligel hevdu rêyeke nêrîtî ye. Mirov bi rihetî dikare bibêje ku peyvên ku ji zimanê farisî û erebî hatine wergirtin di kurdî de zêde ne.[126]

| | |
|---|---|
| **Farisî** | amade, nivişt, peyman, peyam… |
| **Erebî** | alfabe, ceza, sabir, îslam, tîcaret, meaş, mihkem, hakem, nobet, mela, dua… |
| **Portekîzî** | marmelad, kobra, zebra… |
| **Almanî** | hînterland, panzer, vampîr, hamburger… |
| **Îtalî** | faşîzm, makarna, volta, brokolî, pasta, pîzza, valîz, bank, lîra… |
| **Çekî** | robot, pîstol… |
| **Spanyolî** | bravo, kanyon, vanilla, chocolate, cunta, patates… |

[125] Suzanne Kemmer, Major Periods of Borrowing in Middle English, ketina malperê http://www.ruf.rice.edu/~kemmer/Words/loanwords.html (08/09/2014)

[126]Ji bo wergirtinên ewropî, farisî û erebî, mirov dikare serî li vê tezê bide: Jafar Hasanpoor, *Study of European, Persian, and Arabic Loans in Standard Sorani,* Unpublished Doctoral Dissertation, Uppsala University, 1999.

| | |
|---|---|
| **Fransî** | qablo, alarm, qolye, qonser, otel, sîvîl, vapur… |
| **Ermenî** | tixa, axpîn, kêlendî, anix, boç, axçîk, kulîn, savar, xaç, maran, naxir… |

**Tablo 14:**Ji çend zimanên beyanî peyvên wergirtî/deynkirî

### 2.11. Wergerandina Yekser (*Calque / Loan Translation*)

Wergerandina yekser (*calque, loan translation*) an jî wergerandinên qerzkirî[127] wergerandina peyv-bi-peyv ya peyv û biwêjan (*phrase*) a ji zimanekî din e. Ev rêbaz wekî ku ji navê wê jî tê fêmkirin awayekî wergerandinê ye. Di vê pêvajoyê de, wergerandineke yekser ya elementên peyvekê bo zimanê wergir heye.[128] Muhammed derbarê wergerandina yekser de dibêje ew "çêkirina peyvan li gor hevwateyên wan yên bi zimanekî din e".[129] Peyva ku carinan awayê dariştina wê di kurdî de tê rexnekirin, *pêvajo*, ji bo wergerandina yekser nimûneyeke baş e. Ev peyv êdî torên medyayî de zêde berbelav e, ji peyva *süreç* a tirkî bi awayekî yekser hatiye wergerandin. Bo nimûne peyva *şûntil/î* ji peyva tirkî *parmak izi* ew jî ji peyva îngilîzî ya *fingerprint*ê hatiye wergirtin. Mirov dikare nimûneyên *dehsal* û *malper* jî bide. *Dehsal* bergendê peyva îngilîzî *decade* de tê bikaranîn û *malper* jî ji peyva îngilîzî *homepage* hatiye wergerandin.

Herwiha di pêvajoya guhertina navên gund û navçeyên Kurdistanê de, li Tirkiyeyê navên hin gund û bajarên kurdan bi wergerandina yekser ve navê xwe yê tirkî hildane. Bo nimûne navçeya Agiriyê/Qerekilîsê ya bi navê *Avekevir* di vê pêvajoyê de wekî *Taşliçay*[130] hatiye guhertin. Herwiha bi dehan navên gundan jî bi vî rengî hatine guhertin. Dîsa li ser heman babetê, dema ku tirkan envanterên gulûgiyayên li Kurdistanê derxistine, carinan navê kulîlkan jî bi vî rengî wergerandine zimanê xwe. Bo nimûne, kulîlka bi navê pêçiyê bûkê ya ku kurdan ji ber rengê sor ên li ser şibandine pêçiyên bûkê yên hinekirî, wekî *gelinparmağı* derbasî tirkî bûye.

---

[127] Ergin Öpengin, *Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkiyeyê*, weş. Avesta, Stenbol, 2011, r.211.

[128] George Yule, *b.n.*, r.55.

[129] Husein Muhammed, *g.n.*, 16.

[130] Taşlı bi kurdî tê wateya "bi kevir", çay jî tê wateya "çem".

Wergerandina yekser hema-hema di hemû zimanên dinyayê de peyda dibe. Bi taybetî zimanê tirkî bi dehan peyv bi vî rengî li ferhenga xwe zêde kiriye. Çend nimûne ji zimanê tirkî:

**(25)**

| | |
|---|---|
| Hailstorm | *dolu fırtınası* |
| Honey moon | *balayı* |
| Airport | *havalimanı* |
| Railway | *demiryolu* |

### 2.12. Wergirtina Wateyê (*Semantic Loan*)

Wergirtina wateyê (*semantic loan*) tê maneya berfirehkirina (yan guherandina) maneya peyvên xwemalî li ber modela zimanên din.[131] Di vê rêbazê de wateya peyva zimanekî din tê deynkirin, lêbelê ev peyv di zimanê wergir de berdest e. Guherîn û berfirehbûneke wateyî di peyvê de çêdibe û ev peyv dikare hin pêwendên din de bête bikaranîn. Çend nimûneyên ku zimannas Muhammed dide li xwarê ne.

> Di kurmancî de lê gerîn tê maneya hatin û çûn û nêrîn bi armanca peydakirina tiştekî, bi inglîzî to search, to look for, bi tirkî aramak. Lê di tirkî de aramak herwiha maneya bi telefonê axivîn jî dide. Di inglîzî de ev herdu peyv maneya axivîna bi telefonê nadin. Di nav kurdên ne ji Bakurê Kurdistanê de, mirov bi mexseda axivîna bi telefonê, bi gotina lê gerîn bi kar naîne. Adeten mirov dibêje telefon kirin, bi soranî jî telefon kirdin, bi farisî têlêfûn kerden. Lê kurdên Bakurê Kurdistanê adeten li gor modela tirkî bi vê maneyê dibêjin lê gerîn. Ev nimûneyeke ji wergirtina wateyê ye. [132]

### 2.13. Paşvesazî (*Backformation*)

Paşvesazî[133] (*backformation*) çêkirina peyveke nû bi kurtkirina peyveke heyî ye.[134] Di vê pêvajoyê de peyv qertafê nagire, berovajî vê çend herfên xwe ji dest

---

[131] Husein Muhammed, *g.n.*, 16.

[132] Husein Muhammed, *g.n.*, r. 16.

[133] Bo bikaranîna vê têgehê bnr. Kamran Rehîmî, *Binemakanî Wişesazî û Wişeronan le Zimanî Kurdî da*, Korî Zanistî Zimanî Kurdî-Êran, weş. Gutar, Seqiz, 1387,r. 107; Husein Muhammed, “Peyvsazî di Zimanê Kurdî de”, *Kanîzar*, 2015, j.1, r.16.

dide û peyvekê pêk tîne ku ji kurtkirina peyveke din hatine pê. Muhammed peyva *nivîs* û *ajo*yê ji bo vê rêbazê wekî nimûne dide.[135] Wekî ku tê pêşbînîkirin peyva *nivîs* ji *nivîsîn*, peyva *ajo* jî ji *ajotin*ê hatiye bidestxistin. Meriv dikare peyva *hilbijar* ya ku ji *hilbijartin*ê hatiye pê û peyva *civak* ya ku ji peyva *civakî* paş ve saz bûye wekî nimûne bide. Herwiha, peyva *çand* ya ku ji *çandin*ê hatiye, dibe ku bo vê rêbazê bibe nimûneyeke din. Ji bilî van nimûneyan, Rehîmî di pirtûka xwe ya bi soranî de peyva *pirxandin*ê dide ku jê *pirxe* paşve saz bûye û peyva esil-erebî *xuliqandin*ê dide ku jê peyva *xulq*[136] hatiye bidestxistin.[137] Wekî ku ji mînakan jî tê beşerkirin, ev rêbaz di kurdî de ne têrbelav e lêbelê îngilîzî nîspet bi kurdî ji vê rêbazê zêdetir sûd wergirtiye. Bo nimûne:

**(26)**

| | |
|---|---|
| edit | editor |
| televise | television |
| peddle | peddler |
| swindle | swindler |
| laze | lazy |
| hawk | hawker |
| burgle | burglar |
| pea | pease |
| diplomat | diplomatic |

### 2.14. Pêkanîn / Hevedudanîn (*Compounding*)

Hevedûdanîn, *pêkanîn* an jî *lêkdan*[138] yek ji wan rêya herî berhemdar ya pêvajoya afirandina peyvan e. Di vê pêvajoyê de, mirov peyvan tîne bal hevdu û peyveke nû ya ku ne du peyvan lêbelê tenê peyvekî nîşan dide, pêk tîneku ew nûpeyv "wekî peyvekî tê vepîtandin."[139] Anku ev pêkhateya nû êdî ji hêla wateyê ve rasterast têkiliyekê bi herdu parçeyên xwe yên berîn re nîne lê wateyeke yekgirtî ya

---

[134] Muhammed, *g.n.*, r. 16.

[135] Muhammed, *h.g.*, r.15.

[136] Ev peyva خولق (xulq) di kurmancî de bi berfirehî li kar e û tê wateya *karakter, taybetmendî, xûy, xeyset* û *tebîetê.* Bo nimûne; *Xulqê wî qet xweşiya min neçû.*

[137]Rehîmî, *b.n.*, r.32.

[138] Rehîmî, *b.n.*, r.109.

[139] Kamil Wisniewski, "Word Formation", http://www.tlumaczeniaangielski.info/linguistics/word-formation.htm ketina malperê 08.09.2014

nû li xwe bar dike. Hinek ji wan dikelijin û bi hev re tên nivîsîn. Di kurmancî de peyvên hevedudanî û rêbazên çêkirina wan gellek in.[140]

Hamawandi di xebata xwe ya li ser peyvsaziya kurdî û îngilîzî de herdu zimanan dide ber hev û analîzeke giştî û bikêr berpêş dike.[141] Bi heman rengî, Sharifi û Karimipour jî di xebateke berawirdî de ku kurdiya îlamî û îngilîzî ji aliyên peyvsaziyê ve dinirxîne bi wê encamê dest dixe ku kurdî bi qasî îngilîzî nebe jî ji hevedudanînê sûdeke mezin werdigire û ev jî berhemdariya peyvsaziya kurdî (û diyalektên wê) bilind dike.[142] Wekî ji xebatên ilmî yên li ser peyvên hevedudanî tê dîtin ku kurdî berhemdariyeke berketî di pêkanîn/hevedudanînê de bi dest dixe.

---

140 Baran, Bahoz, *Rêzimana Kurmancî,* weş. Belkî, Stenbol, 2012, r. 52.

141 Azad Hanawandy, "Derivational Morphemes in English with reference to Dialects in Kurdish", *Kirkuk University Journal-Humanity Studies*, vol. 7 (3), 2012, r. 1-19.

142 Shahla Sharifi & Amir Karimipour, "A comparative study of word formation processes of Ilami, Kurdish and English, *Open Journal of Education*, 1 (3), 2013, r. 83-90.

# LÎSTEYA HIN PAŞGIRÊN KURMANCÎ

Ev lîsteya paşgiran, beşeke biçûk a paşgirên kurmancî dide ber xwe û wan li gorî wateyên wan tesnîf dike. Wekî ku tê zanîn paşgirên kurmancî, pirr-fonksiyonî ne û hin ji wan digel erka navdêrsaziyê li gorî rewşê dikarin bibin rengdêrsaz û hokersaz jî. Hejmara paşgirên kurmancî ji dusedî zêdetir e. Ev hejmar bi rastî jî hejmareke zêde ye. Lêbelê, xebatên tekûz kêm in yên ku bi berfirehî qertafên peyvsaz ên kurdî yên berdest berhev kirine û rol û fonksiyona wan diyar kirine. Di vî warî de mirov dikare bibêje ku xebata herî berfireh û tekûz bi rêzegotarên xwe ve Reşo Zîlan kiriye û di kovara Kurmancî de weşandiye.[143] Herwiha çend nivîskarên din jî hene li gorî xwe lîsteyên paşgiran amade kirine.

Di derheqê paşgirên kurmancî de jî nîqaş û gengeşî hene. Çunku li gorî nivîskaran paşgirbûna hin qertafan diguhere. Hin zimannasên kurd, bo nimûne, paşgirên ku bi *rayeka lêkeran* ve hatine bidestxistin wekî qertafên peyvsaz nabînin û lewma jî wan di bin vî sernavî de nasinifînin. Digel vê yekê hin zimannas jî hemû rayekên lêkeran yên ku peyvên nû saz dikin wekî paşgirên peyvsaz dibînin û lîsteyên xwe de cih didin wan. Bo nimûne, Baran di pirtûka xwe de behsa van paşgiran dike û wan naxe beşa paşgirên kurmancî. Li gorî wî ew *rayeka lêkerê* ne û nabe ku wekî paşgir bêne hesibandin. Baran wiha berdewam dike: "Gellek kes van rayekan wek qertaf bi nav dikin. Lê dema em bala xwe didin van rayekan, em dibînin ku ev rayek hem tên ser peyvan û peyvên nû yên hevdudanî çêdikin hem jî qertafan digirin û ji wan gellek peyvên nû tên çêkirin, ji ber vê yekê nabe ku em wan wek qertaf bi nav bikin".[144] Berovajî vê yekê, Zîlan, Tîgrîs, Bedirxan di lîsteyên xwe de cih didin qertafên ku ji rayeka lêkeran pêk hatine. Wekî ku ji vê zanyariyê jî tê famkirin navbera rêzimannasên kurdî de nêrîneke hevbeş nîne.

Li jêrê me beşeke paşgirên kurmancî li gorî rêbazekê tesnîf kirin. Di vê tabloyê de nivîskarê ku behsa paşgirê kiriye li hêla rastê navê wî hatiye nivîsandin. Herwiha wateya ku paşgir dide peyvê di nav tabloyê de hatiye ravekirin digel cureya peyvên ku bi wê qertafê tên sazkirin. Berê pêşîn divê neyê jibîrkirin ku ev tablo tenê pêşnûmayek e û ne di vê angaştê de ye ku hemû paşgirên kurmancî dihewîne.

Hersê çavkaniyên ku di tabloya jêrê de hatine rêzkirin ev in:

---

[143] Reşo Zîlan, "Paşgirên Kurdî I-II-III", *Kurmancî,Rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayên kurmancî,* weş.Avesta, Stenbol, 2010, r. 409-412; 421-424; 445-447.

[144]Bahoz Baran, *b.n,* r. 309.

- Celadet Bedirxan û Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2009.
- Reşo Zîlan, “Paşgirên Kurdî I-II-III”, *Kurmancî,Rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayên kurmancî,* weş. Avesta, Stenbol, 2010, r. 409-412; 421-424; 445-447.
- Tîgrîs, Amed, *Pêşkît û Parkît*, weş. Medya, Stockholm, 2001


| **Teşeyê Pêşgirê û formên wê yên cuda** | **Peywir û wateya ku dide peyvê** | **Lêkersaz: L Hokersaz: H Navdêrsaz:N Rengdêrsaz:R** | **Çavkaniyên ku ev paşgir tê de derbas bûne** |
|---|---|---|---|
| **-a** | Ev pêşgir tê li ser rayekên lêkeran yên dema niha/borî û navdêran, jê rengdêran çêdike. Paşgira –a rewşa xwedîtiyê nîşan dide û dema ku tê li ser rayekê hingê wateya lêkerê di wî kesî/tiştî de tê diyarkirin. Bi awayekî wateya ku ji lêkerê hatiye pê li naveroka peyva nû zêde dike. Ev paşgir dema ku rengdêran saz dike pênasîner e.<br><br>*zana, ne/bîna[145], xwenda, fama, beza, axa, aşna, kara* | Rengdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Herwiha ev paşgir dişê ji rengdêrekê rengdêreke nû biafirîne.<br><br>*xama* | | |
| | Di heman demê de tê li ser çend rengdêran û ji wan navdêrên bi rewşa hewayê re têkildar saz dike.<br><br>*serma, germa* | Navdêrsaz | |
| **-abad** | Paşgireke esil-îranî ye ku navê bajar û gundan saz dike. Bergendê vê paşgirê di kurmancî de *–ava*, di soranî de *–awa* ye. Bi kêmî be jî bi rêya navê bajar û | Navdêrsaz | - |

[145] Bîna tê wateya kesê ku şiyana wê/wî ya dîtinê heye, nebîna jî ew kes e ku çavê wî/wê nabîne.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | gundan di kurdî de berçav e.<br><br>*Mehabad, Xurremabad, Îslamabad, Heyderabad…* | | |
| **-ahî / -awî / -ayî** | Li gorî Tan ev hersê paşgir têkildarî hev in, dengên "h", "w" û "y" dengên alîkar in, ew ketine navbera "a" û "î"yê, li gorî dengên berî xwe dengê kelijandinê diguhere. Li vê derê qertafa bingehîn "-î" ye, ên din dengên alîkar in.[146] C. Bedirxan vê paşgirê ligel paşgirên wekî *–anî, –asî, -î, înî, tî* cuda dinirxîne û wan wekî paşgirên razberkirinê disenifîne. Li gorî wî ev paşgir ji navên şênber (çi navdêr çi jî rengdêr) navên razber didarijînin û bingeha xwe ji paşgira "*–î*"yê werdigirin.[147] Herwiha Celadet dibêje ev paşgir ligel yên navborî bêîstisna navên mê çêdikin.[148]<br><br>Ev paşgir ji rengdêr û navdêran, navdêran çêdike.<br><br>*ewrahî, ronahî, kûrahî, dirêjahî, sorahî, reşahî, hêşînahî, keskahî* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-ajo** | Ev paşgir ji rayeka dema niha ya lêkera *ajotin*ê hatiye bidestxistin û bi demê re jî wezîfeya pêşgiriyê wergirtiye. Wateya kesê ku bi karê ajotinê dike, dide peyvê.<br><br>*ga-ajo, rêçajo, tolajo, dûajo, kerajo, pêvajo, erebeajo, xweajo, cotajo, taksîajo, hespajo* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-ak** | Ev qertaf (pirtik) tê dawiya navdêr, rengdêr û rayeka lêkeran û ji wan navdêran çêdike.<br><br>*civak, qijak, honak, mînak, ronak, sêlak, şilak, ronak, xurak* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-al** | Paşgireke kurdî ye ku pê navdêran ji rengdêran tên çêkirin. | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs |

[146] Samî Tan, b.n., r. *67*

[147] Bedirxan û Lescot, *bn.,*r.280.

[148] Bedirxan û Lescot, *bn.,*r.280.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | *tengal, tiral, kendal, kortal, repal, heval, şekal* | | Zîlan |
| | Paşgireke latînî ye ku bi gelemperî tê li ser navdêran û ji wan rengdêr çêdike. Qertafeke denykirî ye ku bi rêya peyvên beyanî di kurmancî de jî bi formên xwe yên –*al, -el* ve tê bikaranîn. *normal, ûnîversal, personal, profesyonel* | Rengdêrsaz | - |
| **-alês**[149] | Ev paşgira ji lêkera *alastin/alistinê* bi dest ketiye û wateya 'ew kesê ku karê alastinê dike' dide peyvê. *tasalês/tasdalas, qûnalês, firaqalês, solalês, kodalês…* | | Zîlan |
| **-an** | Çalakiya vê paşgirê di pêkanîna pirjimariyê de xwe nîşan dide, bi awayekî çalak hê jî ev forma pirjimariyê di kurmancî de li kar e lêbelê, bi domana demê re ji bo navê gund, dever, eşîr, malbatan hate bikaranîn û peywira qertafa navdêrsaziyê li xwe girt. Dibe ku berê pêşîn ev qertaf ji bo navê eşîran hatibe bikaranîn, pey re bi demê re war û wargehên ku eşîran lê hêwir danîn bi navê eşîran –bi awayê pirjimariya navî- hate bikaranîn bo erdê wê eşîrê bi xwe. Û bi vî rengî jî qertaf li peywireke destnîşankirina cografîk rabû. Divê neyê jibîrkirin serçavkaniya vê paşgirê ne tenê ji navê eşîran tê. | Navdêrsaz | Bedirxan Tîgrîs Zîlan |
| | Navê eşîran û cîhwarnavan (*toponym*) çêdike. *Berzan, Botan, Beraziyan, Kîkan, Kurdikan, Reşkotan, Şadiyan, Basan, Qilaban, Germiyan, Heyderan, Erdelan, Şemzînan, Zîlan, Xweşiyan (gund), Kamyaran* (bajarekî Rojhilatê Kurdistanê), Bongilan (navçeya | | |

149 -*alês* di devoka serhedê de carinan wekî –*dalas*, *dalês* jî tê bikarnaîn. Bo nimûne li Elajgirê ji tiliya şehdeyê re *tasdalas* tê gotin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | Çewlîgê) | | |
| | Paşgirekebo çêkirina navên hin mehên kurdî.<br><br>*gulan, rêbendan, berfanbar.* | | |
| | Paşgireke ku carinan pê navê lîstik û cureyên govendên kurdî tê çêkirin.<br><br>*bablekan, serdestan, bazkiyan, baztiyan* | | |
| | Ev paşgir tê li ser navê xizman wateya pirhejmarî û binemaliyê dide peyvê. Formeke vê paşgirê li serhedê di peyvên wekî *malxenzûran*, *malxalan* de jî peyda dibe. Berginda vê bikaranîna paşgirê di zimanê tirkî de *-giller* e. *Amcagiller, halagiller û hwd.*<br><br>*xezûran, malxe(n)zûran, malapan, malxalan,apan, xalan…* | | |
| **-ane / -yane** | Qertafeke esil-farisî ye ku tê li ser navdêr û rengdêran, ji wan hoker, navdêr û rengdêran saz dike. Li gorî Muhammed ev paşgir heta van dehsalên dawî di kurmancî de tune bû lêbelê vê axiriyê bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmancî û xaseten di zimanê nivîskî de pir tê bikaranîn. Erka esasî ya vê paşgirê di farisî de çêkirina rengdêran e ji navdêran. Lêbelê di kurdî de jê hoker û rengdêr û kêm caran jî navdêr çêdibin.<br><br>Wateya şibandinê, awa û terzê tiştekî an jî kesekê/î dide peyvê:<br><br>*dostane, mestane, mêrane, hovane, korane, şêrane, camêrane*<br><br>Wateya di demekê de carekê dide peyvên bi demê re têkildar:<br>mehane (*monthly*), salane (*annual, yearly*), rojane (*daily*), heftane (*weekly*), şevane (*nightly*)…<br><br><br>*Wekî navdêr.* “Rûpelînê got ez bi vê | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | mehaneya kêmber ve naşixulim." (meaş, pereyê ku her mehê carekê tê hildan)<br><br>"Îsal ji ber qeyrana aborî ya ku li Kurdistanê rû da, mehaneyên karmend, mamoste û pêşmergeyan heta demeke dirêj hatin birîn." (meaş, pereyê ku mehane tê hildan) | | |
| | *Wekî hoker*: "Abonetiya kovara Wêje û Rexneyê *salane* tê rojanekirin." (her sal, her salê carekê)<br><br>"Ji ber karê xwe ez mecbûr dimînim ku *rojane* Ardil bibînim." (her roj, her rojê carekê) | Hokersaz | |
| | *Wekî rengdêr*: "Wezareta Karê Derve ya Emerîka rapora salane ya xwe derbarê aliyên cur bi cur ên mafên mirovan di cîhanê de weşand."[150]<br><br>"Yekem rojmaneya bi zazakî (kirmanckî) Newepel weşana *mehane* nake, her mehê du caran weşana xwe dike." | Rengdêrsaz | |
| **-anê / -ê** [151] | Pirraniya çavkaniyên berdest vê paşgirê naxin nav lîsteya paşgirên kurmancî. Tîgrîs, Tan, Bedirxan û Ebdulfettah di lîsteyên xwe de cih nadin vê. Baran qala vê dike û wê forma *–anî* ve yek dibîne.[152] Di vê xalê de divê mirov bala xwe bide Hîrorî ku li ser vê paşgirê çend tiştên balkêş vedibêje. Li gorî Hîrorî paşgira *–anê* di kurmanciyê | Navdêrsaz | Zîlan |

[150] *Rojnameya Agirî*, (Gulan 2004), h.7, r.7.

[151] Ev paşgir ji ber ku navê bi dehan cureyê werzîş, govend û yarîyan de tê bikaranîn, me guncav dît ku vê lîsteyê de cih bidinê. Herwiha ev paşgir bi qaîdeyê *–ên* di soranî de peyda dibe ku bi heman rengî navê lîstikan saz dike. Bo nimûne, *helmatên* (matkanê/xaranê), *topên* (goganê/tepkanê) û hwd.

[152] Bahoz Baran paşgira *–anî* û *–anê* wekî formên cuda yên heman paşgirê hesab dike û erkê wan li ser sê xalan dabeş dike: a) navê lîstikan çêdike b) ji rengdêr û navdêran navdêrên razber çêdike c) navê hin xwarinan û hwd. çêdike. Herwiha hin kes hene ku paşgira *-anê* wekî forma herifandî ya *–aneyê* jî dibînin, lêbelê li gorî Baran ev paşgir esasen *–anî* ye. Bnr. Bahoz Baran, *b.n.*, r.287-288.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | de nîne û di behdîniyê de gelek çalak e.[153] Ev paşgir navên yarî û lîstikan ji navdêran saz dike.<br><br>*çûkanê, şûranê, erkanê, matanê, tepanê, mistanê, barsenganê, çolanê, kêlanê, pêkguharkanê, hêkanê, damanê, gustîlanê, perkanê, boksanê, qoçanê, armancanê, tîranê, berşûtikanê, biranê, şertanê, tepkanê, holanê, kabanê, xaranê, binçenganê, zorxanê, talanê, papezanê, papûrê…* | | |
| **-anî**[154] | Ev paşgir[155] ji rengdêr û navdêr navdêr çêdike. Wateya razberiyê dide peyvê û hem di kurmancî hem jî di zazakî de ji rengdêr û navdêran navdêrên razber çêdike.<br><br>*şêxanî, semedanî, hildanî, sînanî, siranî, mêranî, xortanî, piranî, koranî, merivanî…* | Navdêrsaz | Tîgrîs<br>Bedirxan<br>Zîlan |
| **-ank** | Paşgireke kurdî ye tê li ser rayeka lêkeran û ji wan navdêrên cihêreng saz dike[156]<br><br>*qulîpank, hilûsank, gilîzank, qurrîçank, xijîjank* | Navdêrsaz | - |
| | Bi vê paşgirê ji rayekên navdêran | Navdêrsaz | Tîgrîs |

[153] Wekî ku tê zanîn ferqeke zêde mezin di navbera behdînî û kurmancî de nîne, lewma hin ji wan nimûneyên *–anê* ku me li vir dane li deverên wekî Colemêrg û dormaleya wê peyda dibin. Herwiha nîvê mînakên rajor ji gotara Hirorî û yên din ji ferheng û gotarên cuda hatine wergirtin. Bnr. Newzad Hirorî, "Behdînî û Kurmancî". http://www.kulturname.com/?p=342 (06/12/2015)

[154] Ev paşgir di zazakî de bi formên xwe yên wekî *–ane, -one, -ûne* derdikeve pêşberî me ku jê peyvên wekî *kêmane*, *tengane*, *engiştane* didarijin ku bi seredorî bergendê *kêmanî, tenganî* û *hingustok*a kurmancî ne. Bnr. M. Malmîsanij, *b.n.*, r.74.

[155] Herwisa *–anî* ligel çend formên xwe yên devokî ên wekî *–aney, -oney, -ûnê, -îne, -înî* rasterast bi vê forma xwe ve di zazakî de jî li kar e. Ji vê paşgira bi zazakî peyvên wekî *vêkanî, xortanî, nêweşanî* tên viraştin. Bnr. M. Malmîsanij, *h.b.*, r.74.

[156] Samî Tan, Bahoz Baran, Deham Ebdulfettah, Celadet Bedirxan, Reşo Zîlan di xebatên xwe yên navborî de qala vê paşgirê nekirine. Amêdî di xebata xwe de behsa vê paşgirê kiriye lêbelê nimûneyên ku rêz kirine (*dudank, şedank, berdank*) xêncî *qijank*ê zêdetir dikevin bin kategoriya paşgira *–dank*ê. Bnr. Sadiq Bahaeddînê Amêdî, *bn*., r.103

| | | | |
|---|---|---|---|
| **-anok** | navdêrên nû tên çêkirin. Wateya biçûkkirin û qerfê dide peyvê.<br><br>*tiştanok, çivanok, miştanok* | | Zîlan |
| **-ar** | Ev paşgira tişta ku pêkhatî ye an jî hatiye kirin, dinimîne. Di vê cureyê de peyva ku hatiye dariştin rasterast bi peyvê re têkildar e ku qertaf (nimûneya me de *paşgir*) hatiye ser. Peyvên bi vî rengî bi gelemperî ji koka (niha an jî borî) lêkerê tê bidestxistin. Ev paşgir ji rayeka lêkeran û rengdêran rengdêr, navdêr û hokeran didarijîne.<br><br>*kar* (tişta/ê ku hatiye/tê kirin)<br><br>*nivîsar* (tişta/ê ku hatiye nivîsîn)<br><br>*gotar* (tişta/ê ku hatiye gotin) | Rengdêrsaz<br>Navdêrsaz | Tîgrîs<br>Bedirxan<br>Zîlan |
| | Ev paşgir dema ku tê li ser hin rengdêr û navdêran ji wan peyvên nû çêdike. Bi gelemperî di wateya “kesê/a yan jî tişta/ê ku tiştekê dike yan jî ew tişt hatiye serê wî/wê" tête xebitandin. Bo nimûneyan[157] binêre li jêr:<br><br>*mirar* (tişta/ê ku miriye)<br><br>*kirar* (kesa/ê ku tiştekî/ê dike)<br><br>*xewar* (kesê ku zêde bi xew re diçe)<br><br>*şerar* (kesê ku şer dike) | Rengdêrsaz<br>Navdêrsaz | |
| | Ev paşgir kêm be jî carinan ji rengdêran rengdêran çêdike.<br><br>*kevnar, kêmar* | Rengdêrsaz | |

[157] Tîgrîs û Baran peyva xîzarê bo vê paşgirê wekî mînak didin lê ev peyv ji ber ku peyva ermenî *χzarar* (խզարար) ya ku tê wateya *birek*ê hatiye deynkirin, bo mînakê xelet e.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | Ev paşgir carinan ji hokeran hokereke nû saz bike, bo nimûne:<br><br>*pêrar, bêtirpêrar* | Hokersaz | |
| **-are** | Ev paşgir dema ku tê li ser peyvekê jê rengdêrekê diafirîne<br><br>*bijare*, *kevnare,* | Rengdêrsaz | Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-asa /-ase** | Ev paşgira wateya "mîna, wekî, fena" dide peyva ku tê ser. Rengdêran çêdike.<br><br>*hûtasa*, *dêwasa, qerase* | Rengdêrsaz | Bedirxan<br>Zîlan |
| **-avêj** | Ev paşgir jî wekî gelek paşgirên din ji rayeka dema niha ya lêkera *avêtin*ê hatiye pê. Dema ku tê li ser peyvê wateya 'kesê an jî tişta ku karê avêtinê dike' dide peyvê.<br><br>*tîravêj*, *rimavêj, derewavêj, avavêj* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Zîlan |
| | Ev paşgir navê alavan curbicur çêdike.<br><br>*topavêj* (alava ku topê diavêje)<br>*roketavêj* (alava ku roketê diavêje)<br>*gulleavêj* (alava ku gulleyan diavêje) | | |
| **-asî** | Bi vê paşgirê ve navdêr ji rengdêran tên çêkirin. Anku ev paşgir tê li ser rengdêrekê û jê navdêreke razber derdixe holê.<br><br>*kêmasî, tengasî, kurtasî, kirdasî* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Zîlan |
| **-atî / -etî / -yatî** | Ev paşgir navdêrên razber diafirîne. Herwiha ji rengdêran, navdêr didarijîne.<br><br>*merivatî, însanetî, serokatî, eşîratî* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-at** | Ev paşgir ji navdêran navên nû çê dike.<br><br>*eşîrat, êlat, xêrat* | Navdêrsaz | Zîlan |
| **-ava** | Ev paşgira kurmancî ya ku wateya cihê avakirî, şên dide bi gelemperî navên cihan lê dike. Bi paşgira –awa ya soranî | Navdêrsaz | - |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | û bi paşgira -*abad*ê ya esil farisî re heman wateyê dide peyvê. Navê gundan ên ku bi vê paşgirê ve hatine sazkirin ne kêm in.<br><br>*Zorava, Mîrava, Şeytanava,*[158]*Nezerava,*[159] *Terava, Mehmûdava, Harûnava,*[160] *Kurdava, Payîzava,*[161]*Biyava* | | |
| **-awer** | Ev paşgir ji rehê dema niha ya lêkera آوردن (averden) ya farisî hatiye hatiye pê ya ku wateya *anîn*ê dide. Bi demê re forma paşgiriyê derketiye holê û pê navdêran rengdêr tê çêkirin.<br><br>*dilawer, cengawer, pêlawer* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Zîlan |
| **-az** | Paşgireke ne zêde çalak e û mirov dikare şikê bibe ser paşgirbûna wê.<br><br>*tolaz, telaz* | Rendêrsaz | Tîgrîs |
| **-bar** | Ev paşgir wateya "ya ku dikare bibe an jî bê kirin" dide peyvê. Meriv dikare bibêje ku miqabilê paşgira bi îngilîzî – *able* ye. Carinan tê li ser rehê dema niha û borî ya lêkeran û ji wan rengdêran çêdike<br><br>*guhêrbar, guhêzbar, birbar, dîtbar, şkêbar, bînbar…* | Rengdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Ev paşgir di heman demê de wateya ew kes an jî tişta di bin *bar* ê tiştekî de nîşan dide. Wateya "tijî", "mişt", "dagirtî" dide peyvê. Bi vê awayê xwe ve dişibe paşgira –*dar*ê.<br><br>*zîyanbar, xetabar tawanbar, xembar, tometbar, çavnebar, gunehbar* | Rengdêrsaz<br>Navdêrsaz | |

[158] Li serhedê du gundên bi navê *Şeytanava* hene. Yek bi Dudaxa Agiriyê ve girêdayî ye (bi tirkî: Yenikent) ya din jî li ser Bazîdaxaya Wanê ye. Herwiha çend mezrayên bi vî navî hene.

[159]*Nezerava Jorîn* û *Nezeravaya Jêrîn* navên du gundên Bazîdaxaya Wanê ye. Navê wan ê fermî *Yukarıgülderen* û *Aşağıgülderen e.*

[160] Gundekî navçeya Elbaka Wanê ye. Bi tirkî *Açıkağıl.*

[161] Navçeya Wanê ye ku navê wê yê fermî *Gürpınar* e.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | Ev paşgira wateya “qirav, li ber, cem, perav” dide.<br><br>*robar, cobar, zêbar, Zêbar (navê deverekê ye li Behdinanê)* | Navdêrsaz | |
| **-bare** | Ev paşgir a ku bi eslê xwe farisî ye wateya “car”a kurmancî dide peyvê. Bi vî rengî hokeran saz dike.<br><br>*dubare, sêbare, çarbare, sedbare, pêncare* | Hokersaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-baz** | Ev paşgir ji rehê dema niha ya lêkera باختن (*baxten*)ê hatiye bidestxistin ku di farisî de wateya lîstinê dide. Anku ev paşgir hem di farisî de hem jî di varyantên kurdî de berdest e.<br><br>Wateya “kesa/ê ku di kirina tiştekî de jêhatiye” dide peyvê.<br><br>*fêlbaz, cengbaz, cambaz, segbaz, sêrbaz, rimbaz, dilbaz, hîlebaz, şûrbaz, hoqebaz, çenebaz, qumarbaz…* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Herwiha carinan wateya “kesê ku meyla wî li ser têkiliyên zayendî heye” dide peyvê.<br><br>*hevzayendbaz, jinbaz, zarokbaz, mêrbaz,* | Navdêrsaz | |
| | Ev paşgir dikare ji navdêrekê navdêreke nû lê bike.<br><br>*rêbaz* | Navdêrsaz | |
| | Wateya “kesê ku bi tiştekî dilîze” dide peyvê.<br><br>*karatebaz, judobaz* | Navdêrsaz | |
| **-bêj** | Ev paşgir ji rehê dema niha ya lêkera gotinê hatiye pê. Wateya kesê/tiştê ku tiştekî dibêje” dide peyvê.<br><br>*dengbêj, stranbêj, çîrokbêj, henekbêj, xweşbêj, gotinbêj, pirbêj, ezberbêj,* | Navdêrsaz<br>Rengdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | *hostanîbêj, wanebêj, rewanbêj…* | | |
| **-bend** | Ev paşgir ya ku ji lêkera bestinê ye, wekî peyveke hevpar pirraniya zimanên îranî de berdest e. Bi demê re bi wezîfeya paşgiriyê daye ser xwe û paşgireke çalak e.<br><br>Wateya "tişta ku girê dide, dibestîne" dide peyvê.<br><br>*bazbend, avbend, pizbend (*pezbend*) derbend, destbend, girêbend, çiçikbend, terkîbend, dolbend, kerbend, rûbend, gerdenbend, textebend, milbend, rêbend, qelabend* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Herwiha dîsa di heman wateya "girêdan û bestîn" ê de kar û pîşeyekê nîşan dide.[162]<br><br>*solbend, nalbend, sazbend* | | |
| | Bi wateya "girêdana dilînî û hîsî" dide peyvê û peyvên razber çêdike.<br><br>*hevalbend, pabend* | Rengdêrsaz<br>Navdêrsaz | |
| **-ber** | Ev paşgir ji rehê dema niha ya lêkera بردن (borden) a farisî hatiye bidestxistin ku bi kurmancî "birin" e. Wateya "kesê/tişta ku karê birinê dike" dide peyvê.<br><br>*emirber, nameber, fermanber, pêxember / peyamber, nameber, dilber, rencber* | Navdêrsaz<br>Rengdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Wateya pîşe û kar jî dide peyvê ku rasterast birinê re têkildar nîne.<br><br>*ajneber, rêveber, rêber* | Navdêrsaz | |
| | Ev paşgir carinan mîna paşgira –dar hebûna tiştekî nîşan dide. | Navdêrsaz | |

[162] Reşo Zîlan, *g.n*, r.11.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | *ruhber, sîber* | | |
| **-best** | Ev paşgir ji lêkera *bestiş/n* a kurmancî/zazakî tê dizê û di heman wextê de peyveke qedîm e ku koka wê digihîje peyva *beste* a ji zimanê avestayê.[163] Wateya “girêdan”ê dide peyvê û tê li ser rayeka navdêran, ji wan navdêrên nû çêdike.<br><br>*berbest, darbest, benbest, helbest, pêbest* | Navdêrsaz | Zîlan Tîgrîs |
| **-bir** | Paşgira ji lêkera ”birin”ê ye û maneya ”kesê/tiştê ku bi karê birinê radibe” dide peyvê.[164]<br><br>*barbir, avrûbir, zorbir, bîrbir* | Navdêrsaz | Zîlan Tîgrîs |
| **-birr** | Paşgira ji lêkera ”birrîn”ê ye û maneya ”kesê / tiştê ku bi karê birrînê radibe” dide peyvê.[165]<br><br>*darbirr, cawbirr, çolbirr, mehrbirr, cobirr, avbirr, rêbirr, serbirr, navbirr, kurtebirr, qutbirr, destbirr, dewbirr , tabirr, çilbirr (yê ku çilê zarokan dibire), şikêlbirr (nexweşîya zarokan e û heta dibin 3-4 salî nikarin bimeşin. Yê ku şikêlê dibirre),[166] kêrbirr (şûna birîna kêrê)* | Navdêrsaz | Bedirxan Zîlan Tîgrîs |
| **-bihêrk / -bêrk** | Paşgira ji lêkera ”bihartin / buhartin”ê ye û maneya ”tiştê ku bi karê bihartinê radibe” dide peyvê.[167]<br><br>*şevbihêrk, rêbuhêrk, dilbuhêrk* | Navdêrsaz | Zîlan |
| **-bîn** | Ev paşgir ji rehê dema niha ya lêkera dîtinê hatiye pê. Wateya kes an jî tişta ku dibîne” dide peyvê. Ji rengdêran navdêr û rengdêran saz dike. | Navdêrsaz Rengdêrsaz | Tîgrîs Zîlan |

163 Michael L. Chyet, *Kurdish–English Dictionary / Ferhenga Kurmancî-Înglîzî*, New Haven: Yale University Press, 2003, r.46.

164 Zîlan, *h.g*, r.11.

165 Zîlan, *g.n*, r.11.

166 Zîlan, *h.g*, r.11.

167 Zîlan, *h.g*, r.11.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | *bedbîn, dûrbîn, kurbîn, hurbîn, xweşbîn, reşbîn, geşbîn, çakbîn, nebîn* | | |
| **-çe** | Ev paşgir dema ku tê li ser peyvê wateya biçûkbûn û nazikbûnê dide peyvê.[168] Ji navdêran navdêran çêdike.<br><br>*xalîçe, deryaçe, parçe, navçe, baxçe, nalçe, kemançe…* | Navdêrsaz | Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-çik** | Ev paşgira hevedudanî ji bo biçûkkirinê ye û ji du qertafên biçûkkirinê, ji "–ç" û "–ik"ê pêk hatiye.[169]<br><br>*rûçik, rêçik, golçik (gola biçûk)* | Navdêrsaz | Zîlan |
| **-çin/-çîn** | Ji lêkera çinînê derketiye holê<br><br>*gulçin, titûnçin…* | Navdêrsaz | Zîlan<br>Tîgrîs |
| **-dank** | Ev paşgir wateya "alava ku mirov tiştekî datîne hundir" dide peyvê. Bi gelemperî bo derdan an jî qutiya ku heyberek dikeve hundir, tê bikaranîn. Navê alavan saz dike.<br><br>*mûmdank, guldank, agirdank, avdank, avildank, çaydank, derdank, derzîdank, gulçîdank, kildank, xwêdank, kevçîdank* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-dar** | Ev paşgira esil farisî ji rehê dema niha ya lêkera ( داشتن ) daştenê hatiye bidestxistin ku di wateya "hebûn"ê de ye û dema ku tê li ser rayeka peyvekê heman wateyê dide peyvê. Xwedîtiyê nîşan dide û ji navdêran navdêran saz dike. Paşgireke zaf çalak e di hemû cureyên kurdî de berdest e.<br><br>*nazdar, deyndar, birîndar, zordar, xwîndar, mêvandar, agahdar, ahengdar, şikirdar, nobedar, sucdar, spasdar, sermayedar, xiznedar, sihirdar* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |

[168] Tan, *hb*., r. 68.

[169] Zîlan, *g.n*, r.11.

| | | | |
|---|---|---|---|
| **-de** | Ev paşgir peyvên nû ji yên heyî diafirîne û navdêr û rengdêran saz dike.<br><br>*nande, dîyarde, qûnde, jînde, kirde, diyarde, piyade, dirinde, gewende, şande* | Navdêrsaz<br>Rengdêrsaz | Zîlan<br>Tîgrîs |
| | Ev paşgir ji aliyê wateyê ve ji ya li jorê vediqete û hêla livîn û hereketê diyar dike.<br><br>*jorde, jêrde, paşde, pêşde* | Hokersaz | |
| **-dêr** | Ev paşgir bi îhtimaleke mezin hevrehê paşgira –dar e lêbelê Tan, Baran, Zîlan di xebatên xwe de lêkera dêran" wekî bingeha vê paşgirê destnîşan dikin.[170] Zîlan angaştê dike ku ev "paşgira ji lêkera "dêran / dêrîn'ê ye û maneya dayînê dide peyvê"[171]<br><br>*guhdêr, çavdêr, serhildêr, xwepêşandêr* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Bi paşgira –dêr ve hin termên rêzimanî hatine sazkirin<br><br>*dengdêr, navdêr, rengdêr,* | Navdêrsaz | |
| **-ek** | Ev paşgir ji navdêran rengdêran çêdike.<br><br>*tirek, virek, fisek, qunek* | Rengdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Carinan jî tê li ser jimaran û ji wan maweyekê diyar dikin an jî rengdêra jimarnav a rêzîn saz dikin, bo nimûne navê cureyên rojiyan;<br><br>*şeşek, heftek, heştek, dehek, kulek (pace)* | Navdêrsaz | |
| | Ji navdêrekê navdêreke nû saz dike.<br><br>*serek* | | |
| | Her wiha navên hin alav û hacetan | | |

170 Zîlan, *h.g*, r.12.; Tan, *hb*., r. 69.; Baran, *hb*., r. 313.

171 Herçiqas divê mirov derbarê wê de gumanbar be jî, Zîlan dibêje rastiya paşgira dar a ku "guhdar" de xuya dike "dêr" e û ji lêkera "dêrîn /dêran"ê ye ku di klasîkên nivîskî de ev wek "guh bidêre" ye û peyva "guhdar" jî di edebiyata devkî de guhdêr e. Bnr. Zîlan, *h.g*, r.12.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | diafirîne.<br><br>*badek, gerînek, birek, xizek, pêçek* | | |
| | Navên hin têgehên rêzimanî bi vê paşgirê hatine çêkirin.<br><br>*kevanek, komek, nîşandek, gihanek, serek (*bi îngilîzî *head), ravek* | | |
| | Di heman demê de ji rengdêrekê rengdêreke nû çêdike.<br><br>*çilek, silek, kurtek* | Rengdêrsaz | |
| | Ev paşgir herwiha ji rehê dema niha ya lêkeran rengdêran saz dike.<br><br>*kulek (seqet), kujek, newêrek* | | |
| **-ende / -inde** | Ev paşgir tê li ser rayeka lêkeran û ji wan navdêrên nû saz dike.<br><br>*berfende, parakende, dirinde, nivîsende, şermende, pergende, kujende* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-er** | Ev paşgir wateya "kesê ku bi karekî radibe" dide peyvê.<br><br>*koçer, kujer, bihîzer, bîner, bûyer, nûner, têkoşer, parêzer* | Navdêrsaz | Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-êr** | Paşgireke ku pê ji navdêr û rehên lêkeran navdêr tên çêkirin.<br><br>*hilbijêr, venêr, werzêr* | Navdêrsaz | Zîlan<br>Tîgrîs |
| | Herwiha bi vê paşgirê ji navdêr û rengdêran rengdêr tên çêkirin.<br><br>*dilêr, qulêr (qulqulî)* | Rengdêrsaz | |
| **-gar** | Ev paşgir wateya "kesê ku dike, kesê ku karekî tîne cih" dide peyvê.[172]<br><br>*parêzgar, rizgar, rojgar, pîgar,* | Navdêrsaz | Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-geh** | Ev paşgir dema ku tê li ser peyvê | Navdêrsaz | Bedirxan |

[172]Zîlan, "Paşgirên Kurmancî II", *Kurmancî*, j.37, Payîz 2005, r.12.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | wateya cih û war dide peyvê<br><br>*balafirgeh, dadgeh, dezgeh, êwirgeh, çêregeh, dirûngeh, borangeh, xwaringeh, firoşgeh, havîngeh, şergeh…* | | Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-ger** | Ev paşgir ji lêkera gerînê hatiye bidestxistin, lewma dema ku tê li ser hin peyvan, bi qismî be jî wateya gerînê dide peyvê. Anku ew kesê ku karê “gerîn”ê dike.<br><br>*şevger, banger, meyger, çayger* | | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Wateya kar û pîşe dide hin peyvan.<br><br>*hesinger, zêringer, rojnameger, govendger, parêzger,* | | |
| **-istan** | Ev paşgir jî tê li ser hin navan, bi gelemperî navên neteweyan û navê welatan saz dike.<br><br>*Kurdistan, Pakistan, Efxanistan, Yewnanistan, Goristan, Filistan (devere ku dikeve navbera Erdîş û Elcewazê)*[173] | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-gîn** | Ev paşgir ji navdêran rengdêran saz dike.<br><br>*xemgîn, şermîn, lezgîn, xwazgîn* | Hokersaz<br>Rengdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| ***-ing / -îng / -ng*** | Ev paşgir ji navdêr û rengdêran navdêrên nû saz dike.<br><br>*sering, ziving, soring* | Rengdêrsaz<br>Navdêrsaz | Zîlan<br>Tîgrîs |
| | Herwisa bi vê paşgirê navên alavan tê çêkirin.<br><br>*bêjing, kuling, malinc, rojing,* | Navdêrsaz | |
| **-în** | Bi vê paşgirê rengdêr ji navdêran tên | Rengdêrsaz | Bedirxan |

[173] Zafer Açar, *Devoka Devera Filistanê* (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî), Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî, Bîngol, 2015, r.105

| | | | |
|---|---|---|---|
| | çêkirin.<br><br>*agirîn, şevîn, rengîn* | | Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Herwisa bi vê paşgirê ji navdêr û rengdêran navdêreke nû saz dibe.<br><br>*berfîn, tirşîn* | Navdêrsaz | |
| **-înî** | Ev paşgir ji navdêrekî navdêreke nû saz dike û bi gelemperî navê ku bi vê paşgirê tê saz kirin razber in.<br><br>*kurdînî, kurînî, keçinî, dostînî* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Zîlan |
| **-îne** | Ev paşgir ji navdêran navdêreke nû saz dike.<br><br>*çavîne, yekîne, tevîne, çarîne* | Navdêrsaz | Tîgrîs<br>Zîlan |
| **işk/-oşk** | Ev paşgir tê li ser navdêr û rengdêran nêzîkbûn û şibîna peyvê ya bi rayeka peyvê re diyar dike.<br><br>*keroşk, tahloşk, rûnoşk, beqmaroşk, dapîroşk, germişk, hevrîşk* | Navdêrsaz | Zîlan |
| **-tî** | Bi vê paşgira kurmancî ji rengdêrekê navdêrek tê çêkirin.<br><br>*bedewtî, şivantî, bavtî, koletî, nezantî, koletî, pûçtî, mamostetî* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| | Bi vê paşgirê ji navdêran navdêrên nû yên razber tên saz kirin.<br><br>*bîjîtî, cihûtî, paletî, xulamtî,* | | |
| **-ik** | Ev paşgir maneya şîrînkirin û biçûkkirinê dide peyvê. Ji navdêran navdêrên nû didarijîne.<br><br>*keçik, kurrik, kêzik, karik, mêrik, jinik, pîrik, kalik,* | Navdêrsaz | Zîlan<br>Tîgrîs |
| | Bi vê paşgirê navên alavan çêdibe ku | Navdêrsaz | |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | wateya wan nêzî peyva çavkanî ye.<br><br>*destik, qulpik, berik, maçik (parçeke cotê ga),*[174] *pêtik,mehdik (landik, hêlik), kulpik*[175] | | |
| **-kar** | Ev paşgir a ku hevrehê peyva "kar" e, hemû zîmanên îranî de peyda dibe û "mijûliya kesekê/î bi karekî re" destnîşan dike anku pîşeya mirovan an jî alavan diyar dike.<br><br>*nivîskar, kedkar, sitemkar, zilmkar, cotkar, gunehkar, destkar, hîlekar, xebatkar, heweskar* | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-kî** | Bi vê paşgirê hoker an jî rengdêr ji navdêrekê tên çêkirin. Di zazakî de jî paşgireke çalak e.[176]<br><br>*devkî, dizîkî,nivîskî, kurdkî, ermenkî, dimilkî, serserkî, çitikî, paşpêkî* | Hokersaz<br>Rengdêrsaz | Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-lan** | Bigelemperî tê li ser navê ajalanû wateya "cih, stargeh"ê dide peyvê.<br><br>*mozelan,*[177] *marelan* | Navdêrsaz | - |
| **-mend** | Ev paşgir ji navdêran rengdêrên nû saz dike û hebûna wateya koka peyvê di peyva nû de destnîşan dike.<br><br>*behremend, dewlemend, salmend, hunermend, karmend* | Rengdêrsaz | Tîgrîs<br>Bedirxan<br>Zîlan |

[174] Açar, *b.n.*, r.108.

[175] Kulpik: meyikên bişkocan ên di ser ve ku ji tayê hebîrşimê badayî çê dikin. Bnr. Celadet Alî Bedirxan, *Ferheng: Kurdî – Kurdî*, weş. Avesta, 2009, r. 189.

[176]Malmîsanij, "Kirmanckî (Kirdkî) di Suffîksî", *Vate*, h.1, (Hamnan) 1997, r.85-86.

[177] Dibe ku mirov ji navê mozê pêşbînî bike ku *mozelan* cihê mozan e, lêbelê wateya wê ne wilo ye. Mozelan ku bi taybetî li herêma serhedê berbelav e, tê wateya cih û warê ku dewar navrojê lê dihêwire û bêhna xwe vedide. Dema ku dewar (ga, manga, golik) ji germê aciz dibin û moz bi wan vedidin tê gotin ku "dewar moz dikin", îcar ew bilindcihê ku hênik e û dewar ji moz û germê dûr dikevin dibe *mozelan*.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | Herwisa ev paşgir wateya “pîşe û mijûlî”yê dide peyvê.<br><br>*hunermend, karmend, afirmend, şêwirmend* | Navdêrsaz | |
| **-nak** | Bi vê paşgirê hin rengdêr ji navdêran tên çêkirin.<br><br>*tirsnak, xeternak, derdnak, endişenak* | Rengdêrsaz | Tîgrîs<br>Bedirxan<br>Zîlan |
| **-ok** | Bi vê paşgirê ji rayeka lêkeran rengdêr tên çêkirin.<br><br>*mêjok, livok, bezok, kenok, gerok, bihîstok, xurok, gezok*<br><br>Herwisa ev paşgir tê li ser hin navdêr û rengdêran û ji wan navine nû didarijîne.<br><br>*devok, hevok, tevok, hêrsok, zarok, şekirok* | Navdêrsaz<br>Rengdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-onek** | Ji navdêran rengdêr saz dike.<br><br>*tirsonek, bizdonek* | Rengdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-saz** | Ev paşgir wateya pîşe û kar dide peyvê.<br><br>*diransaz, karsaz, dermansaz, netewesaz, navdêrsaz* | Navdêrsaz | Tîgrîs<br>Zîlan |
| **-van** | Paşgireke kevnar e ku wateya “çavdêrî” û “nêrevanî” dide peyvê wekî di peyva peyva *gavan* û *berxvan* de. Ev paşgir di zimanê avesta de *pane* ye, di zimanê pehlewî de wekî–*pan*e ku di vî zimanî de jî wateya “nobedar” dide.[178] Herwiha di farisî de jî –ban e û paşgireke çalak e, bo nimûne دربان (derban) ya ku tê | Navdêrsaz | Bedirxan<br>Tîgrîs<br>Zîlan |

[178] Bo vê paşgirê û wateya wê bnr. McKenzie, *b.n.* r. 17.

| | | | |
|---|---|---|---|
| | wateya dergevan bi vê paşgirê çêbûye.<br><br>Peyva *payîn* a kurmancî û *pawitene* ya bi zazakî, bi karê *nobedar* û *çavdêr* pê re têkildar in, ji ber ku ew "dipên".<br><br>Ev paşgir wekî li jorê jî hate qalkirin tê li ser hin navdêran û wateya "ew kesê ku çavdêriyê dike an jî dipê" dide peyvê. Peyvên ku bi vê qaydeyê hatine çêkirin.<br><br>*berxvan, gavan* | | |
| | Ev paşgir wateya pîşe an jî kar dide peyvê.<br><br>*aşvan, dergevan, baxçevan, gavan, şivan, mêvan, mazûvan, rezvan, tenûrvan, nêçîrvan, tembûrvan, bilûrvan,* | | |
| **-xane** | *Ev paşgir wateya cih û war dide peyvê, navên cih û avahiyan saz dike ku karê ku koka peyvê destnîşan dike tê de pêk tê.*<br><br>*sêwîxane, nexweşxane, postexane, avdestxane, çayxane, aşxane, firoşxane, mêvanxane, nivistinxane, pirtûkxane, zarokxane* | Navdêrsaz | Bedirxan Tîgrîs Zîlan |

## ENCAM

Ziman di hemû qadên jiyana me wekî alavekê pêçaye, em ji roja ewil heta roja xwe ya dawî li darê dinyayê tim û tim ziman bi kar tînin, pê bi mirovên din re têkiliyê datînin, hemû tiştên di jiyana xwe de bi nav dikin û wateyên cihêreng li pêkhateya biçûk a zimên anku peyvan bar dikin. Carinan em peyvekê bi deh hezar salan di form û wateyeke nêz de bi kar tînin, lêbelê carinan jî peyvek ji axaftin û nivîsên me derdikeve û êdî hew tên bikaranîn. Yekeya herî girîng ya zimên peyv û serboriya dariştina peyvên nû anku peyvsazî bi beşên xwe yên herî sereke ve bû babeta vê tezê.

Di vê xebata li ser peyv û peyvsaziyê de, me wêneyeke giştî yê teşe û pêkhateyên peyvê û peyvsaziya kurmancî berpêş kir. Di vê wêneya giştî de derket holê ku peyvsaziya kurmancî ji ber qedexeyên ku li ser zimanê kurdî hatine sepandin, wekî zimanên pêşketî bi têra xwe pêş neketiye. Lêbelê hin rêbazên edetî yên peyvsaziyê, bi taybetî jî hevedudanîn di kurmancî de pirr berhemdar e. Herwiha di vê xebatê de, em ketin wê ferqê ku rewşa sosyo-polîtîk ya civakê û dînamîkên cihêreng yên dîrokî, çandî, edetî li ser werara zimanî ya kurdî tesîr kiriye û wekî pirraniya beşên zimannasiya kurdî, peyvsazî jî ji ber bêserûberiya termînolojîk, neyeksaniya têgehên têkildar, bi awayên xelet afirandina peyv û têgehan ketiye nav aloziyeke qismî. Peyvsaziya kurdî eger li gorî rê û rêbazên edetî yên zimên bête şixulandin wê bê dîtin ku teşe û forma tabiî ya zimanê kurdî xwediyê şiyaneke mezin e, dikare bi pêşgir û paşgiran ve peyvên hewcedar biafirîne û bi xemla kurdî ve peyvan binitirîne.

Berhemdariya morfolojîk ya kurmancî, herî zêde xwe bi qertafên peyvsaz ve nîşan dide, eger ev berhemdariya bi awayê xelet bête şuxilandin, wê demê derî ji şaştêgihiştin û aloziyên têgehî re vedibe. Ji ber vê çendê, eger bergendê peyva ku wê bê afirandin di zimên de hebe, divê rêbazên peyvsaziyê neyên bikaranîn. Wekî ku tê zanîn, di warê dîsîplînên curbicur de hê termînolojiyeke hevpar û xweragir neafirandiye. Helbet rojekê dema ku zimên pêdivî bi têgehên nû dît bo fêmbariya hêsan, divê lijneyeke bijare ya ku endamên wan qada têkildar de pispor û haydar in, van têgehan biafirînin. Encax bi vî rengî mirov dikare termînolojiya kurdî zelaltir bike. Pirbûna paşgirên kurmancî, ji ber ku hê jî standardeke daxwazkirî pêk nehatiye,di hin mînakan de gellek peyvên hevwate yên kurmancî dixe nav zimên bo nimûne *rojnamevan*, *rojnameger*, *rojnamenivîs*. Di vê pêngavê de, mijara me ne gengeşiya li ser bikaranîna rast a paşgiran an jî forma rast a peyvê ye lêbelê hebûna gellek

paşgirên ku kêm-zêde heman wateyê didin peyvê, bo nimûne –er, dar, -van, -ger, -ker, -dar, -dêr, -mend, -wer û wd., herçiqas derfetekê teqdîmê zimên bike jî carinan dide sedema nîqaşên di vî warî de. Lewma, paşgir divê bi baldarî bên bikaranîn û dema ku hatin bikaranîn divê li gorî qeyd û bendên kurmancî bin.

Di vê xebatê de, lîsteya hinek paşgirên kurmancî ya ku tê de wezîfe û fonksiyona paşgirên kurmancî, cureya peyvê ya paşgir saz dike û wateya ku bi gelemperî dibe peyvê, hatine ravekirin. Herçiqas ji aliyê hin zimannas û rêzimannasan ve hin paşgirên kurdî wekî rayeka lêkeran hatibin sinifandin û hilsengandin jî me vê xebatê de hemû rayekên lêkeran yên dema borî û niha wekî paşgir wesifandin û bo hin paşgiran nimûne pêşkêş kirin. Hejmara paşgirên kurmancî bi têra xwe zêde ye û bi vê hejmara paşgiran ve bi sedan peyv tên dariştinê. Herwiha şiyana kurdî ya bi awayê hevedudanînê (*compounding*) jî hejmarek pirr zêde peyv tên darîştinê. Di heman demê de hate dîtin ku hin rêyên di peyvsaziyê de bi rengekî çalak tên bikaranîn, bo nimûne *têkilkirin*, *kesnavî*, *paşvesazî*, *rayeksazî* û *qusandin* nîsbet bi zimanên pêşketî di kurmancî de werara xwe temam nekirine û peyvên bi van rêyan tên lêkirin an pirr kêm in an jî ji ber qedexeya li ser zimên derfet çênebûye ku çêbin.

## FERHENGOK

| Kurmancî | Tirkî | Îngilîzî |
|---|---|---|
| alfabe | alfabe | alphabet |
| bendik | kısa çizgi | hyphen |
| berhemdarî | üretkenlik | productivity |
| bêhnok | virgül | comma |
| bêje, peyv | sözcük | word |
| bilêvkirin | telafuz | pronunciation |
| birra peyvê | sözcük türü | word class |
| bireser | nesne | object |
| cînavk | zamir | pronoun |
| dabeşnebarî | bölünmezlik | uninterruptability |
| daçek | edat | adposition |
| darîştin[179] | türetim | derivation |
| darîştî | türemiş | derivated |
| dengdêr | ünlü | vowel |
| dengdar | ünsüz | consonant |
| dengnasî | sesbilim | phonology |
| derbirrîn | ifade | utterance |
| dubarekirin | ikileme | redublication |
| erênî | olumlu | affirmative |
| gihanek | bağlaç | conjunktion |
| guhastin | evrişim[180]/ fonksiyon değiştirme | conversion |

179 Di vê xebatê de peyva darîştî bo ew peyvên ku qertafên peyvsaz digirin, hatiye bikaranîn. Herwiha forma *darijtî* ya ku hin çavkaniyan de berbelav e, nehatiye bikaranîn. Hin çavkanî peyva *pêkhatî* bergendê peyva *darîştî* de bi kar tînin, di vê xebatê de qesta me ji *pêkhatin*ê pêvajoya *hevedudanîn*ê ye.

180 Berke Vardar, *Açıklamalı Dilbilim Terimleri Sözlüğü*, Multilingual Yayınları, İstanbul, 2007, r.97.

| | | |
|---|---|---|
| guhêrbar | değişken | variable |
| herf/tîp | harf | letter |
| hevedudanîn[181] | birleşik | compounding |
| hevenav | cins isim | common noun |
| hevgiriya navxweyî | iç uyum | internal cohesion |
| hevok | cümle | clause |
| hevoksazî | sözdizim | syntax |
| lay/hêl | yön | direction |
| hêman | öğe | element |
| hoker | belirteç | adverb |
| jihevqetîna lêkerê | ayrılan fiil | tmesis |
| kesnavî | - | eponym |
| kevanek | parantez | parenthesis |
| kirde | özne | subject |
| kirpandin/hêz | vurgu | stress |
| kîte | hece | syllable |
| lêker | fiil, eylem | verb |
| lêkera alîkar | yardımcı eylem | auxiliary verb |
| livdarî | hareketlilik | mobility |
| meyil | eğilim | tendency |
| morfolojî /teşenasî | biçimbilim | morphology |
| morfem | biçimbirim | morpheme |
| morfema çemandinê | işletim ardılı/çekim eki | inflectional morphemes |
| morfema darîştinê | türetim ardılı/türetim eki | derivational morpheme |
| morfema serbest | özgür biçimbirim | free morpheme |
| morfema vebestî | bağımlı biçimbirim[182] | bound morpheme |

[181] Wheelr M. Thackston, *Kurmanji Kurdish: A Reference Grammar with Selected Readings*, Deqa Neçapbûyî, Harvard University, 2006, r. 216. Li vir berdest e: http://www.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji_complete.pdf (26/12/2015)

[182] Oya Adalı, *Türkiye Türkçesinde Biçimbirimler*, Papatya Yayınları, İstanbul 2004, r.35

| | | |
|---|---|---|
| morfema watedar | sözcüksel biçimbirim[183] | lexical morpheme |
| morfema wezîfedar | dilbilgisel biçimbirim | gramatical morpheme |
| valahî/navbir | boşluk | space |
| navdêr | ad | noun |
| naverok | içerik | content |
| neyînî | olumsuz | negative |
| paşgir | sonek/ardıl | suffix |
| paşvesazî | geri türetme/geri oluşum | backformation |
| peyvrêzî | sözdizimsel | syntactic |
| peyvsazî | sözcük yapımı | word formation |
| peyvên aloz | karmaşık kelimeler | complex words |
| peyvên hevedudanî | bileşik sözcük | compound word |
| peyvên xwerû | basit kelimeler | simple words |
| pêkanîn | birleşme | compounding |
| pêkhate | bileşen, unsur | constituent/component |
| pênase | tanım | definition |
| pêşgir | önek /öncül | prefix |
| pirkîteyî | çok heceli | polysyllabic |
| qertaf | ek | affix |
| qusandin | kırpma | clipping |
| rayeksazî | kökyapımı/ uydurma | coniage/root creation |
| rader | mastar | infinitive |
| rastnivîsîn | imla | orthography |
| ravekirin | açıklamak | explain |
| rêziman | dilbilgisi | grammar |
| rêzimanname | dilbilgisi kitabı | grammar book |
| seredorî | sırasıyla | respectively |

[183] İslam Yıldız, F. Uzdu Yıldız, V. Doğan Günay, *Biçimbirimler: Türetim ve İşletim Ardıllarının Sözlü Dildeki Kullanım Sıklığı*, Papatya Yayınları, İstanbul, 2014, r.23.

| | | |
|---|---|---|
| serenav | özel ad | proper name |
| sernavî | kısaltma | acronym |
| sifir-morfem | sıfır biçimbirimi | zero-morpheme |
| têgeh | kavram | concept/term |
| têkilkirin | karma/kaynaştırma | blending |
| veqetandek | tamlama eki | ezafe maker |
| veçerxînbar | geri dönüşümlü | recyclable |
| xalbendî | noktamala | punctuation |
| watenasî | anlambilim | semantic |
| werar | gelişim | development |
| wergirî | kapsam | scope |
| wergirtin/deynkirin | ödünçleme | borrowing |
| wergirtina wateyê | anlam aktarması | semantic loan |
| wergirtina yekser | ödünçlemeli çeviri/öyküntü | loan translation / calque |
| yeke | birim | unit |
| yekkîteyî | tek heceli | monosyllabic |
| zayend | cinsiyet | gender |
| zimannas | dilbilimci | linguist |
| zimanê çavkanî | kaynak dil | source language |

## ÇAVKANÎ


— Açar, Zafer, *Devoka Devera Filistanê* (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî), Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî, Bîngol, 2015.

— Adalı, Oya, *Türkiye Türkçesinde Biçimbirimler*, Papatya Yayınları, İstanbul,2004.

— Amêdî, Sadiq Behaeddîn, *Rêzimana Kurdî (Kurmancîya jorî û jêrî ya hevberkirî),* Weşanên Dîwan, Stenbol, 2012.

— Aydogan, Îbrahîm Seydo, *Guman-1*, weş. Lîs, Stenbol, 2013.

— Aydogan, Mistefa, *Rêbera Rastnîsînê*, weş. Rûpel, Stenbol, 2012.

— Bakir, Abdûrrahman, *Rêziman û Peyvsaziya Kurdî*, weş. Aram, Stenbol 2015.

— Baran, Bahoz, *Rêzimana Kurmancî,* weş. Belkî, Diyarbekir, 2012.

— Baugh, A. & T. Cable, *A History of the English Language*, Fifth Edition, Routledge, New York 2002.

— Behrooz Shojai, “Dengsaziya Kurmancî”, *Notên Waneya Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Zimanên Zindî Unîversîteya Mardin Artuklu.

— Bedirxan, Celadet Alî, *Bingehên Gramera Kurdmancî,* weşanên Avesta, Stenbol, 2010.

— ____________ & Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2009.

— ___________,*FerhengKurdî – Kurdî*, weş. Avesta, Stenbol, 2009.

— Brinton, Laurel J.,*The Structure of Modern English: A Linguistic Introduction*, John Benjamins Publishing, Amsterdam / Philadelphia, 2000.

— ____________& Traugott, Elizabeth Closs, *Lexicalization and Language Change*, Cambridge University Press, Cambridge, 2005.

— Booij, Geert. *The Grammar of Words*, Oxford University Press, New York, 2005.

— Byrd, Dani & H. Mintz, Toben, *Discovering Speech, Words, and Mind,* MA: Wiley-Blackwell, 2010.

— Chyet, Michael L.,*Kurdish–English Dictionary / Ferhenga Kurmancî-Înglîzî*, New Haven: Yale University Press, 2003.

— Demîrhan, Umîd, *Ferhenga Destî Kurdî bi Kurdî,* (çapa duyem a berfirehkirî), weş. Sewad, 2007.

— Duque-Parra J.E., Llano-Idárraga J.O., Duque-Parra C.A., "Reflections on Eponymsin Neuroscience Terminology", *The Anatomical Record*, vol. 289B, n.6, 2006, pp.219-224.

— Ebdulfettah, Deham, *Nav di Zimanê Kurdî de (Kurmanciya Jorîn) weş. Spîrêz, Hewlêr, 2006.*

— Ertekin, M. Zahir & Açar, Zafer, "Di Kurmancî de Cotepeyv û Cureyên Wan", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, j. 1, 2015.

— Farqînî, Zana, "Dahûrîna le ser parkîtên di kurmancî" de, *Kovara Zendê* (Payîz) h.1, 1996.

— ___________, *Ferhenga Kurdî - Tirkî,* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*,* Stenbol, 2004.

— ____________, /-van son ekinin yanlış kullanımı, (24 Mayıs 2014) *Özgür Gündem Gazetesi.*

— Fasold, Ralph W & Connor-Linton, Jeff, *An Introduction to Language and Linguistic,* Cambridge University Press, New York, 2010.

— Frost, R., Deutsch, A. & Forster, K.I., "Decomposing Morphologically Complex Words in a Nonlinear Morphology",*Journal of Experimental Psychology Learning Memory& Cognition,* 26, (2000), 751-765.

— Fromkin, V., R. Rodman & N. Hyams. *An Introduction to Language*,9th ed. InternationalEdition, *New York:* Wadsworth, Cengage Learning, 2011.

— Göksel, Aslı and Kerslake, Celia*, Turkish: A Comprehensive Grammar*, London &New York, Routledge, 2006.

— Grainger, Jonathan and M. Jacobs, Arthur, "Orthographic Processing in Visual Word Recognition: A Multiple Read-Out Model", *Psychological Review*, 1996, Vol. 103, No.3, r.518-565.

— Gries, Stefan Th., "Isn't that fantabulous? How similarity motivates intentional morphological blends in English" in M. Achard & S. Kemmer (eds.), *Language, Culture, and Mind*, 415-428. Stanford: CSLI Publications, 2004.

— Hanawandy, A., "Derivational Morphemes in English with reference to Dialects in Kurdish",*Kirkuk University Journal-Humanity studies*, vol. 7 (3), 2012, r. 1-19.

— Hasanpoor, Jafar, *Study of European, Persian, and Arabic Loans in Standard Sorani,* Unpublished Doctoral Dissertation, Uppsala University, 1999.

— İlhan, Nadir, "Tür*kçede Ek + Kök / Kök + Ek Kaynaşmasıyla Ortaya Çıkan Ekler", Turkish Studies, Volume 4/8 Fall 2009, r.1572-1594., 2009.*

— *Îzolî, D.,* Ferheng, weşanên Deng, Amed, 2011.

— Kaltz, Barbara & Leclercq, Odile, "Word-formation Research from its Beginning to the 19th Century" *Word Formation: An International Handbook of the Languages of Europe* ed. Peter O. Müller, Ingeborg Ohnheiser, Susan Olsen & Franz Rainer (HSK), Berlin & New York: De Gruyter, 2015, r. 22-38

— Rehîmî, Kamran, *Binemakanî Wişesazî û Wişeronan le Zimanî Kurdî da*, Korî Zanistî Zimanî Kurdî-Êran, weş. Gutar, Seqiz, 1387.

— Lehrer, Adrienne, "Prefixes in English Word Formation*",* *Folia Linguistica*1995, 29.(1-2)r. 133-148.

— ____________, "Blendalicious. Lexical Creativity", *Texts and Contexts*. Ed. Judith Munat, John Benjamins Publishing Company, 2007, r. 115-137,

— Lyons, John, *Introduction to Theoretical Linguistics*. Cambridge: Univ. Press, 1969.

— David Neil McKenzie, *A Concise Pahlavi Dictionary*, Oxford University Press, London, 1986.

— Malmîsanij, M. (amd.), *Ferhenga Kurdî (Kurmancî) – Tirkî,* weş. Rûpel, Stenbol, 2012.

— ___________,*Kurmancca ile Karşılaştırılmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbilgisi*, Vate Yayınevi, İstanbul, 2015.

— ___________, "Kirmanckî (Kirdkî) di Suffîksî", *Vate*, h.1, (Hamnan) 1997, r.81-93.

— ___________, "Kirmanckî (Kirdkî) de Suffîksî", *Vate*, h.12, (Hamnan) 2000, r.32-48

— Malmkjær, Kirsten, *The Linguistic Encyclopedia (Second Edition)*, London &New York, 2002.

— Melinger, Alissa, *Morphological Complexity in English Prefixed Words:An Experimental Investigation,* Faculty of the Graduate School of State University of New York at Buffalo, Teza Doktorayê ya Çapnebûyî.

— Muhammed, Husein, "Peyvsazî di Zimanê Kurdî de", *Kanîzar*, j.1-3, 2015.

— Noyer, R. Features*, Positions and Affixes in Autonomous Morphological Structure*, Garland, New York, 1997.

— Ocek, Nezîr, *Waneyên Rêzimana Kurmancî,* Weşanên Sîtav, Stenbol, 2014.

— O'Grady and Guzman, "Morphology: The Analysis of Word Structure", in *Contemporary Linguistics: An Introduction*. William Kingdom: Longman 1996.

— Öpengin, Ergin, *Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkiyeyê*, weş. Avesta, Stenbol, 2011.

— Plag, Ingo, *Word-Formation in English*, Cambridge, CUP, 2003.

— Schmid, Hans-Jörg, "The Scope of Word-formation Research." *Word Formation. An International Handbook of the Languages of Europe* ed. Peter O. Müller, Ingeborg Ohnheiser, Susan Olsen & Franz Rainer (HSK), Berlin & New York: De Gruyter, 2015.

— ______________, "Morphology", *Exploring Language and Linguistics* eds. Natalie Braber, Louise Cummings & Liz Morrish, Cambridge: Cambridge University Press, 2015, r. 77-110.

— Sharifi, Shahla & Karimipour, Amir, "A comparative study of word formation processes of Ilami, Kurdish and English", *Open Journal of Education*, 1 (3), (2013), r. 83-90.

— Scalise, Sergio. *Studies in Generative Grammar*, Foris Publication, Dordrecht, 1986.

— Shahla, S. & Amir, K. (2013). A comparative study of word formation processes of Ilami, Kurdish and English. *Open Journal of Education*, 1 (3), 83-90.

— Stump, Gregory T., "Word-formation and Inflectional Morphology", in *Handbook of Word-Formation*, (ed.) P. Štekauer, & R. Lieber, Dordrecht: Splinger, 2005.

— Stockwell, R., and D. Minkova. *English words: History and structure.* New York: Cambridge University Press, 2001

— Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî,* (çapa duyem ya berfirehkirî), Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2011.

— __________, *Rêzimana Kurmancî,* (çapa nûkirî), Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2015.

— Tîgrîs, Amed, *Pêşkît û Parkît*, weş. Medya, Stockholm, 2001.

— Trask, R.L., 2004. 'What is a Word?' *Working Papers 11*, Department of Linguistics and English Language, University of Sussex.

— Vardar, Berke, *Açıklamalı Dilbilim Terimleri Sözlüğü*, Multilingual Yayınları, İstanbul, 2007.

— Veroj, Seîd, *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî / Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî, Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî*, Weşanên Ava, Stenbol, 2014

— Wheelr M. Thackston,*Kurmanji Kurdish:A Reference Grammar with Selected Readings*,DeqaNeçapbûyî,Harvard University,2006,r. 216."http://www.fas.harvard.edu/~iranian/Kurmanji/kurmanji_complete.pdf" (26/12/2015)

— Yıldırım, Kadri, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, weş. Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Artuklu ya Mêrdînê, Mêrdîn, 2012.

— Yıldız, İslam & Yıldız, F. Uzdu & Günay, V. Doğan, *Biçimbirimler: Türetim ve İşletim Ardıllarının Sözlü Dildeki Kullanım Sıklığı*, Papatya Yayınları, İstanbul, 2014.

— Zapata Argenis A. 2007. *Inglés IV (A-2007),* Universidad de Los Andes, Facultad de Humanidades y Educacion, Escuela de Idiomas Modernos.

— Zêrevan, Arif, *Bingehên Rastnivîsandina Kurdiyê (Kirmancî)*, Nefel, Stockholm, 1997.

— Zîlan, Reşo, "Paşgirên Kurdî", *Kurmancî: Rojnameya Taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê*, j.36, Bihar 2005.

— _________, "Paşgirên Kurdî II", *Kurmancî: Rojnameya Taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê*, j.37, Payîz 2005.

— Reşo Zîlan, "Paşgirên Kurdî I-II-III", *Kurmancî, Rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravayên kurmancî,* weş. Avesta, Stenbol, 2010, r. 409-412; 421-424; 445-447.

**Çavkaniyên Înternetê**

— Kamil Wisniewski, "Word Formation", http://www.tlumaczenia-angielski.info/linguistics/word-formation.htm (09/08/2015)

— Husein Muhamed, Peyvrêzî, *kulturname.com*:http://www.kulturname.com/?p=8857 (29/06/2015)

— Samî, Berbang: *Morfemên Kêşanê*, www.academia.edu:https://www.academia.edu/1840359/Kurdish_functional_words (25/08/2015)